
11
Zivistan
2024

NRLS

# LÊKOLÎNÊN STRATEJÎK

- PEYMANA BINPÊKIRINA MAFÊN GELAN; LOZAN
- ÇEKÊN KÎMYAYÎ Û QIRKIRINA KURDAN
- DAIŞ Û AMADEBÛNA PERÇEKIRINÊ LI SÛRÎYÊ
- TUNDREWÎYA ŞÎÎTÎYÊ



Desteya nivîser:

**Hejar Şekir**

**Yûsif Mistefa**

**Rakan Şêxî**

**Kurdyar Dirêî**

Nexşedan: **Ehmed Mela**

Hemû danstan bi navê sernivîser li ser navnîşana jêrîn tên kirin:

nrls@nrlsrojava.com

Ji bo serdana sîteyê:

www.nrls.net

**Weşanên Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS)**

**Mafên çapkirin û weşanê parastîne**

**Hejmara (11) Zivistan – 2024**

## NAVEROK

**Peymana Binpêkirina Mafên Gelan; Lozan ............................................. 5**

**Çekên Kîmyayî û Qirkirina Kurdan ...................................................... 14**

**Daiş û Amadebûna Perçekirinê li Sûrîyê .............................................. 30**

**Tundrewîya şîîtîyê .......................................................................... 62**

## Gotina hejmarê

**Xwendevanên hêja:**

Di dîroka Kurd û Kurdistanê de, pir peyman, konevanî û hevdîtin di navbera dijminên kurdan de çêbûn ji bo ku tu hebûneke kurdî li ber çavan çênebe û Kurdistanê li hev par bikin, ji Qesra Şêrîn bikire ta bigihêje dema îro. Ji van peymanan peymana Lozanê bû ku tê de ne tenê dijminên kurdan lê belê hêzên navneteweyî yên ku di şerê cîhanê yê yekem de bi ser ketibûn; kurdistan li hev belav kirin û nehiştin tu sabarek ji kurdan re bê jiyankirin. Ev jî ne dûrî rewşa kurdî bû ku Kurd di nexweşîyên nelihevkirin, perçebûn, peyebûna dijminan û hwd de jiyan dikirin ku ew jî bû zemîna çavbirçîbûn û çavberdana dewletan li ser Kurdistanê. Jixwe nivîsara yekem a vê jimarê li ser **sedem, rewşa kurdan û nevneteweyî, encamên peymana Lozanê** şirove dike.

Êdî berhemdewletên peymana Lozanê dest bi qirkirin û wêrankirinê kirine ku hemû rêbaz, dek û dolab, xapandin û çek bi kar anîn, ta asta ku çekên kîmyawî li dij kurdan bi kar anîn, ji Dêrsimê bigre ta bigihêje Serêkanî li Rojavayê Kurdistanê ya dema niha. Jixwe lêkolîna " **Çekên Kîmyewî û Qirkirina Kurdan**" pênase, cûre û bikaranîna çekên kîmyayî li ser kurdan şirove dike.

Jixwe ji bo nûjenkirina peymana Lozanê ku rewşa kurdan neyê guhertin û di bin darê qirkirinê bimînin, dewletên degirker hedan neket wan û sed çiv li xwe xistin bi taybet Tirkîyê û Îran. ji wan li ser olê lîstin û sazkirina komikên tûndrew. Ji hêla xwe ve Tirkîyê rêxistina ji bo pêkanîna berjewendîyên xwe Daişê bi kar tîne, Lêkolîna " **Daiş û Amadebûna Perçekirinê li Sûrîyê**" mijarê rewşa Daiş a giştî, nîşaneyên perçebûna Daişê, karîgherên ku perçekirina Daişê xurt dikin û rêbaz û çareyên ku rêxist dike ji bo perçe nebe, radixe ber çavan.

Ji hêla xwe ve jî Îranê ji bo ku çilik ji bin wê nekişe û bayên guherînên ku li cîhan û Rojhilata Navîn rû didin lê nede, tîreya Şîîyê bi kar tîne. Êdî rêxistinên şîî yên ku pabendîyê Wîlayetûlfeqîh dikin û yên ku bêtir girêdayî welêt in, her wiha rewşa serkeftina wê li ber bayê şoreşê de, ev mija di beşê duyan ê lêkolîna **"Tûndrewtîya Şîîtîyê**" zelal dike.

**Sernivîser**

## Peymana Binpêkirina Mafên Gelan; Lozan

Dema basa peymana Lozanê tê kirin, bêguman ew qesra di bin banê wê de tevlihevkirina dîrokê dest pê kirîye tê bîra mirovan, ew jî qesra Oşî ye.

**Qesra Oşî:**

Qesra bi navê Oşîyê ya ku ji şûnwarên sedsala 13 a li Siwêsrê, cihê êş û birînên kûr ji gelên mezopotamîya re ye ku îro gelê Kurd, Ermen, Asûr, Suryan û Kildan nifretan li dîrokê dikin ku Oşî bûye dîdevan û melevanê qirkirin û tunekirina wan û li bêbextîya demên nûjen; lanetê dibarînin, di bin banê vê qesrê de, bazirganên kirîn û firotina gel û welatan civîya bûn û li pey xwe Kurdistaneke çarperçe hiştine, serokê şandeya Tirkîyê di vê civînê de Ismet Înono piştî civînê, ji ber ku hest dikir ku Kurd xapandine û armancên xwe di 24 têrmeha sala 1923 de li Lozanê pêk anîye, bi dilxweşî bi derdora xwe re dikenîya. Belê, qesra Oşî dîdevanê qirkirin, komkujî û tunekirina gelên resen mîna kurd, Ermen, Asûr û Kildana ne û dîdevanê herikîna çemên ji xwîna ziyanmenda ne. Gelo bobelata van gelan çawa dest pê kirîye?

**Şerê Cîhanê Yê Yekem**

Bi şerê cîhanê yê yekem re, ew dewleta bi diruşma "dewleta herdemî" ku bi navê Osmanîyan dihate nasîn ku ji sala 1299 ta 1922, hukimdarîya rûbereke mezin ji Rojhilata Navîn, bakurê Efrîqîya û Ewropayê kirîye, ew imperatorîya bi temen 623 sal, di dema şerê cîhanî yê yekem ( 1914 - 1918 ) de li himber hevpeymana mezin, anku hevpeymana birîtanîya, Îtalîya, Frensa û Rûsîya, tevlî hevpeyman Elmanîya û Awistirîyayê bibû, di encama şerê mezin yê çar salan de Elmanî, Osmanî û Awistirîyayî têkçûbûn, êdî li ser xaka wan dewletên têkçûyî, dewletên nû peyda bibûn, her wiha xaka Osmanî jî ji hev belav bibû, êdî ji bilî kurdan hemû neteweyên din ji tirkan veqetîya bûn û li ser pêşmaya mayî jî, Mistefa Kemal komareke nû ava kiribû; ew komara ku dê qedera gelên ku bi tirkan re ta wê demê jîyan dikirin, bi temamî biguhere.

Jixwe di sala 1919 de Mistefa Kemal kongireyek pêk anîbû û hewil dida ku ji derve ve piştgirîya Sovyêtê û ji hundir ve jî piştgirîya kurdan bigire, jixwe di sala

1920 de pêvajoya bi navê peymana aştîyê ku paşê jî peymana "Sîverê" jê re hatîye gotin, jixwe konfirasên amadekarîyê li Sanrîmo dest pê kiribûn û di 10 tebaxa 1920 de peymana Sîverê hate muhrkirin.

**Şanda Kurd Di Konfiransa Lihevhatinê De:**

Kurd bi şandeke nefermî bi serokatîya General Şerîf Paşa, beşdarî konferansê bûn ku ji alîyê Komela Pêşketina Kurdistanê, Partîya Demokrat, Partîya Serxwebûna Kurd û Komela Kurd ve, ji bo serokatîya şanda Kurdî hatibû hilbijartin. Deste ji Fexrî Adil Beg, Adil Beg Mêrdînî, berdevkê Karûbarên Şerîf Paşa Salih Beg Husnî û Sekreterê Şerîf Paşa Xalib Elî Bey pêk dihat. Şêx Mehmûdê Hefîd, hewil da ku şandeke taybet bişîne û bi Şerîf Paşa re biçe Parîsê, lê ingilîzan nehiştin ku were.

Di konferansa 29 ê Çileya 1919 de ji alîyê nûnerê şanda ingilîzistanê ve, daxwaza bi temamî cûdakirina (Ermenistan, Sûrî, Mezopotamya, Kurdistan, Filistîn û Nîvgirava Ereban) hatibû kirin, her wiha yekem car bû ku Kurdistan û pirsgirêka kurdî ketibûn nava gotûbêjan de. Jixwe Ingilîzistanê daxwaz kiribû ku Kurdistanê ji nû ve parçe bibe, ew jî bi vî awayî: Başûr para Ingilîzistanê, beşûr û rojava para Fransa, rojava û bakur paras Amerîka bin ku Rojhilatê Kurdistanê jî weke parêzgeheke bi ser Îranê de bimîne.

**Gelo Çima Sêver Neketîye Merîyetê?**

**Rewş Hat Guhertin**

Amerîka diruşmeya mafê çarenûsa gelan bi taybet li Împaratorîya Osmanî bilind kiribû, her wiha banga avakirina Komeleya Miletan dikir. Pêşnîyara ku Îngilîsçz-Fransayê ya erkdarkirina li ser Ermenistan û beşekî Kurdistanê red kirîye, bi têkçûna Partîya Demokrat û dawîhatina serokatîya Wilson re ji konferansê vekişîya bû.

Vekişîna şanda Amerîkî ji konferansê û hevgirtina berjewendîyên Ingilîzî û Fransî, bû sedema bilezkirina lêgerîna lihevhatin û lihevkirinên ji bo parvekirina pêşmaya Osmanî.

Ingilîz û Fransa di konferansa Sanrîmo ya 24 tîrmeha 1920 de, gihîştin rêkeftineke pêşîn li ser parvekirinê paşmaya Osmanî, ew jî ku raspêrîya Ingilîzistanê ya li ser Iraq û Filistînê û raspêrîya Fransî ya li ser Sûrîye û Lubnanê were erêkirin, êdî amadekirin ji peymana Sêvrê re were kirin.

Berîya sêverê Şerîf Paşa di nava liv û tevgerê de bû û nameyek şandibû kongreya aştîyê, General Şerîf paşa di wê nameyê de bi şandina Nexşeyeke mezin a erdnîgarîya Kurdistanê; ji rêveberên kongreyê daxwaza damezarandina dewleteke serbixwe ya bi navê Kurdistanê kiribû.

Ew name bû sedem ku piştre di bendên (62,63 û 64) de, ji nava 433 madeyan de, navê kurdan û daxwazên wan di peymana Sêverê de were dîyar kirin, bi destnîşankirina her sê bendên 62, 63 û 64 re; tevî ku mafê kurdan bi temamî tunebû, her wiha çar perçeyên Kurdistanê ne di nav de bû, lê ji Kurd û Kurdistanê re pir giring bû.

Tenê li pareke xaka Kurdistanê ku dikete rojhilatê çemê Firatê, destpêka desthilatdarîya kurdan dê bi awayê xweserî bûya. Êdî di dema salekê de, eger gelê Kurd bixwaze bi temamî ji Tirkîyê veqete û serxwebûnê bixwaze û serî li Koma Neteweyan bide ku ew jî bawerîyê bînin ku Kurd xwedî wê karînê bin, êdî dikarin daxwaza serbixwebûnê pêk bînin, her wiha Mûsil jî dikare tev sînorê Kurdistana serbi xwe bibe. Di pareke wê peymanê de wiha hatibû nivîsîn: ***"Piştî ku serbixwebûna dewleta Kurdistanê pêk hat, ger kurdên ku li wilayeta Mûsilê dijîn ku pareke xaka Kurdistanê ye, bixwazin tevî Kurdistana serbixwe bibin, di vê rewşê de hêzên hevalbendyê nikaribin dijberîyê li vê yekê bikin."***

Lê peymana Lozanê ew hêvîya Kurdistana serbixwe wenda kir, lewra Şerîf Paşa yê Xendan( 1865-1945) ku bi nexweşîya derûnî li dawîya sala 1945 li bajarê Napolî yê welatê Îtalyayê jiyan xwe ji dest dabû, di wesîyeta xwe de weia gotibû ***"Ji ber ku welatekî me tune ye, termê min bişewtînin û xûlîya wê jî bavêjin nava deryayê…".*** Ew daxwaza wî nehate bi cih anîn û li goristana Xidêwîyên Qahireyê hate veşartin.

Di dema Osmanîyan de, navê Kurdistanê qedexe nebû. Ji alîyê Osmanîyan çar kesan peymana Sêverê muhr kirine. Ji ber ku parlamentoya Osmanîyan roja 18 Adara sala 1920 hatibû hilweşandin, peyman ji bo erêkirinê negihişte ber destê serok û endamên parlamentoyê. Bi vî awayî jî negihişt ber destê Sultan Mihemedê Şeşem (1861-1926 ).

Mustafa Kemal ku li ser pêşmaya Osmanîyan di xewna avakirina tirkîyeke nû de bû, baş dizanîbû ku ji bona şerê serxwebûnê, bêyî kurdan serfirazîya wî ne gengaz e.

Lewra li ser mesela biratîya du gelan, Tirk û kKrd de pilan kirîye û bi kesayetîyên weke Hesen Xeyrî, Dîyap Axa û hinek kesên dîyar ji malbatên weke Şemzînî û Cemîl Paşa re kete nava peywendî û gotûbêjê de.

Bi Serkeftina Mistefa Kemal di şerê serxwebûnê de (19 gulana 1919 ta 29 cotmeha 1923) rewşa li Tirkîyê hatibû guhertin, Ingilîzan dev ji sîyaseta perçekirina xaka Tirkîyê berdabûn û xwestin ku bendekê li pêşîya Sovyetan çêkin, lewra bi Kemal istan re ketine nava pêwendîyan û pêvajoyeke din dest pê kiribû, pêwistbû ku li şûna Sêverê peymaneke nû were muhrkirin, êdî bi vî hawayî di 27 cotmeha sala 1922 de dûbare Enqere hatîye vexwendin ji konfirasa aştîyê ya Lozanê re, konfirans wê di 13 mijdara 1922 de dest pê kiriba. Peymana Lozanê bi wan mercan derkete holê, êdî hemû daxwazên Kurd, Ermen û Yûnana yên di peymana Sêverê de bi tenê li ser kaxezan mane.

Di 4 mijdara sala 1922 de li encumena Tirkîyê li ser amadekarîyên peymana Lozanê rûniştin pêk hatin, di serî de şandyarê Bidlîsê Yûsif Zîya û gelek şandyarên kurd ji êandeya Tirkîyê dixwestin ku di hevdîtinên Lozanê de tucarî erê nekin ku Mûsil û Heleb ji Tirkîyê werin veqitandin, anku Başûr û Rojavayê Kurdistanê, di axaftinan de yekîtîya kurd û tirkan jî der diket pêş û bi hêsanî Kurdistan dihate ziman, Mistefa Kemal digot ku Kurd û Tirk weke goşt û neynûkê ne ji hev cûda nabin?

Fi 16 çileya sala 1923 de, Mistefa Kemal di hevpeyvînekê bi rojnemevanan re ev daxuya kirin: "Niha encumena mezin a neteweya Tirkîyê ji nûnerên tirkan û kurdan pêk tê, van her du gelan pêşeroja xwe kirine yek , anku ew dizanin ku ev tiştekî hevpare, ne di cî de ye ku mirov rabe tixûbekî û sînorekî cûda xêz bike". Mistefa Kemal di heman demê de bi vê daxuyanîyê peyameke dida Lozanê jî.

Hevdîtinên li bajarê Lozana Siwêsreyê di 20 mijdara 1922 dest pê kir, dewletên beşdarî konfirasa Lozanê bibûn, ev bûn: Ingilîzistan, Frensa, Îtalîya, Tirkî, Yunanistan, Yûgoslavîya, Japonîya, Yekîtîya Sovyetan, Romanîya û Bulgaristan ku tev civînên li ser pirsgirêkên tengavan bûne.

Her wiha Amerîka jî weke çavdêr beşdar bibû, şandeyên dewletan di bin serokatîya wezîrên xwe yên derve de tevlî konfirasê bibûn.

Êdî di vê pêvajoyê de, Mistefa Kemal bi sovyetan re bibû heval, bi Frensa re jî peyman çêkiribû. Inglîz jî vê yekê dibînin û hez nakin ku Tirkî bi temamî têkeve bin bandora sovyetan, lewra wan jî bi tirkan re hevdîtin dest pê kir, lê di nava wan de nakokî hebûn, Inglîz Rojavayê Kurdistanê dide Frensayê û ew bi xwe jî Başûrê Kurdistanê control dikin, hesabên Inglîz li ser petrola Kerkûk û Mûsilê hebûn, lê Kemal dîsa jî di vê pêvajoyê de bêtir xwedî hêzbûn, weke mînak; (saleke piştî serkeftina wan ya li himber yûnanan di sala 1922 de şahinşaha osmanî ji hole rakiribûn û weke desthilatdarîya tirkan çûne Lozanê, êdî di havîna 1923 de jî hevpeymana Lozanê hate morkirin.

**Di Pêvajoya Lozanê De Rewşa Tevgera Kurdî**

Piranîya kurdan li dij kemalistan û tevgerên wan bûn, lê belê neteweperstên tirk di xapandin û bikaranîna gelan de pir li pêş bûn, êdî ji bona ku di Lozanê de jî serkeftinan li ser hesabê kurdan pêk bînin, Mistefa Kemal hin mezinên kurdan li gel xwe girtibûn, her wiha rêxistinên kurdan bi taybet li Istanbolê kuştibûn, di vê pêvajoyê de, tirk bi hêz bibûn û kurd ji hevketî û ne li hev bûn, Mistefa Kemal şahinşahîya osmanî rakiribû û gotûbêj dikirin dê çawa herin Lozanê.

Ismet Inono di Lozanê de digot ku em li ser navê kurdan û tirkan hatine? Kesên weke Hesen Xeyrî û hin mezinên eşîrên kurdan li pişta wî bûn.

Di despêka konfirasê de nûnerê Ingilîz Lord Korzon daxuyanîyekê dide û dibêje:"**Kurd ne tirk in, kurd nr gelekî toranî ye, Kurd Aryen in, lewma xwedî dîrokeke cûda ne, şandyarê Enqerê ji alîyê Mistefa Kemal ve hatine bijartin, lewma ew nikarin nûnertîya kurdan bikin û bi vî awayî Inglîz bi tu awayî dest ji Mûsilê bernadin".** Ev gotûbêj di demeke kin de bandorê li encumena Tirkîyê jî dike.

Hin şandyarên kurd, bersivê didin Lord Korzon ku yek ji wan jî şandyarê Bidlîsê Yûsif Zîya bû (paşê di şoreşa Şêx Seyîd de, hate bidarvekirin) Di vê pêvajoyê de bi dehan eşîr jî tiligrafan dişînin peymana Lozanê, dibêjin em pişgirîya Tirkîyê dikin, lê dîsa jî Ingilîz razî nabin, derdê ingilîzan ne kurd bû, lê belê petrola Kerkûk û Mûsilê bûn .

Hevdîtinên Lozanê du meh û nîvan berdewam kirin, ji 4 sibata 1923 heta 23 nisana 1923, şertên giran dabûn pêşîya dewleta Tirkîyê.

Di 23 nîsana 1923 de şanda Tirkîyê bi serokatîya Ismet Inunu careke din diçe Lozanê, lê vê carê hevdîtin dê dirêj nekiribû, li ser van xalan li hev kiribûn: Tirkîye bi şertê parastina sînorê sîyasî yê niha ku peymana Niştimanî(Mîsaqa Milî) jê re dibêjin, pêşnîyaza dewletên hevpeyman qebûl kiribû, li himber vê jî dest ji doza Mûsilê berda bû, tirkan razî bibûn ku Mûsilê bidin Ingilîzan. Bi tenê morkirin mabûn, roja 24 têrmeha sala 1923 weke roja morkirina vê peymanê hatibû destnîşankirin.

Pirsgirêka dawî ya tengavan bû, ji ber ku tengavên Istambol û Çeneqelê serdestîyeke stratejîk dida dewleta Tirkîyê, Frensa, Ingilîz û Sovyetê, êdî ji bo mafê bikaranîna van tengavan, dixwestin hin takemafan bi dest bixin, roja 12 berfanbarê jî rûneştina li ser parastina kêmnetewan dest pê kiribû, Lord Korzonê Ingilîz wiha digot: **"Ev pirsgirêk hemû cîhana medenî têkilder dike, em bawer dikin ku rêgeza parastin û ewlehîya kêmnetewan rlgezeke wiha ye ku kes li dij dernayê"**, jixwe dîsa dixwestin kurdan weke kêmneteweke bipejirînin û mafê wan jî di sabara(statû) mafê kêmnetewa de sînordar bikin.

Piştî sê mehan di 24 tîrmehê de, li siwêsreyê li bajarê Lozanê, ev peyman di rûpelên dîroka sîyasî de ku weke peymana Lozanê tê binavkirin, hat morkirin, êdî di 31 adara 1924 de jî ket merîyetê.

Piştî morkirina peymana Lozanê, di navbera perlementerên kurdan û tirkan de gotûbêjên gerim dest pê kirin, Ismet Inunu rastî vajî dikirin! Di civîna girtî ya encumenê de, gava Inunu biryara peymana Lozanê ya ku Mûsil ji Ingilîzan re dihişt xwend; nûnerên kurd li dij biryarê derketin û gotin: "**Dive Kurd ji îro û pê ve çarenûsa xwe bi destê xwe destnîşan bikin",** her wiha nûnerê Bedlîsê jî Yûsif Zîya piştî vê bûyerê, di 27 çileya 1923 de di hevpeyvînekê de, bi diplomatê Sovyêtê re helwesta xwe wiha tîne zimên: "**Heta ana em dihizirîn ku Kurd û Tirk di şerê rêzgarbûnê bi imperyalistan re dê bi hev re çareser bikin, lê niha ji gava ku ferwerîya Tirkîyê razîbû ku Mûsilê bide Ingilîzan, hemû hêvîyên me têkçûn**", her wiha Yûsif Zîya bazara tirk û Ingilîzan a li ser parvekirina Kurdistanê, jî dianî ziman û digot: "**Ingilîzan li tirkan pêşnîyaz kirin bi şertê ku Tirk mafên xweserîyê bidin Kurdistanê, ew dipejirînin ku ji Mûsilê derkevin, lê Tirk ji bo ku xweserîyê nedin kurdan , Mûsil dan Ingilîzan**. Piştî ku Mûsil dan Ingilîzan, Şêx Mehmûd Berzencî, li dij vê yekê derket û li himber Ingilîzan serî hilda, di heman demê de balefirên Ingilîzan dest bi bombebarankirina Başûrê Kurdistanê kirin.

Mistefa Kemal jî pêvaioyê baş birêve dibe ku ji alîkî ve kurdên herêmê û Şêx Mehmûd li himber Ingilîzan tûj dike û ji alîkî din ve dixwaze bi Ingilîzan re peymaneke veşartî çêke.

Ingilîzan her çendî ji Mehmûdê Berzencî re digotin raweste jî em ê serxwebûnê bidine we, Mistefa Kemal dibêje Berzencî na, divê hûn mafê serxwebûnê bixwazin!! Di wê demê de Kemalist gaveke pir stratejîk davêjin û encûmenê betal dikin ku diçin hilbijartinan, êdî di vê navberê de, Lozan tê morkirin û Mûsil jî didin Ingilîzan.

Di vê pêvajoyê de herî zêde bi awayekî vekirî şandeya Rûsî bi fermana Stalîn, piştgirîya tirkan dike, mafên gelên din yên weke Kurd, Ermen, Asorî, Siryanî û Kildanî bi awayekî eşkere dihatin binpêkirin, erêkirina vê peymanê di heman demê de, erêkirina qirkirina Ermen, Asorî, Siryanî û Kildanîyan bû, di rojên peymana Lozanê de li bajarê Erzrûmê jî, serkêş û rewşenbîrên kurdan jî di nava xwe de peymanek li dar xistin, êdî bi vî awayî di sala 1923 de, rêxistina Azadî hatibû damezirandin ku amadekarîyên serhildanekê dihatin kirin, êdî li Kurdistanê pêvajoya serhildan û komkujîya n dest pê kirbû .

**Şoreşên Mezin Li Kurdistanê**

- **Serhildana Koçgirî:** Di sala 1920 de li herêma Dêrsimê dest pê kir ku ji alîyê endamên rêxistina Komeleya Te'alî ya Kurdistanê ve hatibû pilan kirin.
- **Serhildana Şêx Seîd:** Di sibata 1925 de dest pê kir, 15 hezar şervanên Kurd li hember 52 hezar hêzên cendirmeyên tirk bûn. Şoreş li parêzgeha Amedê û bajarê Mêrdînê belav bû. Şoreşa Şêx Seîd yekem serhildana mezin a li Bakûrê Kurdistanê bû. Bi giranî ji alîyê komeleya kurd a serbixwe ya Azadî ve hat birêvebirin. Serhildan di Adara 1925 de bi dawî bû. Şêx Seîd û hemû pêşengên rêxistinê yên serhildanê di 29 hezîranê de hatin bi dar vekirin.
- **Serhildana Araratê:** Serxwebûna Komara Agirî di sala 1927 de, di dema pêla serhildanan li Bakûrê Kurdistanê de, hat ragihandin. Serhildan ji alîyê general Îhsan Nûrî Paşa ve hat birêvebirin, di sala 1930 de çîyayê Agirî ji her alî ve bombebaran kirin. Li gorî general Îhsan Nûrî Paşa, serwerîya leşkerî ya hêzên hewayî yên tirk bû sedema şekestina wan.

- **Şoreşa PKK (1984):** Di sala 1978 de PKK hatîye avakirin, êdî ji ber nebûna derfetên demokrasîyê û xebata sîyasî di nava sînorên Tirkîyê de, di 1984 de

bi fermî dest bi şoreşa çekdarî kirîye, şoreşa 1984 encam û berdewamîya berxwedana gelê Kurdistan li himber nepejrandin û tunekirina ku Tirkîye li ser kurdan disepand û ta roja îro şoreş berdewame ku derbasî asta nûnertîya tevaya gelên Rojhilata Navîn dike, ew jî bi berxwedana li himber desthilatdarîya ku li ser gelan tê meşandin. Di sala 1999 de di nava komployeke navnetewî de, Rêcer Ocelan ji hêla saloxgerîya cîhanî ve radestî dewleta Tirkîyê hate kirin.

**Pilanên Tirkîye Yên Ji Bo Dagirkirina Parêzgeha Mûsil û Helebê**:

Di sala 2015 de serokkomarê Tirkîyê Erdogan, reklamek belavkir ku di reklamê de dihat gotin ku wê rojek were Heleb, Mûsil, Kerkûk û Hewlêr bikeve nav Tirkîyê de. Ev ne tenê reklamek ji rêzê bû, lê belê belkî bi salan e Tirkîye ji bo pêkanîna vê yekê pilanan amade dike. Bi taybet sala 2015 û şûn de, dewleta Tirk ji bo pêkanîna van xewn û xeyalên xwe ketîye nava liv û tevgerê de.

Di sala 2015 de dewleta Tirk bi awayek yekalî xwe ji pêvajoya aşitîyê ya ku li gel Tevgera Azadîxwaz a gelê Kurd da bû destpêkirin; şûnde kişand. Di Heman salê de ku dibû 92 salvegera peymana Lozanê, dewleta Tirk li ser Başûrê Kurdistanê dest bi êrîşan kir. Niha dewleta Tirk bi qasî 40 kîlometran di nav xaka Başûrê Kurdistanê de hatîye pêş û 38 baregehên leşkerî û sîxûrî avakirîye.

Di heman demê de Rojavayê Kurdistanê de jî (Efrîn, Serê Kanîyê û Girê Spî) dagirkirîye û ta niha jî êrîşên xwe yên li ser Rojava berdewam dike.

100 salîya peymana Lozanê tema dibe, ji bona vê yekê dewleta Tirk hewil dida ku di 2023 de di çarçoveya pirojeya "Peymana Ntimanî" de gelek destkeftan di Rojhilata Navîn de bi dest bixe û careke din Tirkîyê vegere sinorên Osmanîyan yên berîya Lozanê.

**Kurdan li himber pilanên Tirkîyê çi kirine?**

Dewleta Tirk di amadekarîyên ji bo dagirkirina Kurdistanê de berdewam e ku ev hewildanên wê jî ne veşartîne. Di vir de ya were pirsîn ew e ku kurdan ji bo rûbirûbûna van pilanên dewleta Tirk çi kirine? Gelo Kurd ji bo carek din destkeftên heyî ji dest neçin çiqasî yekgirtî ne û xewna azadî û serxwebûnê bicih bînin?

Ji şoreşa Şêx Seîdê Pîran bigre ta roja me ya îro, hemû şoreşên kurdan ji ber xîyaneta navxweyî û yeknegirtina nava kurdan biserneketine. Di roja me ya îro de jî, xîyaneta navxweyî weke xeteke metirsîdar tê binavkirin.

Her çendî ku di roja me ya îro de jî, hewildaneke mezin heye ji bo yekgirtina gelê Kurd û pêkanîna yekîtîya neteweyî, lê ta niha nikarin vê yekîtîya neteweyî pêk bînin. Çavdêrên sîyasî jî dîyar dikin ku ger Kurd li dij êrîşan ne yekgirtî bin, dê dîrok careke din xwe dubare bike û Kurd dê nikaribin bigihêjin mafên xwe yên rewayî.

**Nirxandinên Rêber Ocalan**

Rêber Ocalan di nirxandin û dahûrandina xwe de, peymana Lozanê weke bûyera herî biêş a sedsala 20 pênase kiribû û gotibû: "**Bi peymana Lozanê Tirkîyê ne tenê petrola Musul-Kerkukê ji destên xwe berdan, lê di heman demê de Kurd jî winda kirin, êdî xwişk û biratîya kurd û tirkan a dîrokî hat windakirin"**.

Rêber Ocalan, di roportaja ku di (23-25) îlona 1989 de dabû koverekê, dîsa bal kişandibû ser peymana Lozanê û wiha dibêje: "**Yekîtî; têkilîya kesên weke hev û bi hev re ye. Wekhevîya di qada aborî, ramyarîyêç û mafên neteweyî de, bingeha yekîtîyê ye. Ev yekîtîyek bi cewher û rêzdar e. Me got em ê Sêverê derbas bikin û em ê Lozanê jî derbas bikin. Em dê lihevhatina gelan a demokratîk ava bikin. Ev lihevhatin azadîya mezin e. Gelê Rojhalat Navîn bi qasî gelê Kurd û Tirk pêwîstîya wan bi vê lihevhatina heye.**

# Çekên Kîmyayî û Qirkirina Kurdan

( 1 ji 2 )

**Pêşgotin:**

Çekên kîmyayî -çi bi rewşa xwe ya gazî û çi jî ya avî- di seranserî dîrokê de weke alaveke êrîşê di gelek şer û cengan de hatine bikaranîn. Ev yek bi hewldana mirov a ji bo avakirina pergaleke serdest û zordest dest pê dibe, heyanî digihêje avabûna pergalên hemdem ên zordest û sermayedar. Dîroka wê dirêj e û seranserî sedsalan hevrêyê mirov maye. Tê texmînkirin ku yekemîn kesên ev cureya çekan di şerê li dijî dijminên xwe de bi kar anîne, hindî ne, ku vedigere nêzî 2000 sal berî zayînê. Hatiye vedîtin ku di wê demê de hin dûmanên jehrî yên ku dibin sedema sistbûn, xilmaşbûn û bawişkbûnê, hatine bikaranîn. Her wiha di şerên artêşên grîkî de jî hatiye bikaranîn û piştre jî di serdema herdu cengên cîhanî yên yekem û duyem de, ji alîyê artêşên almanî, fransî, amerîkî, iraqî, tirkî û…hwd. ve hatine bikaranîn.

Di destpêka sedsala nozdehem de, rêzikên şer ên ku ji ber nirxên mirovî, rêzikên rûmetê û rêgezên ol û sincan derketine, êdî teşeya rêzikên fermanwerî li xwe girtiye. Ji ber ku zagonin neçarî bû, ji çarçoveya reftarên sincî yên nepabendbûyî ber bi çarçoveya rêzikên zagonî yên pabendbûyî ve, veguherîn.

Neteweyên Yekbûyî di hukim û nêrînên xwe de eşkere kiriye ku berjewendîya civaka navdewletî tê de heye gava rêzgirtinê ji rêzikên zagona mirovî ya navdewletî re bigire û çekên kîmyayî qedexe û tune bike. Her wiha berjewendîya giştî ya tevaya dewletan e jî. Ev yek pabendîyên hevpar û gelemper ji hemû dewletan re, bi navê civaka navdewletî disepîne ku di bicihanîna wan de berjewendîyên rewa hene. Her wiha berpirsiyarîyeke navdewletî jî dikeve ser milê her dewleta ku pabendîyên xwe yên navdewletî paşguh dike. Bi tevî vê yekê jî, gelek dewlet hene ku bi bihaneya rêgirtina leşkerî li beramber dijminan, li cem xwe qaseyên mezin ê van çekan dihewînin. Lê ya jê metirsîdartir ew e ku hin dewlet wan weke alaveke qirkirinê û bi armanca

sawkirina miletekî, ji bo pêkanîna desthilatdarîyê yan jî tirsandinê, bi kar tînin. Dewleta tirk ji wan dewletan e ku çekên kîmyayî weke alaveke qirkirinê li dijî gelê kurd an jî tirsandina wî, da ku bixe bin serwerîya xwe û di nava dewleta tirk a netewperest de bipişêve, bi kar tîne.

Gelê kurd ji wan gelan e yê li Rojhilata Jêrîn ji her gelî bêtir rastî êrîşên bi çekên kîmyayî hatiye. Ne ji ber ku dewletek e û dewleteke din dide ber gefan, lê ji ber ku gelek e û mayîna wî dîroka sexte ya dewleta neteweyî li herêmê dihetikîne û li pêşîya projeyên wê yên îdolojîk dibe asteng. Lewre jî ev sed sal in ku rastî siyaseteke plankirî ya qirkirinê, bi rêya komkujîyan, prosesên pişaftina çandî û koçberkirina kotekî ya ji welatê xwe, tê. Çekên kîmyayî jî weke alaveke din a ku di siyaseta qirkirina plankirî ya li dijî kurdan de, têne dîtin. Jixwe heya niha jî bêyî tirs, ji alîyê dewleta tirk ve têne bikaranîn. Êdî ev yek li ser me disepîne ku careke din em bi bîr bixin ku gelê kurd ji ber van çekan rastî çi halî tê. Her wiha binpêkirinên dewleta tirk ên der barê rêzikên cîhanî yên qedexekirina bikaranîna çekên kîmyayî û yên qedexe ku di şerê xwe yê qirkirina gelê kurd de, ku weke alaveke qirkirinê bi kar tîne, eşkere bikin. Pê re jî em ê behsa bikaranînên dewleta tirk bo çekên kîmyayî ku di demên cihêreng de bi kar anîne, bikin. Her wiha mijara pabendbûna dewleta tirk (endama rêxistina qedexekirina çekên kîmyayî) bi peymana qedexekirin, nûjenkirin, çêkirin û hilandina çekên kîmyayî û tunekirina wan (peymana çekên kîmyayî) û peymanên din re, lêkolîn bikin. Pê re jî bidin diyarkirin bê çi qasî hewldanên navdewletî yên ji bo rêgirtina li ber bikaranîna çekên kîmyayî li dijî gelê kurd û di şerên çekdarî de, bi kêr tên. Her wiha li gor tişta ku rêxistina Qedexekirina Çekên kîmyayî bi dezgehên xwe yên cihêreng ve biryara wê daye, balê bikişînin li serê bê çi qasî di vê babetê de bi ser ketiye. Çi ku bikaranîna van çekan yek ji rêgezên zagona mirovî ya navdewletî yên bingehîn, bin pê dike; ku ew jî dide diyarkirin ku mafê alîyên pevçûnê yê hilbijartina alav û rêbazên şer ne mafekî qutebir û bê sînor e. Ew piştî ku behsa danasîna çekên kîmyayî û cureyên wê dike.

Dê tewereyên dosyayê wiha bin:

- Pênase û cureyên çekên kîmyayî.
- Pêşhatîyên dîrokî yên bikaranîna çekên kîmyayî li dijî gelê kurd li (başûrê Kurdistanê, bakurê Kurdistanê û Rojava).
- Çekên kîmyayî di peymanên navdewletî de.

- **Çekên kîmyayî: Pênase û Cureyên wan:**

Rêxistina “Qedexekirina Çekên kîmyayî” wiha çekên kîmyayî pênase dike ku; madeyên kîmyayî ne yên ji ber taybetîyên wan ên jehrî, ji bo kuştin an jî ziyankirina biqestî têne bikaranîn. Her wiha cebilxane, amûr û hemû alavên ku ji bo veguherandina madeyên kîmyayî yên jehrî bo çekan, dikevin jêr pênaseya çekên kîmyayî. Rêxistina çekên kîmyayî dibêje ku pênaseya çekên kîmyayî, hemû madeyên jehrî û yên mîna wan, gava ji bo karin qedexe werin bikaranîn - bi qaseyên li gorî wê mijarê- di nava xwe dihewîne…[1] Her wiha danasîna berbelav a çekên kîmyayî wiha dibêje ku; madeyên kîmyayî ne ku weke tijîkeran têne bikaranîn, mîna bombe yan jî berikên topan. Dibe ku ev yek ji alîyê teknîkî ve rast be, lê belê ev pênaseya ku xwe dispêre vê têgînê tenê beşek ji gelek tiştên cihêreng ên ku ji alîyê rêxistina qedexekirina çekên kîmyayî ve ku wan weke “çekên kîmyayî” dibîne, mîna gazên rondikrij, di nava xwe de digire.

Bi tevî bandorîyên jehrî û kujer ên li ser mirov û jîngehê û şewitandinên metirsîdar ên li ser giyanewerên li devera armanc jî, mîna bombeyên Napalm, gaza siniran, fosfor… û hwd, bandorîyên çekên kîmyayî, hinekî ji yên çekên tevkujî yên klasîk, mîna çekên nûklerî û moşekên balistî, cûdatir in. Li vir em dikarin bibêjin ku çekên kîmyayî yek ji cureyên çekên tevkujî ne, lê belê ne hemû caran em dikarin wan weke çekên tevkujî bibînin, lê belê di zanîna leşkerî de weke çekên stratejîk têne dîtin. Li gor wê, çekên kîmyayî, hemû qûtîkên ku tê de madeyên kîmyayî û pêkhateyên wê hene û cebilxane û amûrên ku ji bo belavkirina van madeyan hatine çêkirin û pê re jî alavên ku bi taybetî ji bo bikaranîna van cebilxane û amûran hatine çêkirin, di nava xwe de dihewînin.

Bi tevî ku ew qasî metirsîdar in jî, lê belê bi dehan dewlet hene ku çekên kîmyayî li cem xwe hilandine. Hinek ji wan ji ber xwe ve dikarin biteqin û hinek jî pêdivîya wan bi pêkarin din heye heyanî biteqin.

Madeyên kîyewî yên jehrî dabeşî madeyên toz, şile û gaz dibin. Lê belê ya dawîyê, ji ber hêsanbûna bikaranîna wê, leza belavbûnê, kêmbûna lêçûnan û berfirehbûna belavbûna wê, weke madeya herî bikêrhatî tê dîtin. Ji wan jî yên herî metirsîdar, gazên siniran e, mîna gaza Xerdel, gaza Fosîjen, gaza Tabûn, gaza Sarîn û gazên VX û gelek gazên din. Berztirîn gazên ku di şerê cîhanî yê

[1] Rêxistina Qedexekirina Çekên Kîmyewî, Çekên kîmyewî çi ne? Lînk: https://www.opcw.org/ar/mlna/ma-hy-alaslht-alkymyayyt

yekem de hat bikaranîn, gaza Xerdel û ya Fosîjen bûn ku di sîngê de şewitandin çêdikir, her wiha korbûn û bêteşetî çêdikir, heyanî digihêje asta mirinê jî. Her wiha nazîyên almanî di dema şerê cîhanî yê duyem de, bi zanebûn Siyanîd Hîdrojen belav dikir û Zayklon B berdidan nava odeyên gazê ku dibûn sedema mirina gelek kesan.[2]

Ji bandorîyên wê yên wêranker li ser tenduristîya mirovan û giyanewerên din, bilindbûna rêjeya penceşêra çerm, çêbûna pirsikên çerm, şewat û birîn in. Gava ku bigihêje çavan êdî dibe sedema korbûnê, şewitandina tûj û gelek bandorîyên din. Kişandina hilma jehrî ya ji ber wan derdikeve, dihêle ku pergala bêhndanê têk biçe û di encamê de bêhnçikandin çedibe û di dawîyê de dimire. Her wiha dihêle ku zevî û jiyana deryayî jî wêran bibin. Li kêleka wê jî, dihêle ku pergala sinirî xirab bibe ku di encamê de jihalçûn, şipeste û gelek xirabîyên din çêbibin. Ev hemû jî bi rêya derbasbûna van madeyên kîmyayî di nava laşê mirovan de ku bi rêya bêhnkirinê yan jî daqurtandinê yan jî gihandiana wan bo çav an çerm, çêdibin. Pê re jî gelek alozîyên derûnî yên ji ber "tirsa ji gazê" çêdibin û bandorê li pergala sinirî dikin. Her wiha gelek bandorîyên wan ên demdirêj jî hene, mîna bêteşetî û gemar, ku tevaya van bandorîyan pergala jîngehî têk dibin.

**Hin agahî der barê berztirîn gazên ku tên bikaranîn de:**

- **Gaza siniran an jî Sarîn:**

Gazeke sinirî ye û bi wê yekê tê nasîn ku bi lez ji şileyê vediguhere gazê. Gava dibe gaz, êdî zû berbelav dibe. Gaza Sarîn bi rêya gihandina li ser çerm an çavan an jî bêhnkirina wê, li ser mirovan bandorê dike. Her wiha dikare tev li nava xwarin û avê jî bibe. Gava mirov ku bi gaza Sarîn jehrî dibin, êdî şaneyên sinirî madeya "Estîl Kolîn" derdixe ku dihêle masulke kurt bibin û bêhn were kişandin lê dernekeve, ev yek ji ber tunebûna molekulên "Pak Man" çêdibe û di encamê de fetisandin çêdibe.

- **Klorîn:**

Madeyeke kîmyayî ye ku ji bo çêkirina berhemên paqijîyê yên malan tê bikaranîn. Gazeke zer-kesk e û di nava pileyeke germahîyê û fişareke normal de ye. Lê belê carê ji bo embarkirin û veguhastinê tê fişarkirin û sarkirin. Gava ku

[2] Peter Hayes; From Cooperation to Complicity: Degussa in the Third Reich; Cambridge University Press; First published 2004; Link: https://assets.cambridge.org/97805217/82272/frontmatter/9780521782272_frontmatter.pdf

Klorîn tê bêhnkirin an vexwarin an jî digihêje çerm, bi avê re çalak dibe û tirşîyekê derdixe ku şaneyên laş dikuje.

- **Fosfora Spî:**

Madeyeke kîmyayî ye ku bi oksîjenê re çalak dibe û ji ber wê agirekî pir germ û qaseyeke mezin a dûmana spî û mezin çêdike. Gava ku digihêje laş êdî şewateke pir mezin çêdike. Her wiha rakirina fosforê yan jî vemirandina wê pir zor e. Bi çavekî dîtaneyî; ew çekeke kîmyayî ye û li gor rêzikên zagona navdewletî ya mirovî qedexe ye; çi ku taybetîyên wê yên jehrî dihêle ku ziyaneke bi zanebûn çêbibe û şiyanan têk dibe, her wiha dikuje jî.

- **Pêşhatîyên Dîrokî Yên Bikaranîna Çekên kîmyayî Li Dijî Kurdan:**

Gelê kurd li seranserî sed salên borî bi armanca qirkirina wan û têkbirina serhildanên wan, gelek caran rastî êrîşên bi çekên kîmyayî hatiye. Di encama van êrîşan de bi hezaran jiyana xwe ji dest da, bi hezaran ziyan dîtin û ji bilî ku ji ber van çekan çi qasî ziyan li zevî, dar û malên wan û xwezayê kir. Her wiha hişt ku bi sedhezaran ji herêmên xwe derkevin. Herî bêtir ên ev çek li dijî herêmên kurdan bi kar anîne, rêjîma Beisê ya iraqî û rêjîma tirkî ne, nemaze li başûr, bakur û rojavayê Kurdistanê.

- **Bikaranîna Çekên kîmyayî Li Başûrê Kurdistanê:**

Di dema şoreşa Îlonê (1961–1975)[3] de hêzên iraqî gazên jehrî û bombeyên Napalmê li başûrê Kurdistanê -Aniha herêma Kurdistanê ye-bi kar anîn. Sala 1987an jî, piştî ku gundê “Şêx Wesan” û gundên derdora wî yên li “Gelîyê Balîsan” yên li parêzgeha Hewlêrê rastî êrîşa bi çekên kîmyayî hat, 360 kesên kurd jiyana xwe ji dest da. Her wiha heman çek di êrîşa li ser Enfalê û gelek deverên Kurdistanê de hatin bikaranîn. Tenê li herêma “Qeredaxê” bêtirî 400 kesî bûn qurbanî (Li gorî rapora komîteya mafên mirovan a wê demê).

[3] Ebdulrehman Silêman El-Zêbarî; Rewşa zagonî ya herêma Kurdistanê ya hevdemî rêzikên zagona navdewletî de; Çapa yekem 2002; Weşan: Sazîya Mukrîyanî ya çap û weşanê; R 229.

Di 16-17ê Adara 1988an de, hêzên iraqî bombeyên xwe yên kîmyayî ku di nava wan de gazên jehrî hebûn, mîna gaza Zayklon B (Zyclon B), an ku heman gaza ku nazîyan di dema şerê cîhanî yê duyem de, li serbazgehên ginçavkirinê yên ku nav û dengê wan pîs e, bi kar anîn, her wiha hin cureyin din ên gazên jehrî ku kompanîyên almanî yên pispor dabûn ferwerîya Iraqê, bi ser bajarê Helepçeyê de ku hejmareke mezin a niştecihan lê heye, avêtin. Di encama vê yekê de ne kêmî 5000 kesî jiyana xwe ji dest da. Di heman demê de hin çavkanî dibêjin ku hejmar ji wiha bêtir e û nêzî 8000 kesî ye. Jixwe hejmara birîndaran û zîyandîtîyan bi gelekî ji wiha bêtir e.



***Hin wêne ku tê de qurbanîyên kurd ên ji ber çekên kîmyayî yên hêzên iraqî li Helepçeyê sala 1988an ketine***



***Jineke pêncî û çar salî ji parêzgeha Temîm a Helepçeyê ye ku birînên wê têne dermankirin. Ew di 8ê tîrmeha 1991ê de ye. Ev jin di dema ku artêşa iraqî pêleke mezin a gaza Xerdelê bi ser herêma Sineyê de avêt, birîndar bû. Wiha tê texmînkirin ku ev êrîş. Mezintirîn êrîşên bi çekên kîmyayî ye ku li dijî herêmeke tije sivîl tê kirin.[4]***

- **Bikaranîna Çekên kîmyayî Li Derdora Bajarokê Sencaserê Yê Silêmanîyê, Sala 2009an:**

Roja 6ê sibata 2009an, balafirên şer ên Tirkîyê bajarokê Sencaserê yê li quntarên çiyayê Qendîlê bombebaran kir. Muxtarê gund Mihemed Hesen Resûl wiha got: “Piştî bombebaranê berjengên nexweşîyê derketin” her wiha lê zêde kir û got: “Heman rewşên nexweşîyê di nava xelkê bajarok de jî derketin, piştî wê jî nexweşîyên cihêreng pêşî li cem zarokan derketin û piştre jî li cem kesên gihayî derketin”. Li gor xelkê gund; piştî bombebaranê û bi taybet piştî çend xulekan ji ketina bombeyan li ser rûyê erdê, gundên Liyûcî, Ênzî û Boklîskan rastî bombebaraneke tund hatin û bêhnên genî belav bûn. Piştî wê bi çend saetan zarok verişiyan, nava wan çû, kuxikê ew girtin û pirsgirêkên gedeyê li cam wan derketin. Êdî piştî wê, berjengên nexweşîyên mîna verişandin û êşa çavan derketin.

[4] Nick Waters; Delîlê nûçegihîner ê ji bo lêpirsîna der barê sûcên cengê de; Çekên qedexe û sîonrdarkirî; Weşan: Tora cîhanî ya rojnamegerîya lêpirsîner; Dîroka weşanê: 21.10.2023; Lînk: https://gijn.org/ar/3-ا-الموارد/دليل-المراسل-للتّحقيق-في-جرائم-الحرب/

- **Bikaranîna Çekên kîmyayî Li Çiyayê Qendîlê:**

Fermandarîya navendî ya Hêzên Parastina Gel HPG, amaje bi wê yekê kir ku; dewleta tirk sala 2021ê gazên kîmyayî, bombeyên yûranyûmê û bombeyên fosforê yên tunelên teng, bêtirî 367 caran bi kar aniye. Li gor wê jî nêzî 47 şervanan li herêma Garê\Siyanî, Zendûra\Metîna, Mam Reşo\Avaşîn, Girê Sor\Aras Fêris, Girê Kertal û Werxelê, jiyana xwe ji dest daye.

Hin raporin din amaje dikin ku dewleta tirk hevdemî bêdengîya navdewletî, rêgeheke birêxistnkirî ya ji bo bikaranîna çekên kîmyayî yên qedexe[5] daye meşandin. Di çaxa di navbera 14ê nîsana 2022an heyanî cotmeha 2022an de, nêzî 27 şervanan jiyana xwe ji dest daye.[6]

Her wiha li deverin cihêreng û bi awayekî hevdem hatin bikaranî û li gor wê jî; li Şkefta Birîndaran 17 şervan, li Zapê 9 şervan, li Qada Karkeran 5 şervan û li Werxelê\Avaşîn jî 3 şervanan jiyana xwe ji dest da. Di nav qurbanîyan de dîmenê du şervanan (Mehmûd Can Evran \ Baz Mordem) û (Kewser Atîya \ Helbest Koçerîn) di encama bandorbûna bi çekên kîmyayî yên qedexe de, jiyana ji dest da.[7]

Agahîyên ku rastîya wan tekez bûye xwe dispêrin dîmenê ku hatî belavkirin û govanîya hin şervanan ku ji ber çekên kîmyayî jiyana xwe ji dest da û li ser wan ev nîşane diyar dibûn: Bêhnçikandin, tengbûna reşka çav, kuxîn, zêdederketina girêzê û galdan. Tê texmînkirin ku ev nîşane di encama hevgirtin û pûçelkirina Esîtîklolîtîraz ACHE de çêbûbin û ev yek bi jehrbûna bi gaza Sarîn re tê hevgirtin.

Dema ku em bala xwe didin dîmenê şervan Kewser Atîya (Helbest Koçerîn) tê dîtin ku ew bi gazeke pir jehrî bandor bûye. Li gor wê jî nîşaneyên şipestebûn, ziwabûn, şaşbûn, kêmbûna rêjemenîya çilmî (ziwabûna dev, çav û çerm), şaşaxaftin, gêjbûn, firehbûna bîboka çav, nezelalîya dîtinê, dilxelandin,

---

[5] Ji bo ku hin çekên ku Gerîla desteser kirine bibînin, li vê vegerin: Selami Aslan; TÜRK ORDUSUNUN KİMYASAL SİLAH KULLANDIĞI BELGELENDİ. GERİLLA SİLAHLARI ELE GEÇİRDİ!; 17.02.2022; LINK: https://www.youtube.com/watch?v=VeQzBjl8ySs

[6] ANF NEWS; HPG: Türk devletinin kimyasal saldırısında 11 gerilla şehit düştü; Salı, 27 Ara 2022; Link: https://firatnews.com/kurdistan/hpg-11-gerilla-turk-devletinin-kimyasal-saldirisinda-sehit-oldu-179300

[7] Mezopotamya Ajansı; KİMYASAL SİLAHA MARUZ KALAN 2 HPG GERİLLASININ GÖRÜNTÜLERİ YAYINLANDI; 18.10.2022; Link: https://www.youtube.com/watch?v=XSjfjA7urMc

verişandin û piştî wê jî ji ser hişê xwe çû. Tê texmînkirin ku pergala wê ya bêhndanê bi gaza (BZ) a ku siniran felc dike, an ku gaza Sarîn, bandor bûye.

Lê belê gava ku em bala xwe didin dîmenê şervan Mehmûd Can Evran (Baz Mordem) û daxuyanîya ku şervan Zîlan Mêrdîn dayî ku dibêje gava ku wan ew dît hişê xwe winda kiribû, ji ser hişê xwe çûbû, bêhna wî diçikiya, bê navber vedirşiya, girêza wî diherikî, ji ser hişê xwe diçû û pê re xwêdan digirit, êdî em dibînin ku ew jî mîna dîmenê ku berîya vê me behs kirî ne. Hat dîtin ku gelek peyweirên laş têk çûbûn; ku ev yek tekez dike ew bi gazeke pir jehrî bandor bûne.

Her wiha Hêzên Parastina Gel HPG hin dîmenên Gerîla yên ku bi çekên kîmyayî bandor bûne belav kirin. Tê de nîşaneyên girêdayî çekên kîmyayî pir bi zelalî diyar dibin. Pisporên ku ev dîmen dîtin eşkere kirin ku diyar e artêşa tirk bombeyên kîmyayî mîna Sîkolsarîn GF, Klorfîn, gaza Xerdel SM, Tabûn GA, Sarîn GB û fosfora spî, bi kar anîne. Tişa ku vê yekê tekez dike ew e ku piştî şervanên HPGê bakurê herêma "Sîriya" sala 2021ê vegerand bin kontrola xwe, li pêşîya şkefteke li Werxelê ev made dîtin:

**1.** Qûtîyên vala yên tirşîya Hîdroklorîk ku qaseya wan 30 litre ye.
**2.** Qûtîyên vala yên madeya spîker ku qaseya wê 5 kg.

Bi van her du madeyan mirov dikare Klorê bi awayê wê yê qedexe, bi hêsanî çêbike.

**3.** Kartûşeke maskên gazê yên cureya wan C2A1 ku taybet ji bo parastina ji handerên biyolojî û kîmyayî têne bikaranîn, hat dîtin.

Li gor rapora rêxistina bijîşkên navdewletî bo qedexekirina şerê nûklerî (IIPNW)[8] gelek kesan pirsiye; li gor zanyarîyên heyî tu caran nehatiye gotin ku Partîya Karkerên Kurdistanê çekên kîmyayî bi kar aniye, gelo çi pêdivîya leşkerên tirkan bi bikaranîna van maskan heye?!

[8] Dr. Josef Savary, Dr. Jan van Aken; Is Turkey violating the Chemical Weapons Convention?: An independent investigation into possible violations of the Chemical Weapons Convention in Northern Iraq is urgently needed;
IPPNW Switzerland/Germany October 2022; Link:
https://www.ippnw.de/commonFiles/bilder/Frieden/2022_IPPNW_Report_on_possible_Turkish_CWC_violations_in_Northern_Iraq.pdf



PICTURES 1 AND 2: CONTAINERS FOR HYDRO
(RIGHT). FOUND AT THE ENTRANCE OF THE W



ROCHLORIC ACID (LEFT) AND BLEACH
E WERXELÊ CAVE.



PICTURE 3: A CANISTER FOR A GAS MASK CARTRIDGE TYPE C2A1 WITH PROTECTION AGAINST CHEMICAL AND BIOLOGICAL WEAPONS. FOUND AT THE ENTRANCE OF THE WERXELÊ CAVE.





Her wiha di dîmenekî de ku rapora bijîşkên navdewletî bo qedexekirina şerê nûklerî (IIPNW)[9] xwe spartibûyê de, tê diyarkirin ku li Werxelê leşkerên tirkan borîyeke dirêj û fireh ku li ser amûreke mîna batêkerekê ye û ku dikare madeyên gazî bixe bin fişarê û wan belav bike hatiye siwarkirin, ber bi şkefteke ku ji alîyê şervanên PKKê ve tê bikaranîn ve dadixin.

[9] Dr. Josef Savary, Dr. Jan van Aken; Is Turkey violating the Chemical Weapons Convention?: An independent investigation into possible violations of the Chemical Weapons Convention in Northern Iraq is urgently needed;
IPPNW Switzerland/Germany October 2022; Link:
https://www.ippnw.de/commonFiles/bilder/Frieden/2022_IPPNW_Report_on_possible_Turkish_CWC_violations_in_Northern_Iraq.pdf










HOWS AN APPARATUS RESEMBLING A LEAF BLOWER
ING A COILED-UP HOSE. THE RIGHT PICTURE SHOWS
VIDEO-STILLS.

N THE HAND OF THE SOLDIER ON THE RIGHT. IN THE
HOW THE UNCOILED HOSE IS BEING MOUNTED ON SAID



***Di dîmenekî din de ku malpera "Medya News"ê belav kiribû de, tê dîtin ku leşkerên tirkan li pêşîya şkefteke ku ji alîyê şervanên PKKê ve tê bikaranîn dûmaneke mezin vêxistine. Pisporan ev yek wiha şîrove kir ku ev dûman ji ber çalakbûna kîmyayî çêdibe; ku şervanan neçarî derketina derve dike.***

Her wiha ajansa Firatê ya nûçeyan roja 18ê cotmeha 2023an dîmenek belav kir ku tê de du şervanên ku bi çekên kîmyayî bandor bûne, têne dîtin; yek ji wan qeyrana rêncbûnê ku mîna edrê ye pê re çêbûye û yê din jî weke şobe û şipeste pê re çêbûye.

Her wiha "Medya News"ê hin wêne û dîmenin din jî belav kirin ku di wan de berikeke topê ya artêşa tirk bi rengê keskê tarî ye, diyar dibe. Ev berik ji alîyê firokeyeke tirkan li bakurê Iraqê bi ser şervanan de hatibû avêtin. Taybetîyên berikê qermiçî û belavbûyî bû ku ji bilindahîyeke mezin ve hatibû avêtin lê dema li erdê ketibû nehatibû teqandin. Li serê jî "Nitranta Sodyûm"ê nivîsîbû.

- **Bikaranîna Çekên kîmyayî Li Zaxoyê Sala 2022an:**

Roja 4ê îlonê raporek ji gundîyin nêzî bajarê Zaxoyê ku gundê wan hatibû bombebarankirin, hat. Tê de eşkere dibe ku bi gundîyan re berjengên mîna şewat û verişînê çêbûbûn. Di nava wan de jî Ebdullah Hîrorî, hevjîna wî, keça wan û ji bilî wan jî li gundê "Herîr" hebûn. Li ser wan her sêyan jî xuyabû ku ji ser hişê xwe çûne, vedireşin û şewatên mezin bi wan re çêbûne. Jixwe ew ji alîyê cîranên wan ve hatin dîtin ku di cih de ew birin nexweşxaneya Zaxoyê ya li parêzgeha Duhokê. Li wê derê nehiştin ku ev bûyer ji alîyê rêxistina bijîşkên navdewletî yên bo qedexekirina şerê nûklerî (IPPNW) ve were belgekirin. Piştre wan berê xwe da herêma Kurdistana Iraqê sala 2022an.

Ev yek ji alîyê endamê mecilsa cîgiran a iraqî, Soran Umer Seîd ve hat gurkirin û li gor wê jî bi rêya nameya xwe ya jimar D\426 dîrok 14.11.2022 ku ji serokê mecilsa wezîran re şandibû, daxwaza lêpirsînê ji bo bikaranîna çekên kîmyayî li herêma Kurdistana Iraqê kir. Her wiha di rapora xwe ya jimar 221 dîrok 30.5.2022 ya ji nivîsgeha cîgirê yekem ê serokê meclisa cîgiran a Iraqê re, ku arasteyî wezareta karê derve ya Iraqê kiribû de, amaje bi wê yekê kir ku; daxwaza komîteyeke lêpirsînê der barê bikaranîna Tirkîyê bo çekên kîmyayî yên qedexe de kir. Her wiha amaje kir û got: "Ta niha der barê êrîşên leşkerî û ziyanên li ser xaka Iraqê û Herêmê de, tu helwest nehatiye dayîn". Li vê yekê zêde kir û got: "Mixabin, qurbanên van êrîşan bi dehan welatîyên bêguneh bûn, lewre em komek raporên ku bikaranîna Tirkîyê bo çekên kîmyayî pêşkêşî we dikin; da ku komîteyeke lêpirsîna der barê vê dozê de were avakirin".



جمهورية العراق
مجلس النواب العراقي
مكتب النائب
سوران عمر سعيد

کۆماری عێراق
ئەنجومەنی نوێنەران
نوسینگەی پەرلەمانتار
سۆران عومەر سەعید

العدد: ٤٢٦/د
التاريخ: ١٤/ ١١/ ٢٠٢٢

الى / السيد رئيس مجلس الوزراء المحترم

م / استخدام الأسلحة الكيمياوية في اقليم كردستان العراق

تحية طيبة ...

اشارة إلى كتاب مكتب النائب الأول لرئيس مجلس النواب العراقي المرقم ٢٢١ في ٢٠٢٢/٥/٣٠ و الموجه إلى وزارة الخارجية العراقية والذي يطلب فيه تشكيل لجنة تحقيق حول استخدام الأسلحة الكيمياوية الممنوعة دولياً من قبل تركيا.

ولكن لم يتم اتخاذ أي موقف حتى هذه اللحظة حول تلك الهجمات العسكرية والاعتداءات على ارض العراق والاقليم.

وللأسف راح ضحية تلك الهجمات عشرات المواطنين الأبرياء، لذلك نعرض على سيادتكم مجموعة من التقارير التي تؤكد استخدام الأسلحة الكيمياوية لغرض تشكيل لجنة تحقيق حول هذه القضية.

المرافقات :

- نسخة من كتاب مكتب النائب الاول لمجلس النواب .
- نسخة من تقرير الدكتور جوزيف سافاري , والدكتور جان فان آكين سويسرا / ألمانيا .

مكتب النائب
سوران عمر سعيد

مع فائق الشكر والتقدير ...

النائب
سوران عمر سعيد

Mobile:07705425007 E-mail:info@soranomar.krd
www.soranomar.krd



Republic of Iraq
Prime Minister's Office

...ة العـــراق
...س مجلس الوزراء

2221968 / 3
2022/1...

وزارة الخارجية / مكتب الوزير

الموضوع/ إستخدام الأسلحة الكيمياوية في إقليم كردستان العراق

...ورحمة الله وبركاته

...يطأ صورة ضوئية عن كتاب مجلس النواب العراقي / مكتب النائب
...عيد) بالعدد (426/د) في 2022/11/14.

...ل ببيان الرأي بشأن ما ورد فيه حسب الإختصاص وإعلامنا إجراءاتكم .. مع التقدير.

... الكتاب آنفاً.

صلاح حسن عبد الله
ع/ مدير مكتب رئيس مجلس الوزراء
2022/12/2


...مجلس النواب – مكتب الأمين/ إشارة إلى كتاب مكتب النائب آنفاً/ للتفضل بالعلم .. مع التقدير.
...مجلس الوزراء – دائرة المستشار القانوني/ قسم الإستشارات القانونية/ إشارة إلى مذكرتكم الداخلية بالعدد (2202995)
...202/ مع صورة ضوئية عن الأوليات كافة .. مع التقدير.

١٤٧



Raporên belgekirî amaje bi wê yekê kir ku dewleta Tirk di şerê xwe yê li dijî şervanên Partîya Karkerên Kurdistanê (Gerîla) de made û çekên kîmyayî bi kar anîne. Li gor wê jî gelek rêxistinên navdewletî yên têkildar, hejmarek partîyên siyasî, akadîmsîyen, rojnamevan, ramyar, rewşenbîr û kesên pirspor bang kir ku şandeyeke lêpirsînê ji rêxistina qedexekirina çekên kîmyayî kir da ku di van bûyeran de lêpirsînê bikin. Hêjayî gotinê ye ku rêxistina bijîşkên navdewletî bo qedexekirina şerê nûklerî (IPPNW) der barê vê yekê de raporek belav kir. Ev

rapor xwe dispêre erkekê ku di îlona 2022an de bi serenava “Gelo Tirkî peymana qedexekirina çekên kîmyayî bin pê dike?” pê rabûye û balê dikişîne li ser gengazîya ku Tirkîyê bi awayekî derzagonî tiştên kîmyayî li dijî kurdan bi kar aniye. Di nava vê bikaranîna navborî de, bikaranîna gaza Klor heye. Her wiha rapor behsa nimûneyekê jî dike gava wezîrê berevanîyê yê Tikrîyê, Hulûsî Akar, di parlementoya Tirkîyê de roja 13ê sibata 2021ê de mukur tê û dibêje: “Artêşa Tirkîyê di şerê xwe yê li dijî PKKê de gaza rondikrij bi kar aniye”[10]. Jixwe gaza rondikrij tenê ji bo belavkirina tevlîhevîyê, an ku belavkirina xwepêşandanan, tê bikaranîn, lê di heman demê de û li gor peymana çekên kîmyayî (CWC) qedexe ye ku di qada leşkerî de were bikaranîn. Di madeya yekem de û li jêr serenava “Pabendîyên giştî” ya benda 5’em hatiye ku “Her dewletek peymanê dide ku tiştên belavkirina tevlîhevîyê weke amûreke şer bi kar neyîne”. Li gor wê jî Hulûsî Akar behsa şerekî di navbera artêşa Tirk û şervanên PKKê de ku li çiyayê Garê qewimîbû kir û wiha anî zimên: “Li vê herêmê û li pêşîya şkeftekê, gaza rondikrij hat bikaranîn”. Ev daxuyanîya wezîrê berevanîyê, tê wateya mukurhatina bi binpêkirina peymana çekên kîmyayî. Êdî divê ev yek li gorî zagona navdewletî were darizandin; çi ku bikaranîna vê gazê pir bi zelalî xuya dibe ku di qada leşkerî, ne weke amûreke belavkirina tevlîhevîyê hatiye bikaranîn. Li gor wê jî peymana qedexekirina çekên kîmyayî ya sala 1993an bê qeyd û merc, bikaranîna tiştên belavkirina tevlîhevîyê weke amûreke şer, qedexe kiriye (Madeya 1\5).



***Hulûsî Akar bikaranîna hêzên wî bo gaza rondikrij a li pêşîya şkeftê, şîrove dike.***

[10] TV100; Hulusi Akar, Gara’daki operasyonunun ayrıntılarını Meclis’te anlattı; 16.02.2021; Link:
https://www.youtube.com/watch?v=2j-4BiRuubo

Her wiha bijîşk Jêzîla Pêntîker ku endama rêxistina aştîya navdewletî û rêxistina bijîşkên navdewletî bo qedexekirina şerê nûklerî ye, bi komeke pirsporan re serdana Kurdistanê kir, wê jî da xuyakirin û bi gelek rêxistinên cihêreng re hevdîtin pêk anîn û wan jî tekez kir ku Tirkîyê çekên kîmyayî li dijî şervanên kurd bi kar anîne. Her wiha hevserokê berê yê Partîya Gelan a Demokratîk (HDP) ku aniha di zindanên Tirkîyê de girtî ye, li ser rûpela xwe ya Twitterê belav kir û got: "Parlementoya Tirkîyê û rikberî nikarin li pêşberî van wêneyan bêdeng bin, bêdengî tê wateya hevkarîya bi sûc re". Di dawîya axaftina xwe de jî daxwaz kir ku der barê bikaranîna çekên kîmyayî de lêpirsîn were kirin. Her wiha hevserokatîya koma Partîya Gelan a Demokratîk (HDP) a di parlemenoyê de ku bi nûnertîya "Mîral Danîş Beştaş" e û cîgir "Saroxan Oluk" hin zanyarî pêşkêş kirin. Ev zanyarî eşkere dikin ku yekîneyên girêdayî hêzên çekdar ên Tirkîyê di şerê xwe yê li ser xaka herêma Kurdistana Iraqê de, pêkhateyên kîmyayî û şêwazên li dijî pîvanên navdewletî pêk tîne. Di vê babetê de pirseke parlementerî ji wezîrê berevaîyê "Hulûsî Akar" hat kirin ku der barê bikaranîna çekên kîmyayî de zelalkirin çêbibe". Her wiha cîgira Partîya Gelan a Komarî "Sîzîn Tanrîkolu" di nava wan kesên ku doza lêpirsîna van angaştan dikin de bû.

Seroka sendîkaya bijîşkên Tirkîyê (TTB) "Şebnem Koru Fincancî" wiha şîrove kir: "Min dîmen baş venerîn kir, pir zelal dixuye ku gazên jehrî yên ku yekser bandorê li pergala sinirî dikin, hatine bikaranîn." her wiha bal kişand li ser vê yekê: "Bi tevî ku ev gaz qedexe ne jî, lê mixabin va em dibînin ku di şer û pevçûnan de têne bikaranîn"[11] û da diyarkirin ku divê lêpirsîn di vê babetê de were kirin. Lê belê nivîsgeha dozgerê giştî li Enqereyê ew bi propagandaya ji bo rêxistina terorîst û pîskirina eşkere ya ji neteweya Tirk û komara Tirkîyê û sazîyên wê re, tawanbar kir û piştre ew da girtin. Tê zanîn ku wê destek daye pêşxistina lêvegera Neteweyên Yekbûyî ya der barê lêpirsîn û belgekirina dozên êşkencekirinê de (Protokola Istanbûlê). Li gorî wê jî pisporên Neteweyên

[11] MH Haber; Şebnem Korur Fincancı: Sinir sistemini etkileyen kimyasal bir gaz kullanılmış; 20.10.2022; Link:
https://www.youtube.com/watch?v=1gb6FcdN7_A

berztirîn ji van pirsan jî ev e: Gelo dê kengî bang were kirin da ku şandeyeke fermî ji rêxistina qedexekirina çekên kîmyewî ji bo lêpirsîna di van tawanbarîya de were şandin? Çi astengîyên dewletê hene ku rê li ber dewletê digirin ku daxwaza tevlêbûna nava Yekîtîya Ewropayê pêşkêş bike ku çekên kîmyewî bi kar tîne?

Yekbûyî bang li Tikîyê kir ku nema êdî bi behaneyên terorê parêzvanên mafên mirovan bitirsîne. Di tîrmeha sala 2022an de jî, cîgirê rêxistina ewropî -Nûnerê bilind ê Yekîtîya Ewropî yê mafên mirovan- nameyeke ku ji alîyê gelek akadîmîsîyen, rewşenbîr, ramyar û rojnamevanan hatiye îmzekirin, wergirt. Di wê nameyê de bal li ser êrîşên ku Tirkîyê pêk anîne tê kişandin. Di nameyê de hûrgilîyên gelek bobelat û ziyanên ku artêşa tirk pêk anîne, eşkere dikin û tê de bi zelalî nerewbûna van karan diyar dikin. Her wiha bang li Neteweyên Yekbûyî kir ku di van tawanbarîyan de lêpirsîn çêbibe û werin belgekirin û desthilatên xwe yên diplomasî bi kar bînin da ku rê li ber Tirkîyê û êrîşên wê bigirin.

Têkildarî mijarê û di bersivdayîna li ser pirsên[12] hin endamên parlementoya ewropî ku de ku di nava wan de Nîkolay Filamêsin hebû, meclisa ewropî bawerîya xwe ya tam bi bêlaîbûn, şarezabûn û serbixwebûna rêxistina qedexekirina çekên kîmyayî û dilsozîya wê ya teknîkî ya ji bo bicihanîna tedbîrên lêprisîna der barê peymana çekên kîmyayî de anî; ew jî bi hevtemamkirina bi Neteweyên Yekbûyî re.

Her wiha senator û endamê meclisa rûspîyan ê ji partîya komunîst a fransî “Piêr Loran” pirseke nivîskî ya hejmara wê 4197 bi dîroka 8ê çileya 2022an, ji wezareta Ewropa û karûbarên derve re, bi serenava “Bikaranîna Tirkîyê ji çekên kîmyayî re” şand[13] û tê de wiha anî zimên: “Rêzdar Piêr Loran bala wezîrê Ewropa û karûbarên derve dikişîne ser angaştên gelek ên têkildarî bikaranîna artêşa tirk ji çekên kîmyayî re li bakurê Iraqê. Bi rastî jî ev tawanbarî gelekî metirsîdar hatin dîtin ku hişt lêpirsîneke meydanî ji alîyê rêxistina bijîşkên navdewletî bo qedexekirina şerê nûklerî (IPPNW) were kirin û ev lêpirsîn jî li ser erdê rastî astengîyan hat. Ez vê dipirsim gelo we çi niyet e heyanî Fransa bikare têkilîyê bi Neteweyên Yekbûyî re deyne da ku lêpirsîneke navdewletî vebe.”

[12] Ji van pirsan: Dê kengî vexwendina şandina şandeyeke fermî ji Rêxistina Qedexekirina çekên Kîmyayî re ji bo van tewana, were gotûbêjkirin? Çi encam li ser dewletên ku çekên kîmyayaî bi kartînin û dixwazin tevlî Yekîtîya Ewropayê bibin hene?

[13] Nos Senateurs.FR; Pierre Laurent Question écrite N° 4167 au Ministère de l'europe/ Utilisation d'armes chimiques par l'armée turque; Question soumise le 8 décembre 2022; Link: https://www.nossenateurs.fr/question/16/04167

# Daiş û Amadebûna Perçekirinê li Sûrîyê

Rêxistina Daişê nimûneyeke ji wan aloziyên ku derketine di encama têkçûna projeya netewdewletê de ku di destpêka sedsala bîstan de, pêşketibû. Ew netewdewleta ku carinan bi lebîralîzmê re û carinan bi sosyalîzma pêkhatî re Hevbeş bûye, nikarîbû terzekî şaristanî nû ji bo welatên Rojhilata Navîn ava bike. Ji ber ku berê xwe da zordestî, pişaftina çandên din di qalibê îdyolojiya netewa serdest de û çavberdana xakên dewletên din yên derdorê. Ev tişt bi hêsanî xuya dibe dema em li tomargeha mafên mirovan, awayê têkiliyên wan netewdewletan bi hev re û asta kêm ya demokrasî û pêşketinê di wan netewdewletên ereb, tirk, israyil û îran de, temaşe bikin. Ev projeya ku di destpêkê de xwe spartiye têkçûna dewleta thiyoqrat[1] ku di kesayeta sultaniya Osmanî di wê demê de, dihate nimandin û aloziyên ku ji gelên di bin destê xwe de peydakiribûn piştî ku deynên ewropî li ser wê kom bûbûn[2], tevî belavbûna derebegiyê, gendeliya karmendên desthilatê û tengezariya çînên bindest. Heta niha jî piraniya dewletên Rojhilata Navîn ji ber aloziyên van herdu projeyan, bêzar bûne. Her weha aloziyên dijwar di nava welatên herêmê de afirandine[3]. Lê belê aloziyên hîn dijwartir afirandine, piştî hevbeşkirina her du projeyan û derketina Daişê ku qonaxa xwe ya destpêkê vedigere dema hemleya bawermendiyê ya ku sîstema Îraqî ya kevin di salên 90î de û heta hilweşandina wê 2003an de, dabû meşandin. Bi rêya hevbeşkirina hizra netewî ya "Basî" û selefiya cîhadî weke stratejiyekê ji bo rûbirûkirina dijminên xwe; gelên ku êş gihandiye wan, dewletên ewropî ku çavên xwe berdane giringiya cihê wê yê

---

[1] - boçûneke siyasî ye, avabûna dewletê li ser bingehekî olî şirove dike, ango li gorî wan; desthilat ji cem xweda ye û xweda qiralan hildibijêre. Ev tewrî bi tewriya (mafê xwedayî) yan (rêdayîna xwedayî) tê naskirin. Theyoqratî gotineke yewnanî ye ji du peyvan pêk tê; theyo ku tê wateya olî û kratîs bi wateya darêz. Yek ji mezhebên kevine, li cem misriyên kevin hebû. Di nava dewletên ewropî yên xiristiyanî de di sedsalên navîn de belav bû. Bi xwe, rêgeh û boçûnên demoqratîk yên ku avabûna dewletê li ser bingehê hevpeymanên civakî ku rewabûna desthilatê ji gel tê, red dike.

[2] - تركيا التي عرفت: ص138.

[3] - عمر عبد الحكيم؛ الثورة الإسلامية الجهادية في سوريا/ الجزء الأول: التجربة والعبرة (آلام وآمال) الطبعة الأولى/1991م؛ بلا ناشر.

ciyosiyasî û dewletên herêmê yên xwedî îdyolojiyên cûda. Ji ber ku rêxistina Daişê encama van tevliheviyan e; çi siyaset yan tevger yan çalakîyê bike, bi xwe alozî ye û lê vedigere û rewşa wê ya hundirîn aloztir dike. Li ser bingehê tewriya: "cêwaziya di hizir de û pişt re dabaşbûn û bihevketin û jihevcûdabûn û di dawiyê de her yek aliyê din bi kufrê tewanbar bike"  şaxê wê yê li Sûrî ji bo vê gavê amade ye.

Tewriya **"cêwaziya di hizir de û pişt re dabeşbûn û bihevketin û jihevcûdabûn û di dawiyê de her yek aliyê din bi kufrê tewanbar bike"** ji diyardeyên berçav e di dîroka tevgerên Islama siyasî de û bi taybet ji dema kuştina xelîfe Osman Bin Efan[4]. Mîna ku li cem peyçûyên ola mesîhiyê, Ew xwestekên siyasî yên rêber û serkêşan bû sedem ku ew baweriya siyasî ya misilmantiyê bi dehan alî, partî û rêgehan parçe bibe[5]. Îro bi rengekî mecazî navê tevger yan rêxistinên misilmantiya siyasî li wan tê kirin ku îro hejmara wan zêdetir ji sed mezhebî ye û her mezhebek yan rêxistinek îdyolojiya wê heye ku serkêşên wan bisînor û çarçove dikin û angaşt dikin ku ew tenê koma ku ji wendabûnî rizgar bûye. Ji ber nîqaş û gengeşeyên di navbera wan de û har aliyek dixwaze bi behaneyên fiqhî îdyolojiya xwe rast nîşan bide; demagojî[6], derew û tundî bûne navgînên sereke ji bo xapandinê û komkirina alîgiran. Ev bi zelalî di aloziya ramanî, siyasî û ewlehî ku Sûrî û Îraq jiyan dikin de, xuya dibe. Her weha di dabaşbûna tevgera cîhadî ya selefî bi gelek rêxistinan mîna Qayda û Qayîda Cîhadê li Bîladişam û Artêşa Îslamê û Cebhet el Nesre û Hurrasiddîn û Daiş...hwd. Ji bo Daişê ya ku mijara me ye, ew jî weke yên din xelekeke ji vê zincîrê ku ji Qaydê veqetiyaye –û pê re di nav nakokiyan de ye- û şiyana veqetînê di hundirê wê de heye piştî binketina wê li Bagozê sala 2019an. Di dema ku ev rêxistin li ser lingan bû sala 2016an hinek kesên ku jê vediqetiyan digotin ku di hundirê wê de nelihvkirin heye derbarê wan fetweyên tekfîrî yên hinek serkêşên rêxistinê yên ku ramanên şêxê seûdî (Ehmed Bin Emer Elhazimî) yê ku

---

4 - ji bo analîzên berfireh lê vegere: (د. علي الوردي؛ وعّاظ السلاطين؛ الطبعة الثانية ؛ الناشر: دار كوفان/ 1995 لندن /.).

5 Ebdela Ocelan - Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk - Pirtûka Çaremîn - Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk – Çapa Duyem – 2014 – Çapxana Azadî – Werger: Rêşad Sorgul – R46

6 - demagogî: peyveke yewnanî kevin e ji du beşşan pêk tê; (dema) ji dîmos bi wateya gel û (gogy) bi wateya serokatî. Bi hev re tê wateya rêvebirin û qanekirina gel bi siyasetên derew ku xwe disipêre tirsa milet.

her kesên li welatên kufrê kirin karfir(7). Evên ku bi navê "Hazimî"(8) hatin naskirin. Tê gotin ku Ebû Bekirê Bexdadî Hazimî ji nav rêxistinê tesfiye kirin û hinek agahî hene ku yên reviyayî tevlî rêxistina Cundullah ya azerî selefî ya tundrew bûne ku li nêzî çiyayên Laziqiyê li ser sînorê Idlibê cih digire(9). Ev tişt û hin tiştên din ku em ê vebêjin diyar dikin ku rêxistina Daişê li ser "cêwaziya nerîn û pişt re dabaşbûn û pevketin û jihevşeqbûn û pişt re hev bi kufrê tewnbarkirin" vekiriye. Ev teza lêkolînê ya bingehîn e û em ê hewil bidin ku li ser bingehê diyarkirina sedem û nîşanên wê, em ronahiyê bavêjin ser derfeta çêbûna şkandinekê di binyada serokatiyê ya rêxistina Daişê li Sûrî û Îraqê de,.

Ger em li dîroka siyasî ya herêmê vegerin, emê nas bikin çawa rewşa ciyosiyasî bandorê li rakêşana di navbera hêzên serdest li ser xaka Bîladişam û Mezopotamiyayê dike. Di serdema nûjen de ev her du coxrafî di encama hevpeymana Saykis-Bîko de bi navê Sûrî û Eraqê hatin dabaşkirin. Li gorî wê, herêma Bakur û Rojhilatê Sûrî ku beşekî bingehîn ji Mezopotamyayê bû bi ser Sûrî ve hate hesibandin. Dewleta Sûrî jî nikarîbû yan jî nedixwest ku bi Bîladişam re di warê çandî û siyasî de bibe yek û weke mêtingehekê lê meyze kir (mêtingeheke ku bi rêya ferwerekî leşgerî-ewlehî bi rengekî veşartî tê birêvebirin di pişt perdeya saziyên rêveberiya xwecihî de). Hemû dahateyên vê herêmê ji bo geşpêdana beşê xwe yê Bîladişam bikar anîn.

Ji hêla stratejîk ve mirov dikare texmîn bike ku hêza ku herêma Bakur-Rojhilatê Sûrî bike bin kontrola xwe de, wê serdestiya xwe li ser Sûrî û Eraqê misoger bike. Ev tişta ku bi zelalî di stratejiya emerîkî de xuya dike û tişta balkêş ku Daişê jî giringî da vê mijarê. Her weha Îran, Rûs û tirkan bi derengî jî be ev mesele nas kirin.

Di dîrokê de hemû hewildanên qiral, xelîfe, sultan û serokan ji bo çêkirina yekîtiyeke siyasî û domdar di nevbera Bîladişam û Mezopotamiyayê de, bi bin

---

7 - têgeha welatê kufrê li cem DAÎŞê tê wateya hemû herêmên ku ne di bin desthilata wê de ne û her kesê tê de jî li gorî îdyolojiya wan kafir tê hesibandin heta ku misilman be jî.

8 Biner:

د. محمد أبو رمان ومجموعة باحثين؛ ما بعد دولة الخلافة، الأيديولوجيا. الدعاية. التنظيم والجهاد العالمي/ هل سيعود تنظيم داعش من جديد؟؛ الناشر: مؤسسة فريدريش ايبرت- الأردن والعراق/ 2021م. ص56.

9 - فائز الدغيم؛ "جند الله" و"الشيشاني".. دوافع "تحرير الشام" للهجوم على أعداء روسيا التقليديين؛ الناشر: موقع قناة سوريا؛ تاريخ النشر: 2021.10.26م؛

الرابط:

https://www.syria.tv/

ketin ji ber wan sedemên girêdayî taybetiyên çandî, civakî û siyasî yên her herêmekê. Gelek nimûneyên vê jî ji dîroka siyasî ya herêmê hene. Em dikarin mînak bidin dema Ebasiyan bajarê Bexdayê ava kirin û ji xwe re kirin navend ji bo ku xwe ji Emewiyan cûda bikin ku Şam ji xwe re kiribûn navend. Gelek buyer ji dîrokê hene ku vê gotinê piştrast dikin; di serdema me ye nûjen de piştî serketina şoreşa erebî ya mezin li dijî dagirkeriya Osmaniyan, Haşimiyan hewil da ku dewletekê ku ji Mezopotamiya û Bîladişam pêk tê, di bin serweriya xwe de çêkin. Lê bi ser neketin. Tu şîroveyên têr û baş ji sedemên zatî (xwebixwe) yên vê binketinê re nehatin pêşkêşkirin. Tenê balkişandin li ser sedemên ji derve bûn ku ew vedigerandin xwestekên Firansa û Birîtaniya di dagirkirina serxak û binxaka Sûrî û Eraqê de. Ji hîleke din ve partiya Bas a erebî piştî ku desthilat xiste destê xwe de li Şam û Bexdayê, hewil da ku herdu herêman di çarçoveya welatekî de bike yek. Lê belê ew jî bin ket û rewş veguherî dijminatiyeke dijwar di navbera her du herêman de û partiya Bas dabaşî du aliyên dijminê hev li Sûrî û Eraqê, bû, tevî serkeftina demkî ya projeya yekîtiyê di navbera Sûrî û Misrê de. Ji hêleke din ve rêxistina Elqayida bi rêya îdyolojiya dewleta îslamî hewil da ku yekîtiyekê di navbera herdu herêman de sala 2013an de çêke. Ew jî bi rêya yekkirina herdu rêxistinên selefî li Sûrî û Eraqê, Cebhet el Nesre û rêxistina Dewleta Îslamî li Eraqê di bin navê (Dewleta Îsamî li Erraq û Şamê) ku pişt re bi navê Daiş hate naskirin. Lê belê ji destpêkê de rastî têkçûnê hatin dema ku şaxê wê yê Bexdayê ji hêla xwe ve Ebû Bekir Elbexdadî wek xelîfeyê dewletê ragihand. Li hember vê, Cebhet el Nesre nerazîbûn nîşan da û ji vê yekîtiyê xwe vekişand û di baregehên xwe de li Bîladişam xwe parast[10]. Ev dûrketin veguherî dijberiyê di navbera rêxistina dayik (Elqayide) û rêxistina nû de ku giha asta hev bi kufrê tewanbar bikin[11].

Cebhet el Nesre ku gelek ji baregehên xwe ji dest dan li nîv û başûrê welêt û vekişiya bakur û rojavayê Sûrî ji ber lihevhatinekê di navbera çargoşeya Sûçî û Asitana; Tirkiya, Rûsiya, Îran û rêjîma Sûrî de û nikarîbû pirsgirêkên xwe bi Ceyşil Islam ê selefî re ku li herêma Xûtayê (AL Ellûş) serkêşiya wê dikin, çareser bike.

10 -الله ثم للتاريخ... شهادة د. حذيفة عبد الله عزام على حوادث جبهة النصرة وجند الأقصى، الناشر: مؤسسة على بصيرة؛ بلا رقم طبعة وتاريخ؛ 28 ص.

11 - ji bo agahiyên derbarê destpêka nakokiyên di navbera rêxistina Elqayida û şaxê wê yê Eraqê li vê vegere:
Stanford University/ A program of the Center for International Security and Cooperation (CISAC); The Islamic State; Link:
https://cisac.fsi.stanford.edu/mappingmilitants/profiles/islamic-state

Hewil da ku di cihê xwe yê nû de siyaseteke berevanî û bragmatî bimeşîne ku bi dewletên rojava re agirbestê bike û bi Tirkî re hevpeymanê çêke û xwe ji rêxistina Elqayide di Tîrmeha 2016an de, dûr kir û navê xwe guherî (Heyet Tehrîr el Şam) û rêxistina (Hurrasidîn) ya ku jê şeq bû, bû şaxê Qaydê li Sûrî. Herêma Bakur û Rojavayê Sûrî bû herêmeke tije rêxistinên selefî yên dijber.

Şaxê Elqaydê li Eraqê agahîyên li ser wê kêm in. lê belê piraniya serokên Daişê li Eraqê li bakur-rojavayê Sûrî niştecih dibin. Ev yek nîşan dide ku coxrafiya sunnî ya Eraqî jîngeheke ewlehî sist û ne guncaw e ji bo wan û geşbûna rêxistina Elqaydê li wir nişan dide.

Ritma bi lez a jihevcûdabûnê di hundirê tevgera selefî ya cîhadî li Sûrî û Eraqê bi awayekî zelal tê xuyakirin(12). Ev me vedigerîne teza destpêkê, ango têkçûna hewildanên çêkirina yekîtiyeke siyasî domdar û xweber di navbera Bîladişam û Mezopotamiya di çarçoveya welatekî de –û diyar e ku wê tucarî pêk neyê ji bilî bi awayê konfedraliya demoqratîk- ev tişta ku dibetiya destpêkirina veqetandinekê di hundirê rêxistinê de di navbera kadroyên wê yên li Sûrî û Eraqê û dibe ku rêxistineke Sûrî û yeke Eraqî derkevin hole, bi taybet ku li her herêmekê binyadeke jor û jêr heye ku bi awayekî yekser ne girêdayî serokatiya navendî ya rêxistinê ne.

Gelek nerîn derbarê sedemên jihevcûdabûnê di nava rêxistina Daişê de hene, lê giringiya vê lêkolînê ew e ku bi xwesipartina hinek karîger û agahiyan ji jêderên vekirî û hevdîtinên ku bi andamên rêxistinê re di sala 2019an de çêbûne; ronahiyê davêje ser dibetiya û şiyana pêşdeçûna xweseriya şaxê sûrî yê rêxistina Daişê ku niha bin navê (mekteb elerd elmubareke)(13) tê birêvebirin û karê wîlayeta Şamê dimeşîne, ji şaxê eraqî ê ku di bin navê (mekteb bîladirafîdên)(14) ê ku karê wîlayeta Eraqê dimeşîne.

12 -د. محمد أبو رمان ومجموعة باحثين؛ ما بعد دولة الخلافة، الأيديولوجيا. الدعاية. التنظيم والجهاد العالمي/ هل سيعود تنظيم داعش من جديد؟ الناشر: مؤسسة فريدريش ايبرت- الأردن والعراق. ص49

13 - مجلس الأمن؛ التقرير الثاني والثلاثون المقدم من فريق الدعم التحليلي ورصد الجزاءات عملاً بالقرار 2610 (2021) بشأن تنظيم الدولة الإسلامية في العراق والشام (داعش) وتنظيم القاعدة وما يرتبط بهما من أفراد وكيانات؛ S/2023/549؛ 25 July 2023؛ ص15.

14 - ji bo hêsankirina rêvebirina çalakiyên şer û rêxistinî DAÎŞ komekmekteb (nivîsgeh) avakirin weke rêvebirên herêmî berpirsiyariya wîlayetan dikin. Ev nivîsgeh jî girêdayî ne bi rêvebriya wîlayetan a dûr a ku bi navê rêveberiya giştî ya wîlayetan tê naskirin. Ev nivîsgeh jî ev in: **mekteb wîlayet elşam** yan mekteb elerd elmubareke serperiştiya kerê gelek nivîsgehên din dike û herêmên Şam, Lubnan û dewletên derdora wan birêve dibe. Û **mekteb Elsedîq** serperiştiya karê

Lêkolîn wê rêbaza şayesandin û analîzeyê bingeh bigire ji bo xwegihandina encamên ku teza lêkolînê piştrast dikin û pêşeroja vê rêxistinê pêşbîn bikin. Tewerên lêkolînê wê bi awayekî birêkûpêk û avakirî xwe spêrin şayesandina rewşa nû ya rêxistinê ji hêla çalakî û binyada rêxistinî û ayîna ewleh veî lê kêleka tekezkirina li ser bûyerên ewlehî yên ku bi pîlan û kompleyên wê ve girêdayî ne û bi awayekî ku ji tewerê duyem re rê veke. Di tewerê duyem de wê gelek delîl û nîşanên rewşa dabaşbûna hundir bên şirovekirin û sazûmankirin. Û karîgerên ku şiyana dabaşbûnê xurt dikin. Ew jî bi xwesipartina hinek çavdêr û nerînên pê ve girêdayî. Li ser vî bingehî wê tewera sêyem li ser du beşan were sazkirin; ê yekem wê şêwazê pêşwazîkirina rêxistinê ji aloziya xwe re bi rêya siyasetên muhtemel ji bo pêkanîna lihevhatina hundirîn. Beşê duyem wê şêwazê pêşwazîkirina sazî û civakên xwecihî ji rêxistinê re weke alozîyekê û weke jêdera aloziyên herêmê bi rêya siyasetên bergirî yên xwecihî bigire dest. Di dawiya lêkolînê de wê puxteya lêkolînê û hinek encam û pêşniyar werin pêşkêşkirin.

**Rewşa meydanî ya rêxistina Daişê, nerîneke giştî**

Rêxistina Daişê di destpêka derketina xwe de ji aloziya siyasî û aborî û perçebûna etnîkî ya ku li Sûrî û Eraqê pêş ketibû, sûd girt. Tişta ku hişt bêtir bihêz bibe ku di civakan de xweparastina cewherî nebû, piştî ku sîstemên dewletî di dev civakan berdan. Ew sîstemên ku ew civak ji hemû navgînên berevanî û xweparastinê bêpar hiştibûn, ji bo ku desthilata xwe li ser civakan bisepînin. Her weha bi tundrewî û asêgirtina têgehên tundiyê û neqebûlkirina pexişînê di fetweyên olî de û heta asta hovîtiyê pêkanîna wan fetweyan.

Rêxistina Daişê weke hêzeke dagirker têkiliya xwe bi civakan re danî. Hastên dijminatiyê û hovîtiyê di nav endamên xwe de pêş xistin bi rêya fetweyên tekfîrkirina(15) kesên ji derveyî hizira wan. Destdirêjiyên bêbext û komkujiyên mezin kirin. Li pêşiya kamîreyan bi awayên curbecur kuştin kirin, bi rengekî tersî

Efganistan, Bakistan, Hindistan, Îran û Tacîkistanê dike. **mekteb Elfurqan** li Nîcîrya ye û serperiştiya herêma beravê û gola Tişad û Nîcer û Tişad û Kamîron dike. **mekteb Elfarûq** serperiştiya Tirkî dike. Nivîsgeha wîlayeta Eraqê (**mekteb Bîladirafîdên**) ku serperiştiya Eraqê dike.

15 - têgeheke taybet ji tekfîrê pêş xist mîna: kesê ku wî kafirê ku rêxistinê ew bi kufrê tewanbar kiriye, kafir neke, ew jî kafir e. bi vî awayî wan rêxistinên cîhadî yên din jî bi kufrê tewanbar dike di nav de jî rêxistina Elqayde û kesê di welatên kufrê de jî kafir dibîne, û kesê nezan kafir dike û kesê ku sere kafiran neke jî kafir e li gorî wan. Her weha her kesê ku karê demoqrasiyê dike kafir e û kesê bi wan re rune kafir e û kesê xelîfeyen qebûl neke jî kafir e…

hemû îdiyayên exlaqî yên misilmanan di şer de. Lê belê li Sûrî û Eraqê derbeyên giran xwarin ji hêla hêzên xwecihî bi piştgiriya hevpeymana navnetewî ya li dijî terorê û di meydanê de ji holê rabû dema di parasgeha xwe ya dawî de li Bagozê sala 2019an de bibin ket. Tevî hewildanên wê ku êrîşên pilankirî li ser navendên ewlehiyê li Sûrî û Eraqê pêk bîne û li ser enternetê (xîlafeta iftîrazî)[16] ava kir û bi rêya çalakiyên xwe yên meydanî dixwest ku jîngeheke guncaw ava bike ku karibe hêza xwe kom bike û ji nû ve dest pê bike, lê ew hewldanên wê têk çûn. Gelek serkêşên wê yan hatin kuştin, yan jî derbe xwarin yan jî hatin girtin.

Di sala 2023an de ritma çalakiyên şaneyên wê yên veşartî dakete asta herî jêr[17] û insîyatîfa êrîşkirinê ji dest derket, tişta ku stratejiya (şerê nîkaya û temkînê)[18] ku piştî binketina xwe ragihandibû û nikarîbû endamên xwe yên dîlgirtî vegerîne û bû sedema kuştina bi dehan ji wan di êrîşa li ser zindana Xiwêranê li Hesekê di sala 2022an de, her weha hewildanên wê ji bo desteserkirina kampa Holê bin ketin. Heta hevalbendên wê li ser asta cîhanê jî nema karîbûn êrîşên terorî pêk bînin û niha rojane li Sûrî û Eraqê şaneyên wê tên girtin û tesfiyekirin. Xuyaye ew balkêşiya ji bo tevlîkirinê paş ketiye, piştî ku civakên xwecihî ew derbas kirin û berê xwe dane geşpêdana aborî û xweparastina ji şer û êrîşên îdyolojî yên bêwate, mîna rêxistina ku (Brahîm el Hefil) li rojhilatê Dêrezorê di destpêka meha Êlûnê de sala 2023an bi rengekî basî-tundrew li herêmên Zubyan, Besîre, Şihêl, Hewayic û Teyane ku weke herêmên tevgera Daişê tên hesibandin ava kiribû û daxwaz dikir ku mîrnişînekê ji komekê ji eşîra xwe re ava bike û bang li hevpeymana nevnetewî kir ku li

16 -د. محمد أبو رمان ومجموعة باحثين؛ ما بعد دولة الخلافة، الأيديولوجيا. الدعاية. التنظيم والجهاد العالمي/ هل سيعود تنظيم داعش من جديد؟؛ الناشر: مؤسسة فريدريش ايبرت- الأردن والعراق/2021م

17 - raporek ku ji hêla (tîma pipştgerî û analîze û şopandina darizandinî ya girêdayî Neteweyên Yekbûyî) şîroveyeke din ji vê mijarê re dide weha dibêje: di nerîna gelek dewletên endam de ev kêmbûna di şalakiyên vê komê de tiştekî li ser hatiye ferzkirin û di heman demê de jî bi zanebûne; vê komê stratejiyên xwe adebte kirin û bi baldarî tev digere û şerên bi bedelên herî kêm hildibijêre û di heman demê de xwe ji nû ve ava dike û xwe di kamoan de û di civakên xwecihî yên lawaz de birêxistin dike…

18 - şerê nîkaye: armanca wî derbe li dijmin bixin û wî enger bikin û girtiyên xwe rizgar bikin, heta ku serkeftê bi dest nexin jî. Şerê Temkîn: misogerkirina vegirtina desthilata xwe li ser herêma armanckirî bi şer… ji bo agahiyên berfireh li vê vegere:
أبو محمد عاصم بن محمد بن طاهر البرقاوي؛ وقفات مع ثمرات الجهاد؛ الناشر: المكتبة الشاملة الذهبية؛ بلا رقم طبعة وتاريخ.
يمكن الاطلاع على صفحات الكتاب المتعلقة بهذا الموضوع على موقع جامع الكتب الإسلامية على الرابط:
https://ketabonline.com/ar/books/28048/read?part=14&page=41&index=482604

hember QSDê alîkariya wî bikin[19]. Di heman demê de birayê wî Miseb el Hefil ji Dewhayê giha balafirgeha Hewlêrê. Ev serdan weke hewildanekê ji bo hevrêziyê bi istixbaratên "tirkî" û "Parastin"[20] û "istixbaratên Qeterî" re[21] çêkin ji bo wê toşa Ibrahîm el Hefil bi ser bixin û zextê li hevpeymanê bikin di vê mijarê de. Lê belê bersiva hevpeymanê berdewamiya piştgiriya QSDê weke hevalbendekî li ser erdê ji bo şerê li hember Daişê kir. Ji bo pêzanînê Ibrahîm el Hefil yek ji wan kesên ku piştgiriya xwe ji Daişê re ragihandibûn dema dagirkirina wê ji derdorê Dêrezorê re û piştî binketina wê îdiya kir ku xwe jê daye paş.



***Ibrahîm Elhifil dema ku tevlîbûna xwe (mûbaye) li gel çeteyên Daişê radigihîne[22].***

19 - الشيخ إبراهيم الهفل شيخ عشيرة العگيدات يطالب التحالف الدولي بتشكيل مجلس قيادة عسكرية؛ م EuphratesPost فرات بوست الرابط: https://www.youtube.com/watch?v=YXiuADzJMmg؛ تاريخ النشر: 2023.08.31

20 - dengekî tomarkirî yê Brahîm Biro ku yek ji rêveberên encumena niştimanî kurdî di hefteya dawî ji meha Êlûnê/2023 de derket derbarê helwesta neyînî ya serokê hikûmeta herêma Başûrê Kurdistanê Mesrûr Barzanî ji QSDê û daxwaz kir ji encumenê ku di aloziya Dêrezorê de rol bilîzin û QSDê bi rengekî bidin xuyakirin ku pêkhateyên herêmê tamsîl nake. Li ser vê girêkokê hûn dikarin lê guhdar bikin: https://www.facebook.com/watch/?v=1013265563339707

21 - ji bo naskirina têkiliyên tirkî û qeterî di piştgiriya rêxistinên îslama siyasî ya sunnî de, lê binere:
Hay Eytan Cohen Yanarocak & Dr. Jonathan Spyer الدولة العميقة في تركيا: الذئاب الرمادية والجيش الوطني السوري؛ ترجمة ونشر: آسو للدراسات؛ بلا تاريخ ورقم طبعةص:14.

22 - https://encryptedtbn0.gstatic.com/images?q=tbn:ANd9GcTN3DnZLniNmuZBgifO0UTObuZflXytRju_MTzjdkJYeqfPxty7Mcc3YJZ1VCjY9DWODU0&usqp=CAU

Di vê salê de hêzên emerîkî û bi alîkariya istixbaratî ya QSDê yek ji berpirsên operasyonên derve yên Daişê bi navê (Ebdilhadî Mehmûd el Hac), li derdora Cerabulsê ku di bin dagirkeriya tirkî de bû, kuşt. Ew kesê ku bi pîlankirina êrîşan li Rojhilata Navîn û Ewropayê hatiye sûcdarkirin di nav de revandina berpirsên biyanî. Di heman demê de nûçe ji herêmên dagirkirî hatin derbarê kuştina berpirsê giştî yê ewlehiyê yê wîlayeta Şamê û cîgirê yekem ê waliyê Şamê Ibrahîm el Mein (Ibrahîm Şêx Mûsa) di encama heman operasyona emerîkî li gundê Siwêda yê girêdayê devera Xendûra li derdora Cerabulsê. Tê gotin ku ev herêm di bin kontrola (Siqûr el Şam) de ye ku sûrî ne û bi ser artêşa tirkî ve ne û tê gumankirin ku serokên Daişê li ba xwe dihewînin.

Di meha Êlûnê sala 2023an de hêzên hevpeymana navnetewî berpirsê operasyonan li cem Daişê (Ebû Xelîl el Fedanî) li gundê Um Celûd li derdora Serê Kaniyê hate girtin. Her weha du kesên din berpirsên li nivîsgeha (Erdilmubareke-şaxê sûrî ji Daişê) hatin girtin û radestî QSDê bûn li gorî agahiyên navenda wê ya nûçeyan[23].

Ji hêleke din ve artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê ji aliyekî ve û rejîma Sûrî û hevalbendên wê ji hêleke din ve her di astengkirina karê QSDê ê berxwedana li hember destdirêjiyên Daişê de, berdewm in. Li kampa Holê beşê biyaniyên jin di îdyolojiya xwe ya tundrew a ku rêxistinê di mejiyê wan de çandiye, bi rijd e. Hîn bi derewên jinûve avakirina dewleta rêxistinê bawer dikin. Li gorî raporên ji kampa Holê, gêncan bi zorê bi jinên biyanî re dizewicînin bi behaneya anîna zarokan ji bo berdewama hizra rêxistinê. Her weha hewildanên reva ji kampê berdewam in, hêzên parastina kampê jî di karê xwe de berdewam in. Di heman demê de kesên eraqî yên ku daxwaz dikin, wan dibin kampên bi ewle li parêzgeha Nînewa ya eraqî. Şaneyên rêxistinê tunelên binerd di navbera beşên kampê de û navbera kampê û derve de, dikolin[24]. Her weha peydakirina cihên ji bo veşartin û derxistina sîlehên qaçax û alavên xeberdanê bi hev re bi riya tunelan yan bi riya sîxur û ajanên xwe, li gorî raporên ewlehiyê ku ji hêla hêzên

[23] SDF PRESS CENTER-؛ قواتنا تتسلم الإرهابي "الفدعاني" للتحقيق معه بعد القبض عليه؛ تاريخ النشر: 2023.09.27م؛ الرابط:
https://sdf-press.com/?p=40780

[24] - الحدث AlHadath؛ "الحدث" weşaneke taybet.. "دويلة داعش" داخل سوريا؛ 2023.03.01م تاريخ النشر: الرابط: https://youtu.be/HjFAudGwM4c?t=297

asayîşê û hêzên parastina kampê piştî operasyonên di hundirê kampê de, derdikevin.

Hinek rapor derketin lê ne tekez bûn ku Ebû Hefs el Qureşî bûye serokê rêxistinê piştî kuştina serokê kevin li Cindêrisê di meha Nîsana borî de.

| | |
|---|---|
| *Li gorî kenala (Reşkirina Ebad Elbexdadî û Elhaşimî): Ebû Hefsê Qureşî mîrê nû yê Daişê ye piştî kuştina Ebûlhisên el Qureşî el Haşimî li Cindêrisê Nîsana 2023. Her weha li gorî vê kenalê Ebû Hefs ew bi xwe Ebulmusenna el Cenûbî ye û bi xwe jî Ebû Xedîca el Eraqî ye. Navê wî yê rastî (Ebdelle Mekî Mislih el Rifê'î) ye. Bi kujerê ewlehî yê Sincarê tê pesindan. Yek ji berpirsên komkujiyên êzdiyan e. endezyarekî bombekirinê ye. Li gorî raporeke navnetewî serperiştiya herêma Eraqî-Sûrî dikr li kêleka nivîsgeha (Bîladirafîdên) û di nav Daişê de Rifê'î roleke mezintir di nav Daişê de lîst.* |  |

Rêxistina Daişê veguhertina Idlibê weke parastgehekê ji bo selefiyan û kêmbûna hêza birayên misilmanan tê de li gorî xwe bikar aniye, her weha zêdebûna hejmara niştecihên bajêr nêzî 3 milyon kes piştî pêla koçberiyê ji hundirê Sûrî. Ev herêm deriyekî bi ewle ye bi Tirkî re li gorî hin raporên navnetewî[25]. Di dema niha de gelek serokên rêxistinê û endamên wê, herêmên di bin dagirkeriya Tirkî de û çolistana Sûrî ya di bin kontrola hêzên Sûrî û hevalbenda wê Îran de weke herêmên ewle ji bo xwe dibînin ku ji wan herêman dest bi çalakiyên xwe bikin û êrîşên xwe dest pê bikin ku xuyaye di asta yekê de herêma Bakur û rojhilatê Sûrî hedef digirin.

25 - التقرير الخامس والعشرون لفريق الدعم التحليلي ورصد الجزاءات المقدم عملا بالقرار 2368 (2017) بشأن تنظيم الدولة الإسلامية في العراق والشام (داعش) وتنظيم القاعدة وما يرتبط بهما من أفراد وكيانات؛ S/2020/53؛ 20 January 2020؛ ص20.
التقرير السابع والعشرون لفريق الدعم التحليلي ورصد الجزاءات المقدم عملا بالقرار 2368 (2017) بشأن تنظيم الدولة الإسلامية في العراق والشام (داعش) وتنظيم القاعدة وما يرتبط بهما من أفراد وكيانات؛ S/2021/68؛ 3 February 2021؛ ص7.



5- Ebû Sara Eliraqî: Di 24. 2. 2023 li ser rêya (Qah-Dêrhesan) ya gundewarê Idlibê ya nêz

4- Ebû Elhesen Elhaşimî Elqureşî: Di 30. 4. 2022 li bajarokê Cindêrisê ya Efrîna dagirkirî

3- Ebû Elhesen Elhaşimî Elqureşî: Di 16. 10. 2022 li bajarokê Casimê ya gundewarê bakurê rojavayê Derayê hate

2- Ebû Ibrahîm Elhaşimî Elqureşî: Di 27. 2. 2022 li gundê Etmayê ya gundewarê bakurê

1- Ebû Bekir Elbexdadî: Di 27. 10 2019 li gundê Barîşa ya gundewarê bakurê Idlibê hate

Tê xuyakirin ku li ser nêzî heman hêla paneyî hatine kuştin (Barîşa – Etma – Qah - Cindêris ) ku nêzî sînorên Tirkîyê ne. jixwe ew jî devereke çiyayî ye û di bin destê Desteya Tehrîrûşam (Cebhetûnusra) de ye ku ji hêla artêşa Tirk a dagirker ve tê parastin, jixwe komikên bi ser Qaîdê de hene.




Baweriyeke heye ku Ebû Elhesen Elhaşimî hema Ebû Sara Ekiraqî ye (Elî Casim Selman Elcibûrî). Rapora koma Pişrgirîya Dahûrandinî û Çavdêrîya Sazîkirîyan ya Navneteweyî ku "serkêşê veşartî yê Rêxistinê ye û bandorê li stratîcîya wî dike ku bi rola erkdarkirina endaman radibû weke serkêşên berê yên Daişê, pêngavên derve û karûbarên peredanê bi rêve dibir" û rêvebirê şaxên Daişê yên derve, berpirsê nivîsgeha wîlayatên dûr a Rêxistinê û berpirsê şaxên Rêxistinê li dewletên cîhanê ku hevrazê di navbera wan û fermandarîya giştî bû:


Li Eraqê pirraniya çalakiyên wê di kevana ku ji Enbarê digihêje herêma çiyayî

ku li ser sînorê di navbera herêma Kurdistanê û hikûmeta Eraqî de, sînordar bûye û xuyaye ku desteka civaka sunnî ya Eraqî wenda kir bi sedema zextên rêxistina Elqayde û Heşdilşabî û bobelatên ku bi serê civaka sunnî ya eraqî aniye.

Bi gelemperî û li gorî daneyên meydanî li Sûrî; endam û serokên Daişê li kevana ji derdora Bakurê Idlibê û Çiyayê Bişrî li Başûr-rojhilatê Reqayê û herêma çolistanê û çiyayên di navbera Suxne û Tedmurê de û heta digihêje Dere'a, ev herêma ku bi çiya, qelaç, newal û şikeftên xwe tê naskirin û tê de bablîsokên tozê ku dîtinê asteng dikin û dewsên lingan dihilînin, hene. Ji bilî wan tunelên ku wan bi xwe çêkirine. Ev herêmeke nimûneyî ye ji bo bicihbûna rêxistinê û rûbera wê yek ji sisiyan ji rûbera Sûrî ye.

li Eraqê rêxistin li herêma ji çolistana Enbarê, Selahiddîn û Bakurê Bexdayê, Diyala, Kerkûk û Başûrê Mûsilê û bi taybet çiyayê Hemrîn li Başûrê Kerkûkê û Başûr-rojhilatê Diyala, tevger dike. Hinek dibînin ku piraniya serok û rêberên rêxistinê li Eraqê li vê herêmê ne[26] ku tê de çiya û newal û baxçe hene, bicih dibin.

Mesafeya herî kin di navbera herdu aliyan de dibe weke korîdorekê ji bo çûnûhatina serok û endamên rêxistinê di navbera Sûrî û Eraqê de. Li gorî vê yekê em dikarin bêjin ku herêma di navbera Hesekê û Dêazorê de ji aliyê Sûrî û herêma Başûr-rojavayê Mûsilê de û herêma di navbera çolistana Sûrî ji aliyê Rojhilat-başûrê Çiyayên Tedmurê û Rojavayê Enbarê -bakur û başûr- du rêçên kurt û nêzîk in ku dikarin di wan re ji Sûrî herin Eraqê yan wekî din. Her weha dibe ku çûnûhatin bi rêya tunelan di rêça başûr ve çêdibe û rêça herî zêde hildibijêrin ji ber ku ya herî bi ewle ye.




*Nexşeyek cihên tevgera şeneyên Daişê li Sûrî û Eraqê û rêçikên muhtemel*

**Nîşanên rewşa veqetandinê di hundirê rêxistinê de.**

Ji ber dûrbûna mesafeyê û zexta ewlehî, rêxistinê nema karîbû rasterast serkêşiya şaxên xwe li gelek welatan bike. Vê yekê bêtir derfet da wan şaxan ku bi serê xwe pîlanan çêkin û pêk bînin. Û ji ber lawaziya çavdêriyê ji hêla serok û

26 - مجلس الأمن؛ التقرير الثاني والثلاثون المقدم من فريق الدعم التحليلي ورصد الجزاءات عملاً بالقرار 2610(2021) بشأن تنظيم الدولة الإسلامية في العراق والشام (داعش) وتنظيم القاعدة وما يرتبط بهما من أفراد وكيانات؛S/2023/549 ؛ July 25 2023؛ ص14.

serkêşên rêxistinê wê feqeyên nûhatî derfeteke bêtir ji bo nîqaşên fiqhî û îdyolojî bi dest bixin. Ev nîqaşên ku bibin sedema derketina nerînên cêwaz derbarê sedema binketinên rêxistinê ji hêla leşgerî, rêveberî, aborî û siyasî ve. Ev tişta ku wê bibe gava yekê ber bi dabaşbûnê ve.

Rewşa rêxistinê li Sûrî û Eraqê: piştî rizgarkirina herêma Rojhilatê Feratê ji destê rêxistinê, dûrbûnek di navbera herdu şaxên rêxistinê de çêbû; Hêzên QSDê û Hêzên Hevpeymana navnetewî li pêşiya gihandina wan asteng in. Hemdemî vê jî rêxistin li eniya Rojava li Sûrî û eniya Rojhilat li Eraqê pêrgî zextê ji hêla rêxistina Elqayde û rêxistinên selefî yên din tê. Ev dihêle ku nivîsgeha (Erdilmubareke) ango şaxê rêxistinê li Sûrî bi awayekî serbixwe tev bigere. Heman tişt ji bo (nivîsgeha Bîladirrafîdên) şaxê rêxistinê li Eraqê jî derbasdar e. Raporên tîma (piştgirî, analyze û şopandina darêzan) a girêdayî Neteweyên Yekbûyî tekez dikin ku dabaşbûnek yan dualîbûneke rêveberiyê û xweseriya operasyonan li Sûrî û Eraqê heye. Ev dibe mîna ku du rêxistin di bin sîwana rêxistinê de kar dikin, hene. Xuyaye ev xwesteka serkêş û rêberên rêxistinê ku li xaknîgariya Sûrî bimînin nîşan dide ku naxwazin rêveberiya (nivîsgeha El Erdilmubareke) bi serê xwe operasyonan pîlan û birêxistin bike, tişta ku wê xweseriya wê li ser erdê bisepîne. Û her nakokiyeke ramyarî yan rêxistinî, wê bibe sedema cûdabûnê û cihêbûnê û bi taybet paşxaneyeke cîhadî li Bîladişam ji bandora koma Ixwanilmuslîmîn heye[27].

Bi gelemperî komek ji nîşan û daneyan heye ku vê rewşa dabaşbûnê di hundirê rêxistinê de tekez dikin û heye ku bibe karîgereke nakokiyê û cihêbûnê di dema nêzîk de. Ji van daneyan:

1- Hewildanên berê ji bo serhildanê[28] li hember Ebû Bekir Elbexdadî ji hêla serkêşên olperest û alîgirên Ebû Cafer Elhetab endamê komîteya zagonî (şepêla Hzimî) û Ebû Mihemed Elfurqan ve. Her du kesên ku hatine tesfiyekirin. Her weha cihêbûna Colanî ji destpêka xwe ve.
2- Rêxistinê nikarîbû nasnameyeke niştimanî ji dewleta xwe re ava bike. Ev di dema paşketina wê de li hember Hêzên Sûrya Demokratîk xuya bû, dema eşîrên Sûrî alîkariya wê nekirin tevî ku piştgiriya xwe jê re bi dare zorê ragihandibûn. Ji hêleke din ve ew herêmên cihê tevger û çalakiya rêxistinê

27- عمر عبد الحكيم؛ الثورة الإسلامية الجهادية في سوريا/ الجزء الأول: التجربة والعبرة (آلام وآمال)؛ الطبعة الأولى/1991م؛ بلا ناشر. ص32-72.

28 -د. محمد أبو رمان ومجموعة باحثين؛ ما بعد دولة الخلافة، الأيديولوجيا. الدعاية. التنظيم والجهاد العالمي/ هل سيعود تنظيم داعش من جديد؟؛ الناشر: مؤسسة فريدريش ايبرت- الأردن والعراق/ 2021م. ص58.

herêmên eşîran e û meyla endaman di asta yekê de bi ser serokên eşîra wan ve ye û li pey wan diçin. Bi ser de jî rêxistinê nikarîbû xwe têxe dewsa eşîrê de piştî ku zarokên herêmê işkence kirin û kuştin. Ji ber ku di Rojhilata Navîn de mesela eşîrtiyê, hesta etnîkî û netewî pir cihê xwe girtine ji destpêka dîrokê de û heta niha. Her çiqas şaristanî û dewletî pêş dikeve, ev hest jî bipêş dikeve û gur dibe.[29]

3- Di navlêkirina rêxistinê de (Dewleta Misilman li Eraq û Şamê) em dibînin ku navê Eraqê li pêşiya navê Şamê ye. Ev dide xuyakirin ku giringî ji Eraqê re ye û piştre Şam. Bi zelalî xuya dibe dema ku nahêlin endamên ji Sûrî bibin xelîfe di rêxistinê de[30] tevî wê em nas bikin ku Ebû Umer Elbexdadî û Ebû Bekir Elbexdadî berî wê endamên urdunî ji rêveberiya rêxistina destpêkê (Dewleta Eraqê ya Islamî) dûr xistibûn piştî kuştine Ebû Miseb Elzerqawî sala 2006an. Piştî ragihandina avakirina Daişê, nûçeyên derbarê serokên urdunî de gekekî kêm in. ji hêleke din ve buyera kuştina rêberê rêxistinê Ebulhesen Elqureşî ji hêla hinek komên cîhadî yên dijberî rejîma Sûrî li bajarokê Casim li Dereayê ku qadeke hevbeş e di navbera sûrî û Urdunê de, dide xuyakirin ku Başûrê Sûrî ne cihekî bi ewle ye ji bo serok û rêberên rêxistinê. Berevajî herêma Idlibê ku di bin destê cîhadiyên tekfîrî de ye ji netewa tirkî (îgor, Turkmen û tirk)[31][32] û koçberên sûrî yên selefî pêk tê.

4- Di hevdîtinekê de bi hinek endamên rêxistinê yên biyanî re, gotin ku serokên rêxistinê eraqî bûn û endamên ji Sûrî davêtin eniyên şer ên li pêş. Her weha gelek gazin û gilî ji serokatiya rêxistinê re hatin şandin lê bê encam man. Di vîdyokê de ku hêzên QSDê ji serokekî Daişê yê eraqî ku hatiye kuştin, bi dest xistibû[33] tê xuyakirin çawa endamên wî yên ji Sûrî reviyan û ew birîndar

---

[29] Ebdela Ocelan - Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk - Pirtûka Çaremîn - Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk – Çapa Duyem – 2014 – Çapxana Azadî – Werger: Rêşad Sorgul – R46

[30]- صباح كنجي؛ دور حزب البعث في الإرهاب الداعشي؛ الناشر: الحوار المتمدن؛ تاريخ النشر: 2019.03.16م؛ الرابط: https://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=631257

[31] -tunrewên Turkmen di mîlîşya Sultan Murad, Silêman Şah, Elfatih û Melikşah de xwe bi rêxistin dikin û pianiya wan hemwelatiyên Sûrî ne. Û îgor di partiya Islamî Turkistanî de xwe birêxistin dikin. Tekfîriyên tirk di koma (Gurên renadî) jê re dibêjin (tevgera ciwanên îdyalîst) jî xwe bi rêxistin dikin. Rêxistineke tundrew û olî ye girêdayî partiya Tevgera netewî ya Tirkî ye.

[32]- ji agahiyên berfireh derbarê piştgiriya Tirkî ji van rêxistinên tundrew re lê vegere:
Chloé Jamet ; The impact of ISIS on Muslim countries' intelligence services; the Kuwait Program at Sciences Po/2021; Page 20.

[33] - SDF PRESS CENTER: Vîdyoyeke ji kamîreyên Daişê ku tirsa di nava wan de diyar dike – Dîroka belavkirinê: 2020.09.2 – Malper: https://www.youtube.com/watch?v=HD30l942dg0

hiştin li bajarokê Hecîn. Ev gelek wateyên wê hene derbarê têkiliya di navbera endamên Sûrî û serokên wan ên eraqî de.

5- Gelek endamên wan ên ji Sûrî dev jê berdan û karê xwe sekinandin dema eşîran bi QSDê re li hev kir ku wan efû bike. Her weha bi rêya rastkirina rewşa wan yan ewlehî bi rejîma Sûrî re hineke din jî vegeriya nava refên Elnusre û Elqayde. Hinek jî bûn çeteyên artêşa tirk a dagirker.

6- Pîlangeriyên li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrî didin diyarkirin ku hevrêziyeke kûr di navbera şaneyên wê yên Sûrî û istixbaratên tirk û Sûrî de heye. Bi taybet dema êrîşa li ser zindana Sînaea li Taxa Xiwêran û tevliheviyên li Rojhilatê Dêrazorê. Ev hevrêzî ji hêla şaxê eraqî ve nayê qebûlkirin, ji ber dijminatiya wan a îdyolojî bi rejîma Sûrî re[34] ku vedigere nakokiyên di navbera herdu şaxên partiya Bas de, ji ber gelek endamên Bas yên xwedî bandor di destpêka avakirina wê de tevlî Daişê bûn.

7- Kuştina gelek serokên Daişê li herêmên Sûrî ku gerek ewlehiya wan ji aliyê nivîsgeha Erdilmubareke de hatibe misogerkirin.

8- Gelek rapor nîşan didin ku ew şaneyên ku êrîşî Zindana Xiwêranê kirin di sala 2021ê de ji Sûrî bûn. Tu başdariya endamên eraqî tê de nebû. Her weha analîza ewlehî dide nîşandan ku kesên reviyabana wê ew veguhesibane çolistana Sûrî li gorî ku hinek sivîlên li ser xeta rêya di navbera Hesekê û derdora başûrê bajarokê Şedadê de ku digihe çiyayê Bişrî, dan zanîn ku gefên serjêkirinê li wan hatine xwarin heger tevgera Daişê asteng bikin yan bi QSDê re tev bigerin. Ji aliyekî din ve çûna Eraqê jî wê di kêleka çiyayê Şengalê re bana û wê bi YBŞê û Heşda Şabî re rûbirû mabane.

9- Hewildana Ehmed Xubêl (Ebû Xewla) û Ibrahîm El Hefil avakirina mînişînekê li Derdora Rojhilatê Dêra Zorê. Ê yekem têkiliyên wî bi Daişê re hebûn, yan herî kêm di berxwedana li dijî wê de xemsar bû li gorî daxuyaniya dûrxistina

---

[34]- rejîma Sûrî roleke mezin lîst di tesfiyekirina gelek rêxistinên cîhadî de yên ku li dijî hêzên emerîkî li Eraqê şer dikirin piştî ketina rejîma Sedam. Ew jî bi rêya agahiyên istixbaratî ku didane istixbaratên emerîkî derbarê ElQayide û komên sunî yên tundirew. (kenalek ji bo parvekirina agahiyên istixbaratî di navbera CÎA û Istixbaratên leşkerî yên sûrî de hatibû çêkirin ku ji dema sere Xelîc ê yekê de têkilî di navbera wan de şênebûne. Ew agahiyên ku istixbaratên Sûrî didane emerîkiyan hem pir û hem di cih de bûn, pişt re hate zanîn ku rejîma Sûrî bi xwe operasyonên cîhadî ji Sûrî û Lubnanê ber bi Eraqê ve dişandi û agahî didane emerîkiyan ji bo hukûmeta emerîkî bi rêveberiya Bûş ê kur berê xwe ji xistina rejîma Sûrî biguhere).( فلاينت ليفريت؛ وراثة سورية: اختبار بشار بالنار؛ ترجمة: د. عماد فوزي شُعيبي؛ الطبعة الأولى/ 2005م؛ الناشر: الدار العربية للعلوم/ بيروت؛ ص256.)

wî ji kar a ku ji hêla rêveberiya QSDê di 28.08.2023an de derket[35] û ji eşîra Elbikêr e[36] ku hejmarek ji kesên wê di rêveberiya Elqayida û Daiş ê de cih girtine. Ev xemsarî xuya bû dema alîgirên Daişê li bajarokê Elizibe di 07.07.2023an de xwe kom dikirin ji bo piştgiriyê bidinê[37]. Diyare ev jî hazirî bûn ji bo tevgera ê duyem ku piştgiriya DAÎŞê kiribû. Her weha hewil da ku piştgiriyê ji projeya xwe re bibîne bi rêya sêgoşeya Enqere- Hewlêr- Eldewha û pîrozkirineke ji dûr ve ji hêla rejîma Sûrî ve.

Şaneyên Daiş ê yên Sûrî hewil dan ji valahiya ewlehiyê ku her du navên borî derxistin, sûd bigirin lê belê beşê Eraqî alîkarî nedane beşê Sûrî û serokatiya rêxistinê ev şer bi "şerên cahiliyetê" binav kir. Têvelî di navbera alîgirên rêxistinê li ser medya civakî derket, hinekan pêwistî didît ku piştgiriyê bidin mîrê nû yê rêxistinê (Ebû Hefs El Qureşî) û hinan jî (Ibrahîm E Hefil) weke nûnerê cîhadiyan li Dêra Zorê didît û hevalbendên rêxistinê Haştaga (#Şêx Ebû Hefs ê Qureşî nûnerê min e ne kesekî din) belav kir.[38]

10- Hevrêzî û hemdemî di navbera operasyonên rêxistinê li herdu qadan, Sûrî û Eraqê de, tune ye.

**Karîgerên ku şiyana jihevcûdabûna hundirîn tekez dikin:**

Nîşaneyên rewşa dabaşbûnê bê guman ji wê jîngeha ku piştî têkçûna rêxistinê hate afirandin, tên. Piştî ku serok û rêberên wê di navbera Sûrî û Eraqê de belav bûn. Ev karîger hîn di qonaxa destpêkê de ne. Dibe ku demeke dirêj pêwist be heta derkevin holê û bandorê li kûrkirina terika di binyada rêveberiya rêxistinê

---

35- SDF PRESS CENTER ؛ بيان عزل أحمد الخبيل؛ تاريخ النشر: 2023.08.30م؛ الرابط: https://sdf- press.com/?p=40531

36 - komek ji ketîbe û elwiyên ji eşîra Elbikêr rafihandin ku wan . di bin navê (artêşa zilzala Elbikêr) de xwe kirin yek ji bo ku desthilata şerîetê vegerînin. Tevî ku wan di daxuyaniyê de xwe nesiparte tu komeke li ser erdê şer dike, lê daneyên derketin tekez kirin ku di bin siya DAÎŞê de hatiye damezirandin ji bo weke artêşa alîkar bi DAÎŞê re şer bike, bi taybet ku gelek ji kesên eşîra Elbikêr bi di şerê dawî li Bûkemal DAÎŞê re şer kiribûn". ( بوابة الحركات الإسلامية؛ بعد مبايعة فصيل النصرة "البوكمال".. هل تبسط داعش سيطرتها على الفصائل المسلحة؟!؛ تاريخ النشر: 25 يونيو 2014 الرابط: https://www.islamist-movements.com/2887

37 - Andie Parry and Others; Iran, Russia, and the Syrian Regime are Coordinating to Expel US Forces from Syria; THE INSTITUTE FOR THE STUDY OF WAR; August 3, 2023; Link: https://understandingwar.org/backgrounder/iran-russia-and-syrian-regime-are-coordinating-expel-us-forces-syria)

38 - أحمد سلطان؛ بين بيعة "القرشي" و"الهفل".. الاقتتال في دير الزور يشق صفوف أنصار داعش؛ الناشر: اخبار الآن؛ تاريخ النشر:2023.09.07م؛ الرابط:

https://www.akhbaralaan.net/news/special-reports/2023/09/07/

de bikin. Ji wan karîgeran: bêbawerî, vekişandina serokatiya navendî û pêşketina rêveberiyên şaxan, şiyana tevgera cîhadî ya selefî ji bo dabaşbûnê.

**1- Bêbawerî:**

Gelek sedem hene ku bêbaweriyê di hundirê rêxistinê de belav bikin, di navbera rêveberên eraqî û endamên wan ji hêlekê ve û ji hêleke din ve di navbera rêveberên sûrî û yên erqaî de. Ji van sedeman:

- Serokên rêxistinê nikarîbûn dewleta xîlafeya îslamî li ser lingan bihêlin piştî binketina wan li Bagozê. Tişta bû sedema mişextbûna bi hezaran ji malbatên rêxistinê li kampan û deverên dûr û di rewşên herî zehmet de. Ev tişt jî wê bandoreke neyînî li wan bike ji hêla baweriyê ve ji ber ku angaşt dikirin ku serketina wan bi saya xweda ye û bi piştgiriya wî ye, nexwe biketin û têkçûna dewleta wan jî tê wateya xezeba xwedê.
- Serkêş û rêberên rêxistinê nikarîbûn li hember serketinên QSDê xwe ragirin û stratejiya şerê Nîkaya û Temkîn bibin ket û veguherî mezaxtin û xerçkirina hêza rêxistinê, endamên wê yên dilsoz û dahateyên aborî.
- Guman di dilsoziya endamên mayî de heye û sistbûna aliyê ewlehiyê di rêxistinê de. Guman di dilsoziya wan endamên sûrî yên ku tevlî serastkirina rewşên xwe yên ewlehî bûne, bi hêzên QSDê re bi navbeynkariya rûsipiyên eşîran li Bakur û Rojhilatê Sûrî ji hêlekê de û ji hêla din ve bi dewletê re bi rêya wan endamên partiya Bas li herêmên di bin serweriya rejîma Sûrî de ye. Hinek jî vegeriyan hembêza rêxistina Elqayide, hineke din jî berê xwe dan û çûn bûne çeteyên artêşa tirk a dagirker. Hemû ji dabaşbûna rêxistinê sûd digirin. Tişta ku terkê di hundirê rêxistinê de kûrtir dike kuştina serok û rêberên wê yên payebilind ji Eraqê li herêmên sûrî ye ku gereke endamên sûrî (nivîsgeha Erdil Mubareke) ewlehiya wan li herêmê bigirin ser xwe, tişta ku kêmbûna ewlehiyê û derbasbûna sîxuran di hundirê rêxistinê de, tekez dike. Li gorî lêkolînerekî pispor di karûbarên trorê de: Ebû Mislim Eleraqî berpirsiyarê şaxê rêxistinê li Eraqê daxwaz kir ku têkilî bi şaxê Sûrî re were qutkirin ji ber ku hatiye xerqkirin (sîxuran tê de cih girtine).[39]
- Dûrxistina sûriyan ji sefên pêş yên rêxistinê berdewam e û cinsiyeta eraqî merceke bingehîn e di mijara destnîşankirina rêveberên rêxistinê û

39 -أحمد كامل البحيري؛ الخلافة المخترقة: وثائق "داعش" المسربة ومقتل قيادات التنظيم؛ الناشر: مركز الأهرام للدراسات السياسية والاستراتيجية؛ تاريخ النشر: 2023.08.14م؛ الرابط:
https://acpss.ahram.org.eg/News/20976.aspx

rêveberiya navendî ya meclisên leşkerî û ewlehî de. Ev tê diyarkirin di nasnameya piraniya serok û rêberên rêxistinê de yê ku hatine kuştin, yan girtin. Li gorî gotina hinek endamên ku jê berdane[40] ew kesê bi navê Ebû Sara el Eraqî ku weke serokê paşperdeyê bû, kesek ji bilî eraqiyan ji bo rêveberiya rêxistinê nedipejirand[41].

- Kêmbûna hejmara şervan û lîderên biyanî li qada çalakî û ragihandinê ya rêxistinê. Ew kesên ku hejmara wan di salên 2013-2016an de nêzî 40 hezar şervan bû ji 110 dewletên cihêreng[42], hêdî hêdî hejmara wan ber bi kêmbûnê ve çû û di navbera Sûrî û Eraqê de belav bûn. Tevî ku hinekan ji wan pirsgirêk ji rêxistinê re derxistin lê belê yên mayî yên herî dilsozên aydyolojiya wan in û ji bo wan bawerî di nava rêxistinê de gelekî giring e û ji bo wê di navbera endaman de lihevhatin û nêzîkbûnê çêdikin û li dijî pêşketina nasnameyên xwecihî û eşîrtiyê ne di nava rêber û endaman de. Ev tişt tê diyarkirin di helwesta Ebû Emer el Şîşanî û Ebû Ûbêda el Tirkî û Tirkî Bin Elî (El Behrênî) de û yên din… di çareserkirina alozî û pirsgirêkên ramiyarî û rêxistinî yên di hundirê rêxistinê de ku rû didan de. Heya vê gavê jî gelek ji endamên biyanî têkçûna rêxistinê red dikin û bibawer in ku "dewleta wê berdewam e û fireh dibe" û gelek reşkujî, tesfiye û işkenceyên ku derheqê wan kesên baweriya wan nema pê tê û dixwazin jê dûr bikevin, ew biyanî pê radibin. Li gorî vê, qada şer a ku wê şervanên biyanî yên nû bibijêrin; Sûrî yan Eraq wê bibe yek ji wan karîgerên ku şiyana terikandinê di hundirê rêxistinê de xûrtir bike. Em zanibin ku Bexdadî ew di çarçoveya desteyên şerîî de hiştibûn, di heman demê de rêvebirina meclisên leşkerî, ewlehî û istixbaratî sipartibû eraqiyan.

**2- Serok rêberên nenavendî derfetên mestir bidest xistin:**

Tecrube û serpêhatî tekez dikin ku komên tundirew her çiqas fireh dibin, di meydanê de lawaz dibin ji ber pirsgirêkên navxweyî û nakokiyên rêbazê û

---

[40] - kenalek heye bi navê (aşkerekirina presetên Bexdadî û Haşimî) li ser (Yam Tam Messenger) tê weşandin karkerên wê angaşt dikin ku ew endamên berê yên DAÎŞê bûn. Belge û nûçeyan li rêxistinê belav dikin. Yek ji çavkaniyên agahiyan e derbarê rêxistinê de. Çavdêr dibêjin ku ew bi ser rêxistina El Qayide ve ye.

[41] -أحمد سلطان؛ من هو القيادي الداعشي أبو سارة العراقي الذي قُتل في سوريا؟؛ الناشر: موقع أخبار الآن؛ تاريخ النشر: 2023.03.03؛ الرابط:

https://www.akhbaralaan.net/news/arab-world/2023/03/03/-

[42] -د. محمد أبو رمان ومجموعة باحثين؛ ما بعد دولة الخلافة، الأيديولوجيا. الدعاية. التنظيم والجهاد العالمي/ هل سيعود تنظيم داعش من جديد؟؛ الناشر: مؤسسة فريدريش ايبرت- الأردن والعراق/ 2021م. ص19.

sazîbûnê[43] û bi taybet piştî wendakirina serokên bihêz. Daiş derfetên bêtir dida serokên şaxan, ne ji ber ku ew ji hêla rêveberiyê ve zana û zîrek bûn, lê ji ber zextên ewlehî yên mezin ji hêla Hêzên Sûrya Demoqrat û hêzên eraqî bi piştgiriya Hevpeymana Navnetewî ya li dijî terorê. Hate xuyakirin ku piraniya serokên wê li derdora Bakur-Rojavayê Idlibê ne li seranserî sînorê Tirkî, dûrî qada sereke ya şer û propoxandayê li Sûrî û Eraqê. Ya ku vê tekez dike kuştina gelek serokên wê li vê herêmê.

Li gorî lêkolînekê ku (Navenda Şerkirina li Dijî Terorê li West Point) belav kiribû; serketina opoerasyonên kuştin û girtina serok û rêberên bibandor yên rêxistinê hişt ku nenavendî li cem serokên wê pêş bikeve. Li gorî vê lêkolînê[44]: "...Ev lawazbûna di nivîsgeha xelîfeyê de, ne tenê rêveberiya wîlayetên dûr veguheste saziya herî bihêz di rêxistinê de li Bîladişam, lê jê zêdetir, roleke sereke di rêvebirina xîlafeyê de li ser asta cîhanî de jî lîst. Bi lawazbûna navendê û bihêzbûna derdoran re, eger heman dabaşbûna ku bi El Qaydê re çêbûyî bi Daişê re çêbibe; wê bobelateke mezin be". Ji hêleke din ve ev karîger wê bibe sedema jihevbelavbûna hêza şer a li cem rêxistinê ji ber nakokiya di destnîşankirina "dijminê nêzîk" ê ku gerek hemû şaxên rêxistinê bi hev re şerê wî bikin. Ji bo were zanîn ku rêxistinê di destpêka xwe de, di avakirina idyolojî û sêstema xwe ya leşkerî û siyasî de, xwe sparte rewşa ciyosiyasî li Eraqê ku gelek endamên biyanî û sûrî wê fam nakin. Wek nimûne li sûrî hêzên QSDê wek dijminê nêzîk ê sereke tê hesibandin, û heta niha tu êrîş ji hêla şaxê sûrî ve li dijî dijminê sereke -li gorî şaxê eraqî- nehatine tomarkirin, ji bilî hinek êrîşên ku li dijî yekîneyên bi ser "Heres Sewrî" yê îranî li aliyê Rojavayê Çemê Feratê û heman tişt li gorî şaxê eraqî. Tersî dema serdestiya rêxistinê li ser herêma Rojhilatê Sûrî û Rojavayê Eraqê dema endamên ji Sûrî û Eraqê li her du herêman bi hev re şer dikirin. Ango her şaxekî wê li gorî xwe û ji bo berdewamkirina hebûna xwe, wê stratejiyeke taybet bimeşîne. Ev tişta ku wê bibe sedema derketina pirsgirêkan di mijara lojistî de di navbera Sûrî û Eraqê de. Her weha wê serokên şaxan bêtir vekirî bin li ser bexişandinê di mijara vegera wan

43 -الوزير المفوض/ عبد المجيد بن عبد الرحمن البابطين؛ ماذا بعد هزيمة "داعش"؛ الناشر: التحالف الإسلامي العسكري لمحاربة الإرهاب؛ تاريخ النشر: 2017.01.17م؛ الرابط:
https://www.imctc.org/ar/eLibrary/Articles/Pages/Articles1712017.aspx

44 - TORE HAMMING; The General Directorate of Provinces: Managing the Islamic State's Global Network; COMBATING TERRORISM CENTERT AT WEST POINT; JULY 2023; Link: https://ctc.westpoint.edu/the-general-directorate-of-provinces-managing-the-islamic-states-global-network/

endamên ku bi sedema stemkariya serokên kevin, jê dûr ketine. Lê belê wê bawerî bi wan gelekî neyê. Ev tişt hate xuyakirin li cem wan endamên ku hatin girtin piştî êrîşa li ser zindana Xiwêran destpêka sala 2022. Her weha tevgera şaneyên rêxistinê di wê tevliheviya ku Ehmed Xubêl û Ibrahîm el Hefir çêkiribûn li rojhilatê Dêra Zorê di meha Tebaxa 2023an de. Ev tiştên ku wê bibin sedema zêdebûna nakokiyan di navbera serokatiya navendî û serokatiya şaxê rêxistinê li Sûrî.

### 3- Şiyana jevcûdabûnê li cem tevgerên cîhadî yên selefî[45]

Kêmbûna serok û rêberên sereke li ser dika propoxanda, ragihandin û çalakiyan wê bihêle ku serokên xwecihî li Sûrî û Eraqê ew kesên ku dikarin navê xwe yê rastî û tecrubeya pêwist di çalakiyan de pêşkêş bikin û vê valahiya heyî dagirin -li gorî raporeke navnetewî-[46] ev xwestek ji ber xelat û taybetiyên kursiyê xîlafeyê ku di dinyayê û di axretê de xelat û diyarî jê re vekirî ne, tevî xwestekên pêkanîna arezûyên kesî. Ev tişt bi zelalî di mijara veqetandinên di hundirê tevgera cîhadî de[47] bi rêya hevrikiya serokên nû bi yên kevin re ku xwe ji wan baştir û bi serketîtir û navenda ku koma cîhadiyan li dora wê kom bibe, bidin xuyakirin. Mîna hevrikiya Ebû Miseb El Zerqawî bi Usama Bin Ladin re û hevrikiya Ebû Bekir el Bexdadî bi Eymen el Zewahirî re û hevrikiya Ebû Mihemed el Cewlanî bi Ebû Bekir el Bexdadî re. Diyar e ev tişt karêzma serokê nû xurt dike û wî dike nimûneyeke ku bidin pey. Tişta ku cûdabûnê kûr dike ew nakokiyên di

[45] ji bo agahiyên berferih di vê mijarê de lê binere( :- لله ثم للتاريخ... شهادة د. حذيفة عبد الله عزام على حوادث جبهة النصرة وجند الأقصى، الناشر: مؤسسة على بصيرة؛ بلا رقم طبعة وتاريخ.)

[46] - مجلس الأمن؛ التقرير الحادي والثلاثون المقدم من فريق الدعم التحليلي ورصد الجزاءات عملاً بالقرار 2610 (2021) بشأن تنظيم الدولة الإسلامية في العراق والشام (داعش) وتنظيم القاعدة وما يرتبط بهما من أفراد وكيانات؛S/2023/95 ؛ ص7.

[47] - Koka diyardeya veqetandinê di hundirê tevgerên islama siyasî de vedigere dabaşbûna islamê bi sê şepêlên cuda û bihevketî. Li gorî dîtina rêber Abdullah Ocalan. Ev şepêl; şepêla desthilatê ku Muawiya Bin Ebî Sufyan temsîl dike û şepêla navîvî bi serkêşiya Elî Bin EBî T alib û şepêla radîkaliyên democrat ku Xewaric wê dinimînin " Ev her sê ekolên sereke xwe ji serketina Îslamê heta roja me ya îro bi navên cihêreng û naverokên têgînan anîn, awayekî timî li dora xwe bizîvire tevahiya dîrokê li serê civakên Rojhilata navîn ferz kirin; rê vekirin li ber şerên mezin ên desthilatdariyê, pevçûnên xwînrij ên xanedanan, bihevketinên mezheban û jihevcihêbûna îtîqadan. Encam bû pêkhatina bêhejmar dewletokên desthilatparêz, împaratorî, mezheb û terîqetan "
Abdela Ocalan - Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk – Pirtûka Pêncem - Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî De Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Neteweya Demokratîk – Çapa Duyem – 2014 – Çapxana Azadî – Werger: Rêşad Sorgul – R 85.

gengeşeyên fiqhî de derdikevin derbarê tekfîr û helalkirina tiştên dikevin xizmeta rêxistinê de tevî ku di şerîetê de heram be. Berî ketina wê, hejmarek ji endamên komîteya şeriî yê rêxistinê xwe di baskan de kom kirin[48]. Mîna baskê Ebû Cafer el Hetab (şepêla Hazimî) û baskê Ebû Bekir el Qehtanî û Tirkî Bin Elî. Gelek ji alîgirên herdu baskan hatin darvekirin û hinan tobe kir. Ger alîgirên kîjan ji van herdu baskan piştgiriya serokê nû bikin wê cûdabûn di qonaxa pratîkî de çêbibe, heger karibe zarî tecrubeya Usama Bin Ladin bike dema di sala 1998an de eniya cîhanî ya cîhadê li dijî cihû û xaçperestan ava kir û eniyeke nû bi navê eniya cîhadê li dijî demoqrasiyê. Ji aliyekî din ve meylek ber bi serokatiyeke nû ve heye ji hêla kesên sûrî yên ku nû tevlî hizra cîhadî ya tundirew dibin û ji hêla kesên ji tevgerên heyî aciz bûne yên mîna Elqayde, Daiş, Cebhetulnesre û Ixwan el muslimîn ku bi hêzên dijber re bûne yek û endam û alîgirên xwe şerpeze kirin. Gerek were zanîn ku li qada Sûrî tevgera cîhadî dabaşî çar rêxistinên bi nakok di Bakur-Rojavayê Sûrî de bi cih bûne; Heyet Tehrîr el Şam (Cebhetulnesre), rêxistina el Qayide, Cebha Şamîye (Ceyşul Islam) û Daiş.

Ev fektor ji karîgerên herî bibandor e ku terkandina di binyada rêberî û baweriyê di rêxistinê de kûrtir dike û diyardeya (cêwaziya di ramanê de û piştre jihevcihêbûn û dûrketin û dijberî û di dawiyê de hevdu bi kufrê tewanbarkirin). Ev factor ya herî xurt e ji ber ku zemînekê ji bo bikaranîna herdu karîgerên din (bêbawerî û lawazbûna rêveberiya navendî) çêdike, ji bo pêkanîna armancên xwe û avakirina rêxistineke nû bi serokatiyeke nû û derketina aloziyeke nû li herêmê ku wê bi xwe re bobelatê bi ser cîhanê û misilmanan de bîne.

**Siyaseta ku wê ji bo lihevhatinê di hundirê rêxistinê de were meşandin**

Bê guman serokatiya navendî ya Daişê li gorî serpêhatiyên xwe heta astekê bîra terka ku di binyada baweriyê û rêveberiyê deçêbûye, dibe. Stratejiya wan a niha xuya dike û di çalakiyên xwe yên propoxanda û ragihandinê de dimeşînin, stratejiya berevaniyê ye li ser bingehê parastina hevgirtina rêxistinê û xurtkirina desthilata xwe û parastina xwe. Hinek factor hene pişta vê siyasetê xurt dikin û eger bi ser bikeve di piratîkê de dikare pêşî li cûdabûnê bigire. Ji wan karîgeran:

1- Berdewama karê (dîwana ragihandinê ya navendî) ê ku ji bo berdewamiya xîlafeya Daişî di cîhana iftîrazî de dixebite, bi rêya belavokên xwe û xwegihandina peyçûyan. Lê belê berhemdariya ragihandinê ya rêxistinê di

---

[48] - د. محمد أبو رمان ومجموعة باحثين؛ ما بعد دولة الخلافة، الأيديولوجيا. الدعاية. التنظيم والجهاد العالمي/ هل سيعود تنظيم داعش من جديد؟؛ الناشر: مؤسسة فريدريش ايبرت- الأردن والعراق/ 2021م. ص56.

destpêka sala 2021ê ji sala 2016an ji sedî 7 paş ketiye[49]. Bi saya operasyona ragihandinê ya cîhanî ya li dijî rêxistinê û ji destdana piraniya xaka di bin kontrola xwe de û wendakirina hejmareke mezin ji endamên xwe. Lê tevî wê jî hîn saziya ragihandinê yek ji hêmanên sereke ye ku wê xurt û hevgirtî dide xuyakirin li pêşberî alîgir û hevalbendên wê. Tevî lawaziya vê saziyê lê ew sûd ji lawaziya propoxanda dijber, dibîne. Ji ber kêferata dewletên herêmî li ser herêmê. Ev tişt di ragihandina Tirkî, Sûrî, Îran û Rûsya[50] û partiyên Sûrî û eraqî de diyar dibe. Her weha li hember ragihandina DAÎşê ya xwecihî nayê rawestan ku dûrî çavdêriya hêzên hêzên navdewletî ye û piştgiriya pêwist ji bi QSDê nayê kirin.

2- Dijminê hevpar ê hemû komikên di hundirê rêxistinê de ku di tevgerên demoqrasî, dewletên rojavayî û azweriya siyasî ya Şîea de tê nîşankirin.

3- Zêdebûna aciziyê ji rewşa jiyanê ya dijwar û zehmetiya peydakirina pêwistiyên jiyanê. Ji hêla din ve projeya rêxistinê weke çareseriyê ji bo van pirsgirêkan tê dîtin weke ku di ragihandina xwe de angaşt dikin[51].

4- Nifşekî nû ji (Eşbal el Xîlafe) û zarokên girtî, kuştî û birîndaran ji endamên rêxistinê heye ku idyolojiya rêxistinê di mejiyê wan de hatiye çandin û zehmet e ku jê rizgar bibin ji ber kirîza siyasî, aborî û ewlehî ya ku herêm tê re derbas dibe û bi hêsanî hesta tolhildanê li cem wan dikare were gurkirin û werin birêxistinkirin. Her weha xwesteka jinên biyanî ya anîna gelek zarokan.

5- Pîlan û komployên ku rejîma Tirkî û Sûrî û hevalbendên wan li ser herêmê pêk tînin, rewşeke nearamiyê li herêmê peyda dikin; gef û êrîşên dewleta Tirk aşkere ne, lê ji bo Sûrî lêkolînekê[52] ji aliyê "enîstûtiya lêkolînên şer"da zanîn ku "Îran, Rûsiya û rejîma Sûrî giringiyeke mezin nadin şerê li hember Daişê. Di heman demê de hêzên xwe li Rojhilatê Sûrî kom dikin. Ev tişt dibe ku derfetekê bide Daiş ku xwe kom bike û xwe ji bo demdirêj amade bike"

---

49 -د. محمد أبو رمان ومجموعة باحثين؛ ما بعد دولة الخلافة، الأيديولوجيا. الدعاية. التنظيم والجهاد العالمي/ هل سيعود تنظيم داعش من جديد؟؛ الناشر: مؤسسة فريدريش ايبرت- الأردن والعراق/ 2021م. ص34.

50 - ragihandina rejîmên Sûrî, Îran û Rûsiya nakokiyan di navbera pêkhateyên herêmê de derdixin ev jî dibe wan li dijî hêzên emerîkî yan hêzên Sûrya Demoqrat sor bikin.

51 - ev tişta ku jina bi navê Sara ku jina yekî endamê rêxistinê ye û hatiye kuştin. Niha li kampa Roj e. di hevdîtinekê de 11.8.2022 dibêje: rêxistinê her tişt bêpere dabîn kir, çi kehrebe, telîfon, mal û kelûpelên pêwist hemû ji wan re dabîn kirin.

52 - Andie Parry and Others; Iran, Russia, and the Syrian Regime are Coordinating to Expel US Forces from Syria; THE INSTITUTE FOR THE STUDY OF WAR; August 3, 2023; Link: https://understandingwar.org/backgrounder/iran-russia-and-syrian-regime-are-coordinating-expel-us-forces-syria

ev tişt li ser serokatiya navendî û yên şaxan ferz dike ku bi hev re bi yekrêziyê bixebitin ji bo xalên lawaz derbas bikin û çalakiyan li dijî saziyên rêveberiya xweser û navendên leşkerî yên hêzên QSDê û hevpeymana navnetewî pêk bînin, her weha rizgarkirina girtiyan ji zindanan. Propoxandaya vê yekê jî wê wan yekgirtî bide xuyakiein li ber çavên alîgirên wan li cîhanê. Ji hêleke din ve eger ewlehî li Bakur-Rojhilatê Sûrî lawaz bibe di encama wan çalakiyan de wê rêxistin derfeteke mezin bidest bixe ku ji nû ve rabe û bihêz bibe.

6- Serokatiya navendî ya rêxistinê rewşa dijminatiya rejîmên netewperest yên tirk, Îran û ereb li beramberî doza kurdî[(53)] û mijara demokresiyê ya giring ji bo civakên herêmê, nas dikin û bi hemahengî bi vê boçûnê re li Bakurê Sûrî û Eraqê tevger dikin û bi istixbaratê wan rejîman re tev digerin ji bo karibin xwe bigihînin alîgirên xwe yên ku li ser xaka wan rejîman dijîn ji bo çalakiyên xwe yên şer û propoxandayê li her du qadên Sûrî û Eraqî di bin kontrola xwe bihêlin.

7- Rastdîtina idyolojiya xwe û mezinkirin û zêdekirina encamên operasyonên xwe di ragihandina xwe de û xwesipartina êrîşên ji nişka ve û li ser armancên hêsan, li deverên lawaz, li çolistanê û li ser rêyên dûrî çavdêriya ewlehî û pêkanîna reşkujiyan derheqê sivîlan de li saziyên xizmetê ji bo ku xwe yekgirtî û bihêz bidin xuyakirin di çarçoveya (şerê nîkaye û temkîn) ji bo bilindkirina moralan û xurtkirina baweriyê li cem alîgirên xwe.

---

[53] - serok û fîlosofê kurd Abdullah Ocalan bale dikişîne ser (fobiya kurdî) yak u hêzên hegomonîk li ser cîhanê afirandine dibêje( mirov ê bibîne, dewletdariyeke netewe ya Kurd timî weke potansiyel yedek tê girtin, bi awayê, ha ava bû wê ava bibe, hem dewletên netewe yên herêmê kontrol û terbiye dikin, hem jî li şûna xwe bisipêrin hêza xwe, hêviya xwe bi pêkhatineke muhtemel a bi destê hêzên hegemonîk ên derve pêk bê girê didin … Ji bo rastiya Kurd a neteweyî bi gewde bibe, wisa plan kirin ku bi tenê dikare bi têkiliyên kapîtalîst ava bibe. Fêhm û têgihiştineke dibêje rastiya neteweyî ya bi xisletên şoreşger, demokratîk û sosyalîst nabe, timî di rojevê de dihêlin. Di vê mijarê de destikê herî girîng ê hêzên hegemonîk pê radibin, Ereb-Sunnî ya navend Bexda ye yan jî milliyetgiriya Şiî ye. Tehlûkeya milliyetgiriya Ereb timî li ser serê wan digire û bi vî awayî Kurdan dixe rewşekê ku timî xwe biavêjin bextê wê. Tehlûkeyê berevajî dike û vê carê tehlûkeya Kurdan li ser serê Ereban digire. Bi heman awayî, bi gotina, dewleta Kurd ha ava bû wê ava bibe, gefan li rejîmên dewletên Tirkî, Sûrî û Îranê dixwe. Li aliyê din, van hêmanên sêber an jî çarber weke çavkaniyeke tehlûkeyê zindî dihêle û bi vî awayî girêdan û dilsoziya Kurdan bi xwe bi temamî pêk tîne).
Abdela Ocalan - Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk – Pirtûka Pêncem - Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî De Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Neteweya Demokratîk – Çapa Duyem – 2014 – Çapxana Azadî – Werger: Rêşad Sorgul – R (153 - 154).
2.

8- Mijara kampên Hol û Rêj û endamên rêxistinê yên girtî ji bo serokên navendî û şaxan û alîgiran jî şermeke mezin in. Ev tişt li ser wan ferz dike ku yekgirtî bimînin ji bo vê pirsgirêkê çareser bikin. Her weha ev mijar dike ku nakokiyên xwe yên hundir paş bixin. Mînaka vê jî ew gefên mîrê nû yê rêxistinê (Ebû Hefs el Qureşî Elhaşimî)[54] ku: "wê pilanê çêbike ku kampa Holê bike çirûska ku QSDê û herêma Rojhilat bişewitînw û danîn û pêkanîna pîlana (Xiwêran2)". Xuyaye ku rêxistin dixwaze kesayeteke xwedî karêzmaya serokatiyê û tund ava bike ku karibe bandorê li hastên alîgirên xwe bike û wan di bin sîwana xwe de kom bike.

9- Bikaranîna rewşa nearamiya siyasî û ewlehî li giştî xaka Sûrî û Eraqî di xizmeta xwe de. Dibe ku pîlanên wê hebin ji bo vê valahiya ewlehiyê ku wê derkeve, heger rejîmên heyî di vê xaknîgariyê de hilweşin, dagire. Mîna dema derketina wê ya diramatîkî di sala 2011 de.

10- Berdewamiya rewşa pevketinê di navbera rêxistinên cîhadî de li Sûrî misoger dike ku tu eniyeke hevbeş û bihêz li dijî Daişê dernekeve. Ji hêleke din ve dikare destwerdana vî şerî bike ku piştgiriyê bide hinek rêxistinan yan bi hinekan re kiwalîsyonekê bi serokatiya xwe, ava bike.

## Siyaseta berevaniya xwecihî weke gefekê li ser hebûna rêxistinê.

Siyaseta tundî û terorê ya ku rêxistinê ji bo kedîkirina civakên herêmê meşand, tu encam negirt. Piraniya kesên pê re alîkar -li gorî gotina girtiyan û nûçeyan û axaftinên hemwelatiyan- ji ber tirsa gefên şaneyên Daişê ne -nîşana vê jî gelek gefên ji hêla şaneyên rêxistinê li hemwelatiyan dikin û kuştina karmendên saziyên rêveberiya xweser û meclisên xwecihî- yan ji bo berjewendiyên madî -weke çeteyên artêşa tirkî ya dagirker- yan jî ji ber kîna li hember kurdan û dijatiya "demoqrasiyê" ku rêxistinê bi (xapandina serdemê ya mezin)[55]bi nav dikir . Ew jî ji ber propoxandata dijber a ku rejîmên desthilat li Sûrî, Îran û Tirkî, dikin. Her weha hinek serokên rêxistinê yên "basî" û Turkmen hene ku ji kurdan acizin û kîna kurdan di dilê wan de ye. Ev tişt diyar dibe di wan karên ziyanker de yên ku hevalbendên Ibrahîm el Hefil û Ehmed el Xubêl li

---

54 -عبد الله سليمان علي؛ زعيم "داعش" الجديد.. أبو المثنى الجنوبي أم أبو خديجة العراقي؟؛ الناشر: 180POST؛ تاريخ النشر: 2023.08.18م؛ الرابط:
https://180post.com/archives/39454

55 - hemû rêxistinên tekfîrî li dijî demoqrasiyê ne û her kesê pê re bi kufrê tewanbar dikin û wê ji cem cihû û xaçperestan dihesibînin.

Rojhilatê çemê Firatê kirin. Van kesan dijminatiya kurdan bi kar anîn ji bo hevalbendên xwe bi moral bikin û li dijî QSDê bidin xebitandin. Ev tişt dide xuyakirin ku rêxistin êdî xwe nasipêre xurtbûna îdyolojiya xwe ji bo sepandina desthilata xwe li herêmê. Rewşa meydanî ya niha û nîşanên jihevcûdabûnê di hundirê rêxistinê de û karîgerên terikandina hundirîn, aloziyeke mezin li cem rêxistinê nîşan didin. Tişta ku vê aloziyê kûrtir dike siyaseta xweparastinê ya rêveberiya xweser û QSDê, ji ber her kesê ku dilxwazê aştiyê û çareserkirina aloziyên aborî ye -piraniya civakan vê dixwazin- çareseriyê li cem Hêzên Sûrya Demoqratîk û Rêveberiya Xweser dibînin bêtir ji rêxistinên din li Sûrî, di nav de dewleta Sûrî û Daiş jî. Hevpeymana Navnetewî Ya Li Dijî Terorê jî di vê de heman fikr e. Ev jî di hevkariya stratejîk de bi wan re diyar dibe.

**Xalên ku aloziya li cem rêxistinê kûrtir dikin:**

1- Lawaziya çareserkirina wê ji sedemên jivcûdabûnê re û nekarîna rêlibergirtina karîgerên ku dibin sedema jihevcûdabûnê.

2- Berdewamkirina Hevpeyana Navnetewî Ya Li Dijî Terorê di stratejiya xwe de û avakirina rewşeke ewlehî li dijî rêxistinê.

3- Qutbûna têkiliya saybiranî (medyayî) di navbera rêxistinê û hevalbendên wê de ji ber êrîşa dijber û xurt di asta xwecihî de li ser tevgera (Dîwana Ragihandina Navendî) ya rêxistinê û hemû wepsaytên elektronî û medyaya civakî ya rêxistinê. Ev wê hîn xurtir bibe piştî QSDê navgînên şerê saybiranî bi dest xistin ji bo li hember çalakiya ragihandina rêxistinê bisekine.

4- Rêveberiya xweser û QSDê xwe disipêrin paradigma netewa demoqratîk ji bo pêkanîna têgehên wekhevî û demoqrasiyê û tunekirina nakokiyan û pêkanîna pêwistiyên xizmetguzariyê ji hemwelatiyan re -li gorî derfetên xwe- û pêşxistina xweseriyê li cem civakan, bi riya komîn û meclisên xwecihî yên ku hevgirtinê di civakan de xurt dikin. Ev paradîgma di herêmên ku di bin desthilatdariya Daişê de bûn, tê pejirandin. Paradîgmayeke li dijî îdyolojiya Daişê ye. Çiqasî di civakan de were pejirandin, ewqasî hêza Daişê ya rêxistinkirinê di civakan de kêmtir dibe.

5- Zehmetiya dabînkirina pêwistiyên madî ji derve û zehmetiya gihandina şervanên nû yên biyanî heta cihê çalakiyên rêxistinê. Tiştekî bi navê (Darul Islam) wek coxrafî nemaye ku alîgirên wê diçûne wir.

6- Hewildanên hevrikên wan ên selefî, koma Ixwan el Mislimîn, basî û Şîiî ku çalakiyên xwe di herêmên rêxistinê de, berdewam bikin. Hinek nîşan hene ku dewletên herêmî hewil didin rêxistinên eşîrtî ava bikin bi ruhekî olî, netewî û etnîkî ji bo hilweşandina aramiya li Bakur û Rojhilatê Sûrî. Ev tê xuyakirin bi piştgiriya rejîma Erdogan û Esed ji tevliheviya ku Ibrahîm el Hefil çêkiribû ji bo aramî û aştiya ku rêveberiya xweser û QSDê û Hevpeymana Navnetewî pêk anîne, têk bibin. Ev tişt ji aliyekî de erênî ye ji bo rêxistinê û ji aliyekî de neyînî ye; erêniya wê ew e ku dikare di nav şer de, ew jî şer bike û zirarê bigihîne dijminên xwe. Lê belê aliyê neyînî bêtir li pêş e ji ber mumkine rêxistineke nû tundrew bi ruhekî netewî-olî derkeve pêş û hebûn û yekbûna Daişê bike xeteriyê de. (ji bo pêzanînê Ibrahîm EL Hefil niha li cem rejîma Sûrî ye li gorî daxuyaniya QSDê.[56] FERHAD ŞAMÎ: IBRAHÎM EL HIVIL LI GEL HIKÛMETA ŞAMÊ YE Û NAHÊLE KU VEGERE HERÊMÊ)

7- Rejîma tirkî pelika Daiş ê di siyaseta xwe ya herêmî û projeya xwe ya îdyolojî de, bikar tîne ji bo Bakurê Sûrî û Eraqê têxe bin serweriya xwe de. Hinek nîşan hene ku ev pelik di bazarên xwe bi hinek hêzên herêmî û dewletî yên bibandor li Rojhilata Navîn re bikar tîne. Mirov dikare raporên Hevpeymana Navnetewî yên derbarê operasyonên leşkerî li Bakur û Rojhilatê Sûrî bişopîne. Her weha kuştina gelek ji serokên rêxistinê li wan herêman, ji ber aşkerebûn û naskirina wan serokan ji hêla istixbaratên tirkî ve dema ku xwe di herêmên di bin dagirkeiya wê de bi cih kiribûn, li Bakur-Rojavayê Idlibê, Efrîn, Cerablus, Girê Sipî û Serê Kaniyê. Tekez wê rêxistin ji wan herêman were qewitandin piştî ku erka xwe bi dawî bike. Heman tişt li parasgehên wê li Bşûrê Eraqê ku istixbaratên tirk li wir çalak in.

8- Berdewama helwesta dijminatiyê ji hêla rêxistinên selefî yên li Sûrî ku di daxuyaniya xwe ya yekem de rêxistin tewanbar kirin ku (gelek xerabî û ziyan derbasî civaka Sûrî kir). Daiş nikarîbû van rêxistinan bigire nav xwe, yan têxe bin serweriya xwe de.

## ➢ Buxte û encam

Têgeha Dewleta Islamî li Eraq û Şamê ji destpêkê de ne guncaw bû bi sazûmaniya giştî ya rêxistinê re û nebû çarçoveyek ji nasnameya endamên wê re li tevahî cîhanê. Ji ber ku endamê rêxistinê ji Efrîqa yan Asiya nikare bi vê

[56] - https://youtu.be/8SfsXZbKoIg

têgehê re bibe yek û tevlî wê bibe. Li vir pirsgirêk derdikeve di mijara şerkirina li hember civak û rejîmên xwe yên dûr yên ku îdyolojiya wan qebûl nakin. Ji ber ji wan tê xwestin ku ji bo vê bi rê bikevin heta bigihin van dewletan û bi wan re (dijminê nêzîk) şer bikin. Ev tişt di pratîkê de ne pêkane. Loma ji piratîkî bêtir, weke helwesteke manewî ye. Belkî rengekî ji rizgariya serokên tekfîriyan li Asya û Efrîqa ji desthilata El Qayide be. Piraniya rêxistinên cîhadî yên tundrew ku destek dane rêxistinê, jê kevintir in. Di vê derbarê de, dibe ku şaxê Sûrî bêtir xwe ji serokatiya navendî ya eraqî rizgar bike û di stiratejiya xwe de ber bi xweseriyê ve here û dibe ku baweriya xwe ya siyasî û leşkerî di bin têgeha (Dewleta Islamî li Bîlad el Şam) yan navekî din de formîle bike. Tişta ku vê boçûnê dide pêş; xwestekên serokên li Sûrî di xîlafeyê de û pêşdeçûna desthilata şerîetsazên rêxistinê yên Sûrî(57), her weha coxrafiyeke nû li Sûrî peyde dibe, dûrî desthilata rejîma Sûrî û dûrî qada operasyonên Hêzên Hevpeymanê ku herêmên sunniyan li qada eraqî û herêmên sunniyan li Rojhilatê Feratê, digire. Nîvê duyem ji qada sunnî ya Sûrî, dikeve bin desthilata rejîma Sûrî û hevalbendên wê yên Rûs û Îranî de. Beşê wê yê Bakur jî di bin destê artêşa tirk a dagirker û çeteyên wê de ye. Di wan herêman de ewlehî û aramî kêm e; her tim komên li wir di nav şer de ne.

Rêxistin li herêmê dixwaze xwe bi cih bike û nema weke rêxistineke terrorist ku ji aloziyên dewletên netewî û islama siyasî, osmanî, ixwanî, selefî û şî'ea sûd girtiye, wê berdewam bike. Lê dixwaze îdyolojiya xwe ya taybet ava bike û dewleta xwe ya ku angaşt dike, saz bike. Piştî binketina rêxistinê, êdî endamên wê bi nepenî û veşartî tev digerin û rastiya xwe aşkere nakin. Ev jî nîşan dide ku baweriya civakî bi wan nemaye û hewildanên jinûve komkirina endaman û wê bi ser nekevin, lê wê bêtir hêza xwe vala mezaxtin bike û endam û serokên xwe wenda bike û eger serokatiya xwe ya navendî veneguheze derve li welatine din ku aloziyên siyasî û aborî jiyan dikin, wê dawiya wê yan veqetandina û jihevcûdabûna wê li Sûrî û Eraqê tekez be. Bi taybetî ku endamên sûrî wê demeke dirêj qebûl nekin ku xîlafet bimîne di destê eraqiyan de. Di heman demê de eraqî dest jê bernadin. Tevî zext û pêkutiyên ewlehî û leşkerî, wê rêxistin û sazûmaniya wê li Sûrî û Eraqê hilweşe. Tişta ku vê hilweşandinê bilez

---

57 - ji bo agahiyên berfireh derbarê destpêkirina zihniyeta cîhadî ya nû li cem sûriyan û bilindkirina payeya Şamê li cem tevgera cîhadî ya tekfîrî li vê vegere:

عمر عبد الحكيم؛ الثورة الإسلامية الجهادية في سوريا/ الجزء الأول: التجربة والعبرة (آلام وآمال)؛ الطبعة الأولى/1991م؛ بلا ناشر.

bike; çareserkirina pirsgirêka kampên Hol û Roj, jinên girtî û derfet nedin ku Bakur-Rojavayê Sûrî bibe wargehek ji serokên rêxistinê re û piştgiriyia Hevpeymana Navnetewî ji QSDê re û ji rêveberiya xweser re li dijî pîlan û komployên rejîmên Sûrî û Tirkî, her weha pêşvebirina aboriya Bakur û Rojhilatê Sûrî û saziyên wê yên xizmetguzariyê û teknolojiya çavdêrî û lênêrînê yên pêşketî bidin QSDê. Her weha çiqasî civakên herêmê demokrasiyê bipejirînin, wê ewqasî bandora îdyolojiya rêxistinê li ser wan kêm bibe.

Bi xwesipartina rewşa veqetandin û jihevcûdabûnê û berçavgirtina karîgerên xurtkirina vê rewşê di nava rêxistina Daişê de û siyaseta berevaniyê ya civakên xwecihî, tê xuyakirin ku rêxistina Daişê di demeke nêzîk de weke rêxistineke yekgirtî namîne û wê nikaribe xwe li gorî rewşa ewlehî ya nû li herêmê adapte bike. Wê şaxê wê yê Sûrî berdewam bike li herêmên çiyayî yên di bin serweriya rejîma Sûrî de ya li dijî Hevpeymana Navnetewî Li Dijî Terorê û herdu alî naxwazin bi hev re bixebitin. Li qada sunnî ya Eraqî wê arîşe di navbera El Qayde, Partiya Bas, Meclisên Sehewat yên sunî, Daîş û rêxistinên di Heşd Şabî de, zêdetir bibin. Her weha wê Daiş nerazîbûna miletê eraqî yê sunnî ji rewşa jyanî, ji xwe re bikar bîne (bi xwe li ser wê ava bûye). Wê Daiş êrîşên ji nişkave li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrî pêk bîne. Lê belê wê fêm bike ku nema dikare serweriya xwe li herêmê bike. Tenê çirûskeke hêviyê li ba wê heye li cem Daişê heye, ew jî endamên rêxistinê li kampan û zindanan û belavbûna endamên wê li Sûrî û Eraqê û aboriya wê ya digihêje 300 milyon dolar ku dikare wan pereyan bişîne şirketên nefermî û bide istismarkirin[58]. Ev tê wateya ku hîn li herêmê heye. lê jihevketî ye. Mumkine eger derfet di destê wê de çêbû, karibe xwe ji nû ve kom bike û tunel û cihên xwe bikar bîne û ji berê bihêztir xwe ava bike li ser bingeha tektîka (avakirina di şer de). Ev jî guhertinên bilez û jinişka ve yên li herêmê, vê pêşbîniyê destek dikin û dibe ke rewşeke nearamiyê li Rojhilatê Feratê bafirîne û ji kontrolê derkeve û îsyaneke mezin li kampa Holê çêbibe û bi koman jê derkevin. Hemdemî bi êrîşên pîlankirî re ji bo derxistina endaman û hatina bi dehan şervanên çalak ji herêmên Bakur ên di bin serweriya artêşa dewleta Tirk a dagirker de û Rojavayê Feratê û Rojavayê Eraqê. Her weha tevlîbûna bi dehan kesên bikîn li ser aloziya jiyanî di bin bandora gotara kîn û dijminatiyê de ya li dijî Rêveberiya Xweser û QSDê û deriyê tobekirinê vekin ku

58 - د. محمد أبو رمان ومجموعة باحثين؛ ما بعد دولة الخلافة، الأيديولوجيا. الدعاية. التنظيم والجهاد العالمي/ هل سيعود تنظيم داعش من جديد؟؛ الناشر: مؤسسة فريدريش ايبرت- الأردن والعراق/ 2021م. ص19.

bi hezaran kesên dûr ketî vegerin. Bi rastî jî beşek ji vê yekê pêk, hat dema êrîşa li ser zindana Xiwêranê sala 2022. Lê belê bi ser neket. Ji ber ji propoxanda xwe bawer kir ku saziyên Bakur û Rojhilatê Sûrî zextê li civakan dikin û civak dixwazin rêxistin vegere, lê ne rast bû. Dubarekirina vî sînaryoyî ji hêla serokatiya nû ya rêxistinê ve jî gengaz e.

Têkbirina vê yekê girêdayî hişyarbûna Hêzên Hevpeymanê û Hêzên QSDê ye û awayê analîzekirin û bikaranîna agahiyan û xwesipartina stratejiyekê ku karibe bi hemû sînaryoan re adepte bibe, heke rêxistinê berê xwe da vegirtina xakê li herêmê û bikaranîna sivîlan weke mertalên zindî û firehkirina qada tirs û tevliheviyê li qadên Sûrî û Eraqî. Serpêhatiya tevgerên cîhadî yên tundrew dide tekezkirin ku dikarin ji nû ve bi awayên rêxistinî yên nû û bi şêweyên cûda derkevin û bilez belav bibin. Şaxê Sûrî dikare vê yekê bike, lê heta karibe vê bike sê mercên bingehîn hene;

1- serokatiyeke nû û bihêz.

2- hêzên Sûrya Demoqratîk nikaribin ewlehiyê li Bakur û Rojhilatê Sûrî misoger bikin.

3- lawazbûna çalakiya istixbaratî û pratîkî ya Hêzên Hevpeymana Navnetewî di analîzekirina agahiyan de, yan vekişandina wan ji Sûrî, yan kêmkirina hejmara endamên xwe li herêmê.

Ev hemû jî li gorî daneyên siyasî, ewlehî, leşkerî, çandî û rewşa ciyosiyasî ya Bakur û Rojhilatê Sûrî, dûre ku pêk werin.

---

**Çavkanî û jêder.**


*1.* Ebdela Ocelan - Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk - Pirtûka Çaremîn - Li Rojhilata Navîn Krîza Şaristaniyê û Çareseriya Şaristaniya Demokratîk – Çapa Duyem – 2014 – Çapxana Azadî – Werger: Rêşad Sorgul

*2.* Abdela Ocalan - Manîfestoya Şaristaniya Demokratîk – Pirtûka Pêncem - Parastina Kurdên Di Nava Pencê Qirkirina Çandî De Pirsgirêka Kurd Û Çareseriya Neteweya Demokratîk – Çapa Duyem – 2014 – Çapxana Azadî – Werger: Rêşad Sorgul ؛

*3. د. علي الوردي؛ وعّاظ السلاطين؛ الطبعة الثانية/1995؛ الناشر: دار كوفان/ لندن.*

*4. د. محمد أبو رمان ومجموعة باحثين؛ ما بعد دولة الخلافة، الأيديولوجيا. الدعاية. التنظيم والجهاد العالمي/ هل سيعود تنظيم داعش من جديد؟؛ الناشر: مؤسسة فريدريش ايبرت- الأردن والعراق/ 2021م.*

*5. لله ثم للتاريخ... شهادة د. حذيفة عبد الله عزام على حوادث جبهة النصرة وجند الأقصى، الناشر: مؤسسة على بصيرة؛ بلا رقم طبعة وتاريخ.*

*6. فلاينت ليفريت؛ وراثة سورية: اختبار بشار بالنار؛ ترجمة: د. عماد فوزي شُعيبي؛ الطبعة الأولى/2005م؛ الناشر: الدار العربية للعلوم/ بيروت.*

*7. د. آزاد أحمد علي؛ مقدمات ظهور داعش كقوة عسكرية وأيديولوجية وقابلية تكرارها؛ محاضرة قدمت في سياق المنتدى الدولي حول داعش: الأبعاد والتحديات واستراتيجيات المواجهة الذي عقدته NRLS في شمال شرق سوريا عام 2019م.*

*8. عمر عبد الحكيم؛ الثورة الإسلامية الجهادية في سوريا/ الجزء الأول: التجربة والعبرة (آلام وآمال)؛ الطبعة الأولى/1991م؛ بلا ناشر.*

*9. أبو محمد عاصم بن محمد بن طاهر البرقاوي؛ وقفات مع ثمرات الجهاد؛ الناشر: المكتبة الشاملة الذهبية؛ بلا رقم طبعة وتاريخ.*

*10.Dr. Hay Eytan Cohen Yanarocak & Dr. Jonathan Spyer؛ الدولة العميقة في تركيا: الذئاب الرمادية والجيش الوطني السوري؛ ترجمة ونشر: آسو للدراسات؛ بلا رقم طبعة.*

*11.التقرير الخامس والعشرون لفريق الدعم التحليلي ورصد الجزاءات المقدم عملا بالقرار 2368 (2017) بشأن تنظيم الدولة الإسلامية في العراق والشام (داعش) وتنظيم القاعدة وما يرتبط بهما من أفراد وكيانات؛ S/2020/53؛ 20 January 2020؛*

*12. التقرير السابع والعشرون لفريق الدعم التحليلي ورصد الجزاءات المقدم عملا بالقرار 2368 (2017) بشأن تنظيم الدولة الإسلامية في العراق والشام (داعش) وتنظيم القاعدة وما يرتبط بهما من أفراد وكيانات؛ S/2021/68؛ 3 February 2021؛*

*13. مجلس الأمن؛ التقرير الحادي والثلاثون المقدم من فريق الدعم التحليلي ورصد الجزاءات عملاً بالقرار 2610 (2021) بشأن تنظيم الدولة الإسلامية في العراق والشام (داعش) وتنظيم القاعدة وما يرتبط بهما من أفراد وكيانات؛ S/2023/95*

*14. مجلس الأمن؛ التقرير الثاني والثلاثون المقدم من فريق الدعم التحليلي ورصد الجزاءات عملاً بالقرار 2610 (2021) بشأن تنظيم الدولة الإسلامية في العراق والشام (داعش) وتنظيم القاعدة وما يرتبط بهما من أفراد وكيانات؛ S/2023/549؛ 25 July 2023؛*

*15. الوزير المفوض/ عبد المجيد بن عبد الرحمن البابطين؛ ماذا بعد هزيمة "داعش"؛ الناشر: التحالف الإسلامي العسكري لمحاربة الإرهاب؛ تاريخ النشر: 2017.01.17م؛ الرابط:*

*https://www.imctc.org/ar/eLibrary/Articles/Pages/Articles1712017.aspx*

*16. Andie Parry and Others; Iran, Russia, and the Syrian Regime are Coordinating to Expel US Forces from Syria; THE INSTITUTE FOR THE STUDY OF WAR; August 3, 2023; Link:*

*https://understandingwar.org/backgrounder/iran-russia-and-syrian-regime-are-coordinating-expel-us-forces-syria*

*17. Stanford University/ A program of the Center for International Security and Cooperation (CISAC); The Islamic State; Link: https://cisac.fsi.stanford.edu/mappingmilitants/profiles/islamic-state*

*18. Chloé Jamet ; The impact of ISIS on Muslim countries' intelligence services; the Kuwait Program at Sciences Po/2021*

*19. TORE HAMMING; The General Directorate of Provinces: Managing the Islamic State's Global Network; COMBATING TERRORISM CENTERT AT WEST POINT; JULY 2023; Link: https://ctc.westpoint.edu/the-general-directorate-of-provinces-managing-the-islamic-states-global-network/*

*20. بوابة الحركات الإسلامية؛ بعد مبايعة فصيل النصرة "البوكمال".. هل تبسط داعش سيطرتها على الفصائل المسلحة؟!؛ تاريخ النشر: 25 يونيو 2014 الرابط: https://www.islamist-movements.com/2887*

*21. أحمد سلطان؛ بين بيعة "القرشي" و"الهفل".. الاقتتال في دير الزور يشق صفوف أنصار داعش؛ الناشر: اخبار الآن؛ تاريخ النشر: 2023.09.07م؛ الرابط:*

*https://www.akhbaralaan.net/news/special-reports/2023/09/07/*

*22. أحمد كامل البحيري؛ الخلافة المخترقة: وثائق "داعش" المسرية ومقتل قيادات التنظيم؛ الناشر: مركز الأهرام للدراسات السياسية والاستراتيجية؛ تاريخ النشر: 2023.08.14م؛ الرابط:*

*https://acpss.ahram.org.eg/News/20976.aspx*

*23. أحمد سلطان؛ من هو القيادي الداعشي أبو سارة العراقي الذي قُتل في سوريا؟؛ الناشر: موقع أخبار الآن؛ تاريخ النشر: 2023.03.03؛ الرابط:*

*https://www.akhbaralaan.net/news/arab-world/2023/03/03/-*

*24. مجموعة من الروابط والهيئات الدعوية والعلمية السورية؛ بيان حول تصرفات تنظيم (الدولة الإسلامية في العراق والشام)؛ الناشر: موقع هيئة الشام الإسلامية، تاريخ النشر: 2013.12.21م؛ الرابط: https://www.islamicsham.org/letters/1431*

*25. مقابلة مع المدعوة (سارة) في مخيم روج الواقع في الريف الشرقي من مقاطعة قامشلو وتم اللقاء معها بتاريخ 2022.08.11م*

*26. SDF PRESS CENTER؛ قواتنا تتسلم الإرهابي "الفدعاني" للتحقيق معه بعد القبض عليه؛ تاريخ النشر: 2023.09.27م؛ الرابط: https://sdf-press.com/?p=40780*

*27. SDF PRESS CENTER؛ بيان عزل أحمد الخبيل؛ تاريخ النشر: 2023.08.30م؛ الرابط:*

*https://sdf-press.com/?p=40531*

*28. SDF PRESS CENTER؛ فيديو مصور عائد لإحدى كاميرات داعش يوثق الخوف في صفوفهم؛ تاريخ النشر: 2020.09.21؛ الرابط: https://www.youtube.com/watch?v=HD30l942dg0*

*29. الحدث AlHadath؛ "الحدث" في تغطية حصرية من مخيم الهول.. "دويلة داعش" داخل سوريا؛ تاريخ النشر: 2023.03.01م؛ الرابط: https://youtu.be/HjFAudGwM4c?t=297*

30. صباح كنجي؛ دور حزب البعث في الإرهاب الداعشي؛ الناشر: الحوار المتمدن؛ تاريخ النشر: 2019.03.16م؛ الرابط:

https://www.ahewar.org/debat/show.art.asp?aid=631257

31. عبد الله سليمان علي؛ زعيم "داعش" الجديد.. أبو المثنى الجنوبي أم أبو خديجة العراقي؟؛ الناشر: 180POST؛ تاريخ النشر: 2023.08.18م؛ الرابط: https://180post.com/archives/39454

32. فرات بوست EuphratesPost؛ الشيخ إبراهيم الهفل شيخ عشيرة العگيدات يطالب التحالف الدولي بتشكيل مجلس قيادة عسكرية؛ تاريخ النشر:2023.08.31م؛ الرابط: https://www.youtube.com/watch?v=YXiuADzJMmg

33. الموسوعة السياسية/ Political Encyclopedia

34. معجم المعاني الجامع - معجم عربي عربي (الإلكتروني)).

35. قاموس جامعة بيرزيت.

# Tundrewîya şîîtîyê

(2 ji 2)

**Yekem - Rêxistinên Ku Xwe Li Îdolojîya WîlayetûlfeqîhYa Îranî Digirin:**

Ev partî girêdayî koma Şîî ne û xwe li tîreya Duwazdehîmamî digirin, her wiha pabend e bi îdolojîya Xumeynî ya Wîlayetûlfeqîh û avakirina ferwerîyeke islamî ya cîhanî ya li jêr serwerîya wî ku xwe dispêre rêgeza bicihanîna ewlekarîya civakî ya şîî. Ev partî ne di encama çewisandineke olî yan tîreyî de, lê belê ji bandora bi bangeşeya îdolojîya Xumeynî û tişta bi navê Şoreşa Islamî, derketine pêş. Weke hemû rêxistinên islamî yên tundrew, xwe nûnerên Islama rast dibînin û ji bo pêkanîna pergala xwe ya siyasî, xwe dispêrin xeta Cihadê û destekdayîna birayên wan ên bawerîyê "Heresûsewrî" ya Îran î. Her wiha ew ji bo xwe Israîl, rêjîm û rêxistinên erebî yên selefî û Emerîkayê, dijminên sereke dibînin. Îmamê Xumeynî di semînereke xwe de wiha dibêje[1]: "Her rêjîmeke neislamî, şirk e û serwerê wê jî pût e û em di ber rakirina bermahîyên şirkê ji civaka xwe de, berpirsyar in, di ber avakirina hewayeke guncav bo perwerdekirin û mezinkirina nifşekî pak ku textê stemkaran hilweşîne û desthilatdarîyên wan ên ne rewa têk bibin de, berpirsyar in; ji ber ku jirêderketin û gendelî ji ber destê wan çêdibe. Rêya me ya tekane ew e ku em rêjîmên gendel û gendelbelav hilweşînin û serwerên gelan ên ku sembola xiyanetê ne, têk bibin. Ev jî erka her mislimanekî li her deverê ye, da ku şoreşeke islamî siyasî ya serkeftî ava bikin..". Em dikarin bawerîya siyasî ya van rêxistinên ku xwe dispêrin îdolojîya Xumeyinî bi vî awayî kurt bikin[2]: Islam -weke ku ew dibêjin- ketiye belaya cihû û hevalbendên wan ên ku bi navê Islamê bang dikin, her wiha mafê Alûlbeyt ên ku ji dola Elî Bin Ebî Talib in, ji bo xilafeta li ser tevaya mislimanan; mandele dikin. Ev kes Islamê ji hev dixin û wê têk dibin. Ji bo ku rê li pêşîya vê stemkarîyê were girtin û bi milyonana mirov kêfxweş bibin; divê ferwerîyên heyî werin hilweşandin û têkbirin; ew jî bi rêya avakirina ferwerîyeke islamî ya dilsoz ku bi zagona xwedayî

---

[1] Îmam Ruhullah El-Xumeynî (Lêvegera olî ya bilind); Hikûmeta Islamî; Dersên feqetîyê bo xwendekarên zanista olê li Necefê bi serenava "Wilayeta Feqetîyê" hatine dayîn, 13 Zî El-Qe'ide – 1 Zî El-Hica 1389 koçî; Bê weşanxane û jimara çapê. R43.

[2] Heman çavkanîya berê.

bike, pêk tê. Êdî ev yek pêwîsr dike ku fermanrewayeke (welîûlemir) hebe ku li ser rêzik û zagonên islamî bisekine û rê li pêşîya stemkarî, binpêkirin û gendelîyê bigire, her wiha berê xelkê bide rêya rast û rê li pêşîya xwedênenas û dijberan bigire. Ev fermanrewa cihê îmamê nepen digire -îmamê duwazdehem ê Alûlbeyt ku navê Mihdîyê Bendewar lê tê kirin- da ku karûbarên xelkê bi cih bîne, ew jî çawa bi dû pêxember û xelîfe Elî Bin Ebî Talib de dimeşin, divê bi dû wî de jî bimeşin). Lewre jî divê di zagon û dadmendîya islamî de feqeyekî serwext be; ji ber ku feqe -li gor bawerîya wan- di birêvebirina artêşan û civakê, parastina umetê û dadwerîya di navbera xelkê de, cêgirên pêxemberan e. Her wiha li cem wan hestê pabendbûna bi pêmaya berxwdêr a mezinê şehîdan Hisên -li gor pênasekirina wan- ku li dijî pergala qiralî û mîrzayî şoreş dest pê kir û di oxira vê rêgezê de canê xwe kir gorî, heye. Lewre ew pêkolîyê dikin ku divê ji vir heyanî hatina îmamê duwazdehem (Mihdîyê Bendewar) were, ferwerêyeke tewkratîk û şîî were avakirin ku ferwerîyê li tevahîya misilmanan bike, ji ber li gor bawerîya wan, nabe ku ferwerî û rêzikên Islamê rawestiyayî bimînin. Avakirina ferwerîyeke islamî jî pêdivîyeke ji bo cihadê, parastina mislimanan û misogerîya serxwebûn û rûmeta umetê ye. He wiha xwe wiha dibînin ku ji bo parastina reben û bindestan hatine erkdarkirin û divê cihada pîroz bikin li dijî stemkaran, xayin, heramxuran[3] û kesên ku malê hejar û bidestan dixwin û wan û çi kesê ku bi dewletên rojavayî û komunîstan re peymanên petrolê û bazirganîyê çêbikin, siza bikin; ji ber ku wan mîna xayin û sîxuran dibînin. Jixwe dijmin wan her hêzeke mêtinger û sîxurên wan weke ferwer, xayin, Siyonî (Israîl) û xwedênenas in. Di encamê de mirov dikare bawerîya siyasî ya Xumeynî wiha bide diyarkirin ku welîyêfeqiyê xwedî desthilatên qutebir in û heyanî ku îmamê duwazdehem (Mihdîyê Bendewar) were, ew mafdar e ku çi bi mal û mirovan bike û fitweyekê derxîne yan jî betal bike, siyaseta derve deyne û artêşê bi rê ve bibe, êdî çi kesê ku derveyî sînorên wan ên ramanî ye, weke dijmin tê dîtin û li pêşîya wî du rê hene; yan dê bibe şîî yan jî serê xwe ji desthilata wan re bitewîne û şîetkirina regeza xwe bipejirîne, yan jî dê hêdî hêdî were qirkirin. Her wiha bawerîya leşkerî ya artêşê jî ew e ku divê şerekî cihadî li dar bikeve, heyanî ku ev bawerîya siyasî bi cih were.

[3] Seht (Heram) li gor nêrîna şerîeta olî: Malê guhen û çi tişta ku xwarina wî ne helal e û her tişta guneh ku bi awayekî nebaş hatiye behskirin e. Hat gotin: Çi destkeftîya pîs e yan jî tişta guneh a bi destxistina wê nayê helallkirin e. Dîsa hatiye gotin: Reşwe di hukman de… Ferhenga wateyan (Elektrolnîk); wateya Seht di Qurana pîroz de.

Diyar e ku serbazgeha dewletên Rojavayî di serdema şerê sar de, ev yek ji bo xwe delîveyek dît ku bi rêya çêkirina nakokîyên tîreyî, desthilatdarîya xwe di herêmên ku tê de desthilatên Soviyêtê geş dibe de, xurt bike. Her wiha bi armanca hevsengkirina pêşketina netewperestîya erebî û tundrewîya sunnî bi tundrewîya şîî re ya di çarçoveya stratejîya tevlîhevîya avaker de, ev yek da meşandin.

Gelek rêxistinên şîî yên li Iraq, Libnan û Yemenê, bi destekdayîna pergala pergala Wîlayetûlfeqîh di van herêman de desthilatên xwe yên îdolojî geş kirin ku êdî îdolojîya Xumeynî li ser bawerîya siyasî û şer a van rêxistinan bû serdest. Nemaze Hûsî û Hizbûlaha libnanî û iraqî û bi dehan rêxistinên şîî yên li jêr alsa Heşidûlşaibî ya Iraqî de, mîna Asayibûlheq, Tevgera Nuciba û her wekeî din[4].

**1- Hizbullaha Libnanî:**

Di vê çarçoveyê de, piştî ku bû rêxistineke ku sînoran derbas dike, weke nimûneyeke serkeftî tê dîtin. Hizbullah di nava şerê erebî–israîlî de û dema şerê navxweyî û êrîşa israîlî li ser başûrê Libnanê di destpêka salên heştêyî de, ava bû. Hêza wê jî ji ber bawerîya wê ya şerkirinê ya cîhdî û destekdayîna mezin a ji alîyê Heresûsewrî ya Îranî ve, geş bû. Ew jî piştî ku xwe spart rêxistinkirina Gurdanên Berxwedana Libnanî ku bi navê Tevgera Emel tên nasîn û alîyê çekdarî yê Tevgera Rebenan a ku îmam Mûsa El-Sedir sala 1978'an dabû avakirin, bû. Ji wir êdî ber bi meşandina rêbazeke xwe ya taybet ve meşiya; ku xwe dispêre nasnameya niştimanî erebî ya libnanî, şerê li dij çavnebarîyên Israîlê bo xaka Libnanê, başkirina rewşa jiyanî ya şîîyên Libnanê û dûrketina ji şerên tîreyî yên herêmî. Di navbera herdu rêxistinan de gelek şer û pevçûn derketin, şerê herî navdar jî "Şerê birakujîyê" bû ku ji sala 1988'an heyanî 1990'î dewam kir û bi navbeynkarîya Sûrî-Îran dawî lê hat. Di encama wê de hêza leşkerî ya tevgera El-Emel gelek ziyan dît û li hemberî wê jî serdestîya Hizbullah li ser şîîyên Libnanê xurtir bû. Îdolojîya tundrew a Hizbullah û xwedî şêweyê şoreşger, di demekê de ku gelê Libnanê rastî destwerdana dewletên rojavayî û êrîşên Israîlê dihat, rakêşaneke mezin bo tundrewên şîî çêkir. Bi destekdayîna saloxgêrî ya

[4] Ji bo ku hûn nexşeya belavbûna rêxistinên şîî li Rojhilata Navîn binasin, li vê vegerin: Philip Smith; Projeya amadekirina nexşeyekê cihên belavbûna milîsên şîî; weşan: Peymangeha Waşintonê ya lêkolînên Rojhilata Jêrîn; Dîroka weşanê: 20-5-2019; link: https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/mshrw-adad-khartt-bmwaq-antshar-almylyshyat-alshyyt

sûrî û Îran î, partîyê li jêr durişmeya “Berxwedana li dijî hêzên israîlî yên dagirker û hêzên pirregezî yên bi serkêşîya Emerîkayê, cihad ragihand. Li gor wê jî rêze-operasyonên fedayî li dijî van hêzan pêk anîn û ya herî berz jî teqîna li dijî hêzên Marenz û firqeya paraşûtan a fransî li Beyrûtê sala 1983’an bû, ku di encamê de bi dehan kuştî û bi sedan birîndar di nava van hêzan de çêbûn. Piştî ku hêzên israîlî û hevkarên wan artêşa Libnana başûr[5] neçarî vekişandina ji piranîya xakên başûrê Libnanê kirin, êdî bû hêza sereke di berxwedana libnanî de. Bi vê yekê re hêza wê ya leşkerî û pisporîya wê ya şer pir bû û hezkirina gelêrî di nava Libanê de jê re bêhtir bû; ku di şerê tîrmeha 2006’an ê bi Israîlê re gihaşt lutkeya xwe. Hêza partîyê gihaşt wê astê ku êdî dikare jiyana siyasî û aborî ya Libnanê rawestîne, şer ragihîne û bi artêşa Israîlê re jî bikeve nava şer û pevçûnan de, her wiha dikare destwerdanê di alozîyên dewletên herêmî de jî bike.

Di bawerîya xwe ya siyasî de xwe dispêre îdolojîya Xumeynî û sji bo desthilata şîaya Libnanê bi tevgera Emel re di nava hevrikîyê de ye. Tevgera Emel xebata xwe ya siyasî û leşkerî di nava Libnanê de dike, lê belê Hizbullah weke rêxistineke ku sînoran derbas dike û makezagon û serwerîya dewleta Libnanê paşguh dike tê nasîn. Mîna tişta ku Heresûsewrî ya ku bi rêya Feyleq El-Şam dike, heman tiştî dike. Di çarçoveya alozîya ku li Sûrîyê pêk tê de, ji bo parastin û hiştina rêjîma Sûrîyê li ser desthilatê rolek lîst. Li kêleka wê jî li Yemenê destek da Hûsîyan û li Iraqê jî da Heşd El-Şeibî. Endamên Hizbullaha Libnanî di navbera nasnameya girêdana bi Libnanê ve û pergala Wîlayetûlfeqîhde diçin û tên. Bi serkêşîya şêx Ehmed El-Esîr şerê selefîyên Libnanê kir. Her wiha ev partî bi tawanên siyasî hat tawanbarkirin; mîna kuştina serokê Libnanê Refîq El-Herîrî sala 2005’an û teqîna keştîgeha Beyrûtê ya havîna 2020’an. Jixwe partî van tawanbarîyan red dike û wan wekeî şerekî derûnî yê li dijî xwe bi nav dike.

**2- Rêxistina Bedir:**

Ev rêxistin sala 2004’an piştî ku meyla hinek rêberên Feyleq El-Bedir bi ser îdolojîya Wîlayetûlfeqîhve çû, mîna Ebû Mihdî El-Muhendis û Hadî El-Amirî û ji

[5] Her wiha bi navê “Artêşa Lehid” jî tê nasîn. Milîs in; ku sala 1978’an li bajarê Merciyûn bi destekdayîna Israîlê, ji zarokên gundên başûrê Libnanê û yên ku ji artêşa Libnanê û komikên berxwedana Filestînê veqetiyabûn, hatin avakirin. Yekemîn fermandarê wê Raid Seid El-Hedad û piştre jî Intiwan Lehid bû. Beşdarî gelek şerên li dijî artêşa libnanî, Hizbullaha libnanî û komikên berxwedana Filestînî bûn. Sala 2000’î piştî ku Israîl ji başûrê Libnanê vekişiya, hatin tunekirin.

bilî wan, hat damezirandin. Sala 2012'an jî rêxistin ji encumena islamî ya bilind veqetiya û rêxistineke xwe ya siyasî ava kir. Ji vê rêxistinê gelek rêxistinên şîî yên tundrew derketin û ya herî berz jî Hizbullaha Iraqî ye. Rêberên vê rêxistinê di sazîya Heşd El-Şeibî ya ku ji piştî beşdarbûna di şerên li dijî DAIŞ'ê de ji alîyê saloxgêrî û ewlekarîyê ve gelek deverên başûr û naverasta Iraqê kontrol dike ve, cihên rêveberî yên girîng digire. Ev rêxistin bi tevî şaxên wê yên siyasî û leşkerî xwe li îdolojîya Wîlayetûlfeqîhdigirin û bêtir girîngîyê didin şerê li dijî alîyên ku Heresûsewrî ya Îranî dijminatîya wan dike.[6] Piştî ku di şerê wê yên li dijî alîyên rikberîyê yên cihêreng de destek da rêjîma Sûrîyê, êdî bû rêxistineke ku sînoran derbas dike. Ev yek êdî di mijara pabendîya bi nasnameya niştimanî ya iraqî de kêşeyekê derdixe holê, nemaze ku di salên destpêka avabûna wê de, ji alîyê xeta Sederî ve hin helwestên nerehet li dijî vê rêxistinê derketin pêş. Di axaftineke serekê şîî Muqteda El-Sedir de ku hevdemî şerê di navbera alîgirên wê û hevpeymana dewletên rojavayî de û berîya ku rêxistin ji Feyleq Bedir veqete, li mizgefteke Kûfayê[7] gotibû ku: " Ji bo fitneyê bi taybet ez behsa Feyleq Bedir a ku di serdema stemkar de piştevanê herî mezin ji bavê me yê rêzdar re bû, dikim. Gelo çi çêbû? Ez nizanim çima terazû qulibî, xwedê dizane… ez ji wan dixwazim ku xwe li derdora vê mijarê bigerînin, nemaze ku dijmin hin ajanan berdide nava artêşa me ya serkeftî û piştî ku me ew nas kirin gotin ku ew girêdayî Feyleq Bedir in… ez vî tiştî bawer nakim. Ev gurkirina agirê fitneyê di navbera me de ye, xwe lê bikin xwedî".

**Du: Rêxistinên ku heyanî astekê pabendîyê bi nasnameya xwe ya niştimanî dikin:**

Eger em tevaya rêxistinên Şîayê wiha bibînin ku di bin kontrola pergala Wîlayetûlfeqîhde ne, dê ne tam rast be, Ji ber kugelek tîreyên wê hene dev ji îdolojîyên xwe yên siyasî berdane; mîna Ismaîlî, Elewî û Zîdî û ketine nava rewşa siyasî ya welatê xwe de. Her wiha gihiştine lutkeya desthilatdarîyê jî, mîna ku li

[6] ji bo ku bêtir hûn binasin li vê vegere: Michael Nites û ji bilî wan, danasîneke giştî li ser "Rêxistina Bedir", weşan: Enstîtûya Waşintonê ya lêkolînên rojhilata jêrîn, dîroka weşanê: 2/10/2021. Link: https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/lmht-amt-n-mnzmt-bdr

[7] Necah Mihemed Elî, Danasînek li ser Rêxistina Bedir, Weşan: Malpera SWI swissinfo.ch, Dîroka weşanê: 3-6-2005, Link:https://www.swissinfo.ch/ara/

Sûrîyê çêbûye. Gelekan jî di jiyana xwe ya siyasî de zanistdarî pejirandiye, heyanî gihiştiye asta ku hin ji wan rêvebertîya partîyên xurt dikin; mîna Partîya Gel a Komarî ya Tirkî (CHP). Li kêleka wê jî Ismaîlîyetê girîngî daye pêkanîna xebatên alîkarîyê yên li ser asta navdewletî, mîna ***Tora Axa Xan*** a Navdewletî ya Geşepêdanê. Her wiha Zîdî jî di avakirina dewleta Yemenê de xwedî roleke mezin bûn; jixwe tê zanîn ku Hûsî şaxek jê bû, jê veqetiya û êdî îdolojîya Wîlayetûlfeqîhmeşand. Der barê şîîyên Dwazdeh Imamî de; navê Muqteda Sedir weke serekekî şîî yên ereb û Seyid Elî El-Sîstanî weke lêvegereke şîî derdikevin li pêş. Weke tê diyarkirin ew herdu jî pabendîyê bi Wîlayetûlfeqîhnakin, lê pabendîyê bi nasnameya niştimanî ya iraqî dikin û ta niha tu axaftineke îdolojî ji derveyî sînorên Iraqê ji wan derneketiye. Der barê lêvegera (Qim) a Îranîde, divê Wîlayetûlfeqîhheyanî dawîyê destê wê di dewletê û pergala civakî, giyanî û aborî de hebe. Her wiha der barê lêvegera (Necefê) ya iraqî de jî, tenê di çarçoveya Hisbayê de dikare destê xwe dirêj bike; mîna gava ku xelk dev ji pêkanîna başîyê berdidin, xirabîyê pêk tînin, di çarçoveya şerîeta olî de xelkê li hev tînin û parastina pergala dikin. Her wiha tu hewldaneke wan bo avakirina dewleteke tîreyî tune ye.

Muqteda Sedir ji fermandarên şîî yên erebî yên herî çalak tê nasîn. Her wiha rêxistina çekdar a alîgirê wî jî Rêxistina Artêşa El-Mihdî ye ya ku dawîya sala 2003'yan ji bo parastina herêmên şîî di çarçoveya xweparastinê de, hat damezirandin. Êdî piştre veguherî berxwedaneke dijî desthilatdarîya hevbendîya ku rêjîma Iraqê hilweşand û jê xwest ku êdî ji Iraqê vekişe. Her wiha avakirina dewleteke zanistdarî mîna dewletên rojavayî yên ku rêxistin bi binpêkirina mafên mirovan der heqê sunnî û karmendên ferwerîê de tawanbar kir, red dike. Di navbera herdu alîyan de pevçûn heyanî sala 2008'an dom kirin ku di encamê de gelek kuştî û birîndar ji herdu alîyan çêbûn. Alîyê rêxistinê yê bawermendî di navlêkirina wê de diyar dibe; ji ber kuew wiha li xwe dinêrin ku navika artêşa Mihdîyê Bendewar in. Ev rêxistin li başûrê Iraqê ji alîyê gel ve gelekî tê hezkirin û di damezirandina Heşd El-Şeibî ji bo şerê li dijî DAIŞ'ê de xwedî roleke çalak bû, her wiha serwerîyeke şîî ya leşkerî li piranîya herêmên iraqî yên erebî bi dest xist. Xeta Sedirî di bawerîya xwe ya siyasî de hestekî şîî yê erebî derdixe pêş, li gor wê jî red dike ku bi temamî xwe bixe bin serwerîya Heresûsewrî ya Îranîû dixwaze têkilîyin aştîyane pê re deyne. Her wiha hebûna hêzên biyanî li ser xaka Iraqê jî red dike. Bi mezinbûna hêza DAIŞ'ê sala 2014'an û serdestîya wê ji herêmin berfireh ên Iraqê re, xeta Sedirî di bin navê "Seraya

El-Selam” de hêzeke nû damezirand; ku di nava armancên wê de parastina peyrew û navendên olî yên Şîayê yên li Iraqê bû. Bi ragihandina avabûna Heşd El-Şeibî ku bi fitweya Cihada Xwebesîyê[8] (Cihad Kifaî) ya ji alîyê lêvegera şîî ya bilind li Iraqê Seyid Elî El-Sîstanî ve hatiye derxistin; ku ew bi xwe fitweyeke sembolîk a niştimanî bo iraqîyan e û wan bi fitweya Cihada Xwebesîyê ya ku Ayetullaha Mezin Şêx Mihemed Teqî El-Şîrazî di şerê li dijî Brîtanyayê sala 1920’an de tîne bîra wan re, êdî rêxistinê xwe tev li nava refên wan kir û beşdarî piranîya şerê li dijî DAIŞ’ê bû. Diyar e ku xeta Sedirî karîbû bi rengekî din û awayekî neyekser, rêxistina xwe ya leşkerî (Artêşa Mihdî) ji nû ve vejîne.

- **Bawerîya Siyasî[9]:**

Rêxistinên Şîî hewl didin ku rasteqîneke siyasî ku misogerîya serxwebûn û taybetmendîya wê ya çandî li welatên wan dike, ava bike. Her wiha hewl didin li gor rêgeza ewlekarîya komî “Êrîşa li dijî yekî tê wateya êrîşa li dijî hemûyan[10]” hemû ked û şiyanên xwe bixin nava hevrêzîyekê. An ku hemû komên şîî bi awayekî hevpar beşdarî parastina ewlekarîya xwe bikin. Lê belê hîn jî di nava xwe de hin kînên dîrokî yên berê, nemaze bi komên Sunnayê re dihewînin, ev jî di hin boneyên şîî yên olî de diyar dibe. Ev yek bi xwe re ji bo pêkvejiyana bi cîhanê re û nemaze bi peyrewên Sunnayê re, zehmetî hebin. Ji vê yekê bêtir, hewl didin ku serwerîya xwe ya olî bisepînin ku xwe wekee wêneyekî rastîn ê Islama rast dibînin; lewre avakirina ferwerîyeke islamî ya li gor feqetîya şîî, red nakin. Jixwe hinek kom hene ku vê yekê weke cewhera îdolojîya xwe dibînin, mîna yên ku xwe li îdolojîya Wîlayetûlfeqîhgirtine.

[8] Cihada Xwebesîyê li gor nêrîna Şiayê, cihadeke wiha ye ku eger hejmareke pêwîst pê rabe dê erk ji ser milê yên din rabe û dê ji hemûyan erk be heyanî hejmar bigihêje asta tê xwestin. Lê belê Cihada Eyinî ew cihad e ya ku erka her kesî û divê ji bilî kesekî xwedî bihaneyeke şerîî, beşdarî vê cihadê bibe. Berîya niha jî lêvegerên şîî mîna vê fitweyê derxistiye; ew jî di dema êrîşa Brîtanyayê li ser Iraqê ya 1920’an bû ku ji alîyê Ayetullah a Mein Şêx Mihemed Teqî El-Şîrazî ve hat derxistin… Mihemed Seîd El-Mexzûmî, Eger çihad cihada Eynî ne ya Xwebesîyê be, dê çi bibe; Weşan: Tora Nebei a kompyûterê, Link: https://m.annabaa.org/arabic/authorsarticles/2519

[9] bawerîya siyasî, bi awayekî gelemperî tê wateya siyaset, helwest an jî rêgeza ji bo xwegihandina desthilatdarîyê yan jî hikumdarîya li ser civakê û birêvebirina karûbarên wê li serê dimeşin, didin hînkirin an jî bi cih tînin.

[10] Zanistnameya siyasî (Elektronîk); Ewlekarîya Komî – Collective Security; link: https://political-encyclopedia.org/dictionary/%D8%A7%D9%84%D8%A3%D9%85%D9%86%20%D8%A7%D9%84%D8%AC%D9%85%D8%A7%D8%B9%D9%8A

Tê diyarkirin ku bawerîya siyasî ya van rêxistinan li dor kopîkirina ezmûna Hewres El-Sewrî ya Îranîdigere; ku dixwazin hêzên xwe yên leşkerî û ewlekarî yên xwedî şêweyê tîreyî ava bikin, ji derveyî hêzên fermî yên welatê xwe hêzên xwe ava bikin, her wiha red dikin ku çekê deynin û bi temamî xwe bixin jêr serwerîya desthilatên welatên xwe. Ev yêk êdî li ser welatên ku ev rêxistin tê de hene bûye metirsîyeke stratejîk û ewlekarîya wan a niştimanî dixe nava gefan de. Ji alîyekî din ve jî, her rêxistinek hewl dide ku komeke xwe ya siyasî ava bike û bi wê beşdarî hilbijartinên welêt bibin; da ku serwerîya xwe ya siyasî misoger bikin, her wiha misogerîya aborî bo peyrewên xwe ji derveyî desthilata welatên ku lê ne, bikin.

Der barê rêxistinên ku heyanî astekê alîgirîyeke rêjeyî bo nasnameya xwe ya niştimanî dikin de, ew wekee bersivdayînekê li hember gefên tîreyî yên ji alîyê partîya Beis a iraqî û rêxistina El-Qaide û DAIŞ’ê li dijî pîrozî, bawerî, nîşane, mezargeh û bajarên wan, derketine pêş. Lewre jî bawerîya wan a şer jî li derdora xweparastina bo bawerîyê û parastina tîreya şîî digere. Tê zanîn ku dêlizndêz û rêûresmên bÎran îna Kerbela û Aşûrai’ê û bÎran îna komkujîyên ku di sedsalên berê de rastî wan hatine, li cem wan rihê tolhildanê xurt dike û meyla tundrewîyê geştir dike. Her wiha pabendîya bi lêvegerên olî û şêweyê aştîya rêjeyî di fitweyên wan de, xala ewle ya vê meylê ye. Ev lêveger daxwaz dikin ku rêxistinên şîî yên çekdar bikevin nava hêzên çekdar ên welatê xwe, ew jî piştî rabûna metirsîya ku ji bo wê hatine avakirin, divê pêk were. Jixwe ev bi xwe ye ya ku lêvegera Necefê tekezîyê li ser dike; ew jî li gor pabendîya bi madeya (9)’an a makezagona Iraqê[11], nemaze bendên (A) û (B) re, tê tekezkirin. Her wiha alîyê din daxwaz dike ku ev rêxistin divê weke sazîyeke serbixwe[12] li kêleka hêzên çekdar ên welêt bimînin û budceyek ji wan re were terxankirin.

---

[11] Madeya (9):

a. Hêzên çekdar ên Iraqê û dezgehên ewlekarîyê ji pêkhateyên gelê Iraqê pêk tên, ew jî li gorî hevsengî û nûnertîyê bê cudayî yan paşguhkirin. Girêdayî desthilata sivîl e û parastina Iraqê dike. Nabe ki bibe alaveke çewisandina gelê Iraqê û destêwerdanê di karûbarên siyasî de nake û tu roa wê di meşandina desthilatdarîyê de tune ye.

b. Avakirina milîsên leşkerî ji derveyî çarçoveya hêzên çekdar qedexe ye.

Makezagona Iraî, dikarin li ser vê linkê bixwînin: https://investpromo.gov.iq/ar/policies-and-laws/iraqi-constitution/

[12] Rênad Mensûr – Falih Ebdicebar; Heşda Şeibî û siberoja Iraqê; weşan: Navenda Malkûm Gîr – Karêngî a Rojhilata Navîn; 28 nîsana 2017, link: https://carnegie-mec.org/2017/04/28/ar-pub-68812

- **Bawerîya Leşkerî[13]:**

BÎran îna binpêkirinên ku rastî wan hatine û mîrateya kevneşopîya gelêrî ya li cem Şîayê, mîna çîrok, bÎran în û destanan, li cem peyrewên wê wêneyê dijminekî hovane diafirîne. Her wiha hişmendîya şer, bi moral û hestên li gor nêrîna tîreyî rewa, têr û tijî dibe. Ev yek bi xwe re kesayeteke ku ji tundîya girêdayî tundrewîyê re vekirî ye, ava dike. Êdî bi vê yekê mirov dikare, hêza komên fedayî yên Hizbullaha Libnanî, tevlêbûna hezarên iraqîyan di nava Heşd El-Şeibî ya ji ber derketina fitweya xihada xwbesîyê bê ku tev li artêşa Iraqê bibin, her wiha rakêşana Heresûsewrî ya Îranîya li cem piranîya Şîayê, tê bigihêje.

Der barê rêxistinên ku xwe li îdolojîya Wîlayetûlfeqîhgirtine de, bawerîya wan a leşkerî ji ya li cem Heresûsewrî ya Îran î, hem ji alîyê dabeşkirina dijminan û cureyên çekên ku di şer de bi kar tînin û hem jî ji alîyê tektîkên leşkerî û awayê bawerîya şer ve, cûda nabe. Ev koma han, navê xwe kiriye "Tewereya Berxwedanê" li dijî desthilatên Emerîka û Israîlê ku di li herêmê ne û weke hêzên pozbilind ên cîhanî têne nasîn. Her wiha bangeşeya xwe dike ku ew parastina lawazan mîna karker, hejar û yên paşguhkirî ku ji alîyê desthilatên xwe ve rastî stemkarîyê tên, dike. Her wiha dibîne ku; sepandina desthilatîya xwe li ser wan tê wateya rizgarbûna wan ji azaran.

Ev rêxsitin di reftar û çalakîya xwe de, xwe dispêrin stratejîya Şerê Duliqî û Herêma Gewr[14]. Mînak; hinek hene vekişandina hêzên Emerîkayê ji Iraqê bi zêdebûna êrîşên bi moşekan ên ji alîyê rêxinin şîî yên veşartî ve li ser bargehên

[13] Bawerîya leşkerî: hemû rêgez, siyaset û dozên teknîkî yan jî rêbazên ku li gor wan hêzên leşkerî yan jî endam li ser wan karên xwe araste dikin. Ew bi xwe ji ramanên kûr û pêşketî yên ku li ser li hev hatine, derdikevin.. Serheng Samî El-Ewed, Ferhenga têgihên leşkerî, çapa yekem 2008, Weşanxaneya Usama – Uman / Urdun, D 356.

[14] Şerê Piralî derbirîna çalakîyên windayî yan jî yên ku têne mandelekirin e û ji alîyê hêzên klasîk an jî yên nuklerî tê destekkirin. Armanca wê ew e ku li ser siyaseta hundirîn a dewletên armanc bandorê bike. Li gor danasîna Frank Hofman; şerê piralî têkelek ji rêbazên klasîk û yên nefermî ye ku ji bo bidestxistina armancên siyasî pêk tê, yan jî têkelek ji tektîkan e, yan jî dijminekî ku di heman demê de têkelekê ku ji bikaranîna çekên klasîk, tektîkên nefermî, teror û reftarên tawanî bi kar tîne û di heman dema şer bi xwe de vê yekê dike da ku armnacin siyasî bi dest bixe… Andrû Radin. Şerê Piralî yê li herêma Beltîq (Gef û bersivdayînên texmînkirî), Navenda RAND a lêkolînan, Kalefornya, 2017, Link: https://www.rand.org/content/dam/rand/pubs/research_reports/RR1500/RR1577/RAND_RR1577z1.arabic.pdf

wan ên leşkerî, yan jî amadekarîya Hizbullaha libnanî bo pêkanîna şerekî li dijî Israîlê bêyî ku Îran bi awayekî yekser destêwerdana leşkerî bike ve, girê didin. Heman tişt der barê Hûsîyan û pêkanîna şerekî li dijî Erebistana Siûdî de, derbasdar e. Çi şerekî vekirî ku artêşa Îranê bi van herdu dewletan re pêk bîne, dê ev rêxistin çeperên pêşîn ên şer bigirin. Lewre em dibînin ku ev rêxsitin bêtir moşekên xwe zêde dikin, her wiha balafirên bêmirov, antî mertal û balafiran bi dest dixin; li gor vê jî xwe ji şerê komikan ê klasîk dûr dixin. Ev rêxistin wiha bawer dikin ku zêdekirina hêza çekan a tektîkî dikare bi çekên dijminên wê yên pêşketî re hevsengîyekê çêbike. Her wiha mijara heybeta artêşa dijmin a parastina welatî, leşker û navendên xwe yên jiyanê ku pê destkeftîyên giyanî bi dest dixe, keysbaz dikin. Mînak; di şerê Tîrmehê yê 2006'an de mijara parastina sivîlan û qurbanbûna bi dehan sivîlên Libnanê, bû kaxezeke fişarê ya herî mezin ku êdî Israîl bi Hizbullah re agirbestê bipejirîne. Ji alîyekî din ve jî, her demekê navê hin rêxistinin nepenî derdikevin holê û bombebarandina li ser baregehên Emerîkayê li Iraq û Sûrîyê li xwe digire, mîna Liwa Fatih Xeyber, Ketayib Ehil El-Kehif, Berxwedana Gelêrî ya rizgarkirina herêma rojhilatê Sûrîyê û ji bilî wan jî.

Der barê rêxistinên ku xwe li nasnameya welatê xwe digirin de jî, bawerîya wan di çarçoveya xweparastinê û destekdayîna hêzên çekdar ên welêt di dema şer de ye û gava ku ferman ji alîyê fermandarîya leşkerî ya welêt ve derdikevin, êdî çekê datînin. Vê yekê di hemû daxuyanîyên xwe yên di vê babetê de eşkere dikin[15]. Bi tevî vê yekê jî êdî iraqîyan zehmetî dît ku vê yekê li welatê xwe pêk bînin. Pergala federal a welêt û êrîşên DAIŞ'ê sê sazîyên leşkerî yên fermî bi xwe re derxistin holê, ew jî artêşa Iraqê, hêzên Pêşmerge û hêzên Heşd El-Şeibî ne. Êdî ji bo helandina Heşd El-Şeibî yan jî tevlêkirina wê di nava artêşa Iraqê de, redkirin li ba dibin û xwestekên ji bo ku mîna hêzên Pêşmerge yên kurdan bibin hêzeke federal a taybet bi başûrê Iraqê ku piranîya wê Şîa ne, nemaze piştî ku artêşa Iraqê nikarîbû xwe li ber êrîşên DAIŞ'ê bigire. Êdî Şîayê bawer kir ku divê xwe û pîrozîyên xwe bi rêya wê sazîya xwe ya leşkerî ya taybet biparêzin.

- **Stratejîya Ku Hiştiye Toreke Rêxistinên Şîî Yên Tundrew Were Avakirin:**

Êdî tê zanîn ku li her herêmeke ku demografîyeke rêjeyî ya şîî di nava xwe de dihewîne, nabe ku rêxistineke siyasî yan jî leşkerî ya şîî nebe. Ji ber ku li piranîya

---

[15] Ji van daxuyanîyan, daxuyanîya berdevkê Heşda Şeibî Ehmed El-Esedî:
El-Esedî: Bawerîya Heşda Şeibî xuyayî ye, ew jî parastina Iraqê ye, weşan: Dengê Iraqê, Dîroka weşanê: 24/4/2017, Link: https://www.sotaliraq.com/2017/04/24/

dewletan weke kêmînîyan in û rastî kînên tîreyî, çewisandin û mandelekirinê tên, êdî pêkara sereke ya bawerîya wan a siyasî û leşkerî xweparastin e.

Hêza rêxistinên şîî yên tundrew di destpêka destsala 21'ê de geş bû; ew jî ji ber destekdayîna madî, giyanî, leşkerî û ewlekarî ya mezin ku ji Heresûsewrî ya Îranîve ya di çarçoveya "Stratejîya ewlekarîya komî ya şîî" de bi dest xistiye. Her wiha li beramber xurtbûna hêza rêxistinên sunnî yên tundrew jî wekee bertekekê derketiye pêş. Li kêleka vê jî pêşketin di warê hevpeywendî û zanyarîyan de çêbûye û zanebûneke wiha li pêş ketiye ku divê sedemên hêzê hebin ku civaka şîî ji çewisandinê û desthilatdarîya kesên din biparêzin, her wiha taybetmendîya tîreyî û çandî jî biparêze. Bi tevî ku pêkara xweparastinê ji van rêxistinan re stûna sereke ye, lê belê xwestekên hin fermandarîyên wan dihêle çi delîveyeke ku bi dest wan bikeve, wê ji bo desthilatdarîya li ser welatê ku tê de ne, bi kar bînin. Nimûneya vê yekê jî li Yemen, Libnan û Iraqê eşkere ye. Her wiha ew di şerê piralî yê ku Îran li dij dijminên xwe pêk bîne de, hêmanên sereke ne.

Tu hejmareke tekûz a endamên van rêxistinan tune ye, lê belê derxistina fitweya xwebesîyê misogerîya wê yekê bû ku bihêle bi dehhezaran kesên dikarin rahêjin çekê tev li wan bibin, lê dayîna hejmareke tekûz pir zehmet e. Der barê tevlêbûnê de jî tê diyarkirin ku piranîya fermandarên wan berê xwe da zanîngehan û lêvegera Qum a Tehranê. Her wiha ev yek xwe dispêre handana giyanî ya bawerîyê di serê wan de ku berê di navendên olî yên civakên şîî yên xwecihî de pêk anîne. Piranîya alên van rêxistinan li ser wan destekî bi çekê girtiye û li pişta wê goga zemînê heye; ku ev yek di bingeha xwe de amajeyê bi Heresûsewrî ya Îranîdike.

Der barê perekirinê de jî, ev rêxistin pereyên xwe ji alîkarîyên civakên ku wan dihewînin bi dest dixin û li kêleka wê jî Heresûsewrî ya Îranîjî wan destek dike. Hin rêxistinan dikarîbû jêderên xwe yên perekirinê yên taybet çêbikin; ew jî bi rêya karên bazirganîyê, mîna ku di ezmûna Hizbullaha libnanî de derket holê. Lê belê der barê bazirganîya tiştên qedexe de jî, ew mîna bangeşeyeke reş li dijî van rêxistinan e. Lê bi tevî vê yekê jî, bi rêya fitweyên olî yên mîna (Sûdgirtina ji pereyên gawiran) û fitweya (Firotina jehrê ji gawiran re) ku ji alîyê feqeyên

rêxistinên sunnî yên tundrew ve hatine derxistin, têne rewakirin[16]; ku li beramberî vê yekê jî diyardeya (Tehfîş)ê ya ku ji alîyê hêzên rêjîma sûrî û hevalbendên wan ve li pêş ketiye, heye. Bi vê yekê hêzên rêjîmê ji mafê xwe dibînin ku mal û mewdanên welatîyên koçber, penaber û reviyayî bi dest bixin; an ku ziyana ku digihêje kesekî derveyî îdolojîya rêxistineke tundrew, divê ne tenê di warê kuştin û ziyana bedenî de be, lê belê divê hemû mal û mewdanên wî werin helalkirin û ziyan bigihêje statuya wî ya ramanî û derûnî jî.

Lewre jî diyar dibe ku hêza rêxistinên şîî yên tundrew di nava pêşketin û geşbûnê de ye û hîn jî negihiştine wê lutkeya berî paşdeçûnê; ji ber kuew li beramberî pêşketina tundrewîya sunnî û xwesteka gelan bo ezmûna demokrasîyê ku tu caran li welatê xwe pêk neanîne û rastî dijayetîya keysbazên ku li berdewamîya desthilatdarîya xwe digerin, her wiha pêkolîya rêjîma Îranê bo globalkirina îdolojîya xwe ya Wîlayetûlfeqîhû veguhgerandina wê bo hêzeke herêmî û piştre cîhanî ya xwedî çekên nukleri, bi pêş dikevin. Êdî Îran bi vê yekê dixwaze ezmûna Soviyetê ya li welatê jêr serwerîya komunîstan û rêjîmên girêdayî wan, li gor îdolojîya Xumeynî pêk bîne.

Ji bilî rêxistinên ku berîya niha me anîne zimên, ev jî nav û hin agahîyên der barê hin rêxistinên şîî yên tundrew ên ji tîreya duwazdeh îmamî ne:

---

[16] Sûdgirtina ji pereyên gawiran, rêzikeke feqetîyê ya rêxistinên cîhadîst e ku bi rêya wê dizî, talanî û şêlandina kesên ji wan re "gawir" tê gotin têne helalkirin. Bi rengekî din mirov dikare wê cureyek ji yên xenîmeyên şer bibîne; çi ku şerê di navbera van rêxistinan û cîhanê de ne tenê li ser şerê rû li rû ye… Ji bo zêdetir bibînin li vê vegerin: Zibêr El-Xezî, Gotina rast di mijara Sûgirtinê de, weşan: Malpera Camih a pirtûkên islamî, dîroka weşanê: 13-8-2017, Link: https://ketabonline.com/ar/books/67008/read?part=1&page=2&index=5291144
Der barê fitweya "Firotina jehrê ji gaiwr re" feqîyên rêxistinê ji fitweyeke ku vedigere ji Ibin Teymîyê re ku firotina meyê ji Teterên ku êrîşî herêmê kiribû, hukim danîbû, li gor wê jî dibêje: "Lê ji bo gawiran, birina hişê gawir hem ji wî re û hem jî ji mislimanan re xêr e; çi ku wî ne ji rêya xwedê û nimêjê derdixe, lê wî ji gawirî û fisqê dûr dixe, lê ji bi mislimanan jî, ji ber ku di navbera wan de dijminatî û kînê çêdike, ew dibe xêrek ji bawermendan re. Ev nayê wateya ku mey helal e, lê belê ji bo dûrxistina şerê herdu şeran e. Lewre jî min ferman dida hevalên me ku meyê ji ser dijminên mislimanan, mîna Teter, Kerec û ji bilî wan qedexe nekin, her wiha ez dibêjim: Eger vexwin ew wan ne ji rêya nimêj û xwedê derdixe, lê belê ji gawirî û gendeleya li ser erdê dûr dixe, di navbera wan de dijminatî û kînê çêdike û ev yek ji xêra mislimanan re ye, lewre bihêlin ku ji serxweşîya xwe hişyar bibin. Tu xêr tê de tune ye ku destekê bidin wan da hişyar bibin, lê belê çêdibe ku şerê van kesan bi rêya serxweşîyê û ji dilî wê dûr bixin…" Zanistnameya El-Istiqamê, Link: https://mawsoati.com/origin/

## 1. Rêxistina Liwa Zeynebûn a Pakistanî:

Navê rêxistinî “Liwa Zenebûn” e, sala 2015’an piştî ku hejmara cîhadîstên şîî yên pakistanî di nava Liwa El-Fatimîyûn de zêde bûn, li Sûrîyê hat damezirandin. Ew bi xwe weke şaxekî derveyîn ê rêxistina “Sipah Mihemed an ku Artêşa Mihemed” a şîî pakistanî, ku li ser destê “Mirîd Ebas Yezdanî” di navbera salên 1993-1994’an de hat damezirandin; ku ew jî bi dest xwe re alîyê çekdarî yê koma bi navê “Tevgera Ceferî li Pakistanê” ya ku sala 1979’an hevdemî hilweşîna rêjîma Şahê Îranê hat damezirandin û bêtir karê xwe li bajarê Fêsel Abad di nava Pakistanê de dimeşand. Êdî wê jî xwe li îdolojîya Wîlayetûlfeqîhgirt û hewl da ku li herêmên gengaz e bikevin jêr serwerîya wê, pêk bîne.

Navenda wan a sereke devera Lahûr a li herêma Bencabê ye, lê qada çalakîyên wan di pileya yekem de li Sûrîyê ye; ew jî bi bihaneya parastina meqamê Seyida Zeyneb ê li Şamê, vê yekê pêk tînin, lê li dijî alîyên rikberîya Sûrî yên cihêreng, pişta rêjîma Sûrîyê girt. Her wiha çalakîyên wan li Iraqê jî hene. Jixwe bawerîya wan a şer ji ya rêxistina “Artêşa Mihemed” a ku bêtir şerê rêxistinên tundrew ên sunnî yên cîhadîst dike, mîna Esker Cehnkewî, Leşker Tîba û Ceyş El-Sehaba yên ku Şîayê gawir dibînin û dijminatîya bi wan re helal dikin, tundrewtir e. Li gor amaran di navbera salên 1990 û 2001’ê de li Pakistanê ji ber tundîya di navbera herdu alîyan de, nêzî 395 bûyerên tîreyî rûdane; ev jî li gor raporên nûçeyî tê tekezkirin[17]. Her wiha xwe dispêre tektîkên tundî û kuştina siyasî, pêkanîna operasyonên tolhildanê û avakirina pergaleke saloxgêrî di nava rêxistinê de da ku siyaseta xwe ya parastinê xurt bike. Li kêleka wê bawerîya wan bi stratejîya ewlekarîya komî ya şîî ya bi serkêşîya Wîlayetûlfeqîhtê.

Diyar e ku Liwa Zeynebûn hewl dide zanebûna xwe ya şer û bikaranîna çekên tektîkî, bi rêya beşdarbûna di şerên ku di navbera rêjîma Sûrî û rikberîyê de rûdidin de, hêza xwe xurt bikin. Dibe ku ev yek bi armanca zêdekirina şiyana tevgera tundrew a şîî li Pakistanê û xurtkirina desthilatdarîya giyanî ya Îranê li wan be.

---

[17] Umer El-Farûq, Pakistan, Metirsîya li ser nîgeranîya sunnî-şîî, Weşan: Malpera Rojhilata Navîn, Dîroka weşanê: 3/10/2008 – Hejmar 10902, bi rêya vê linkê dikarin bixwînin: https://archive.aawsat.com/details.asp?issueno=10626&article=489224#.YdFxLGjP3IV

## 2. Rêxistina Liwa Fatimîyûn (Afganî):

Navê rêxistinî Liwa Fatimîyûn e. sala 2014'an bi handana ji alîyê Heresûsewrî ya Îranîve, li ser destê Elî Riza yê ku tê texmînkirin ku di şerekî li dij Cenhet El-Nusra li Sûrîyê de hatiye kuştin, hat damezirandin. Ta niha tu navendeke wan a sereke tune ye û piranîya fermandarên wê li qadên şer weke Yemen, Sûrî û Iraqê ne. Ji alîyê kêmînîya Hezara ya şîî li Afganistanê ve gelekî tê hezkirin. Ev kêmînî bi zaraveykî zimanê Aryenî yê nêzî Farisî diaxivin, lê rûdêmên wan amaje dikin ku têkilîya wan bi Teter û Moxolan re heye.

Der barê bawerîya wan a şer de, ev rêxistin wekee berdewamîya tervgera cîhadîtst a şîî li Afganistanê tê dîtin; ku ji ber sedemên olî-tîreyî şerê Soviyetê, piştre Tevgera Taliban û piştî wê jî DAIŞ ku der heqê şîîyên Afganî de gelek binpêkirin pêk anîn, kir. Bi serkeftina Xumeynî ya bo bidestxistina desthilatê sala 1979'an re, vê rêxistinê xwe li îdolojîya Wîlayetûlfeqîhgirt.

Ji ber tektîkên wê yên leşkerî yên ku di encama beşdarbûna şerê Sûrîyê û Yemenê yê piştî sala 2011'ê de, li kêleka wê jî destekdayîna leşkerî, lojistîkî û saloxgêrî ya ku ji alîyê Heresûsewrî ve bi dest dixe, hiştiye ku mîna berztirîn rêxistinên şîî yên tundrew li Asyaya Navîn were dîtin. Dibe ku di siberojê de hin navin din werbigire, mîna Hizbullaha Afganî yan ji bilî wê.

Li kêleka wê jî erka parastina Şîayê li Afganistanê û beşdarkirina wan di rêvebirina welêt de, li xwe girtiye. Tê texmînkirin ku ew jî dê tev li tora rêxistinên şîî yên tundrew ên cîhanê ku desthilata Îranê wan destek dike, bibe.

## 3. Hûsî:

Navê rêxistinî Tevgera Ensarullah e, lê navlêkirina wê li ser navê damezirênerê wê hatiye kirin. Sala 1994'an ji alîyê Bedredîn El-Hûsî ve, yê ku di şerekî li Yemenê sala 2004'an de hatiye kuştin, hat damezirandin. Navenda wan a sereke çiyayê Seida yê li bakurê Yemenê ye.

Di dîroka Yemenê de, ji alîyê siyasî, çandî û aborî ve rola şîîyên zîdî hebû, lê belê piştî ku hukimê zordest ê Yemenê bi serwerîya Elî Ebullah Salih û xurtbûna desthilatên rêxistinên sunnî yên tundrew, tirsa civaka şîîyên zîdî çêbû û pêdivî pê çêbû ku pergaleke xwe ya xweparastinê ava bikin û piştre jî bawerîyeke şer a li gor metirsîyên ku rastî wan tên, saz bikin. Vê yekê hişt ku koma Bedredîn El-Hûsî yên ku bi îdolojîya Wîlayetûlfeqîhbandor bûbûn, tevgera xwe ya siyasî ava

bikin û bi armanca keysbazkirina tundrewîya şîî bo sepandina desthilata xwe, di warê siyasî de ji tîreya Zîdî veqetiyan. Bi rastî jî sala 2009’an li bermaberî rêjîma Yemenê û erebistana Siûdî ya ku wê wekee gefekê bo ewlekarîya xwe ya neteweyî dibîne, gelek şer pêk anîn. Vê rêxistinê dikarî raperîna gel a li Yemenê bi keysbaz bike û mîna Ixwan El-Mislimîn gava tev li raperîna gel a li Misirê bûn, bi hemû hêza xwe tev lê bû. Li gor vê jî û piştî hilweşîna rêjîma Yemenê û kuştina Elî Ebdullah Salih, sala 2015’an li Yemenê bû hêzeke siyasî û leşkerî ya desthiltdar. Îdolojîya vê rêxistinê û destekdayîna tam a Îranê jê re, hişt ku Erebistana Siûdî li gefên li ser ewlekarîya xwe ya Neteweyî hay bibe û li gor wê hevbendî bi hin dewletên erebî re çêkir û şerekî berfireh li ser hêzên Hûsîyan dest pê kir, ku ew şer ta niha jî berdewam e. Jixwe qurbanîyên vî şerê gelê Yemenê bi xwe ye. Gava ku em bala xwe didin bawerîya siyasî û leşkerî ya vê rêxistinê, em dibînin ku ew hêmaneke sereke ya şerê piralî yê Îranê ku li dijî hin rêjimên erebî û rêxistinên sunnî yên tundrew dide meşandin e. Dibe ku bi rola pencê Îran ê yê ji bo sepandina tîreya Diwazdeh Îmamî li ser Zîdîyê ve jî rabe.

Piştî ku rêxistinê nîvê Yemenê xist bin serwerîya xwe û dest danî li ser depoyên çekan û moşekên balistî û balafirên bêmirov ên artêşa Yemenê bi dest xistin, her wiha dikare tevgera rêyên deryayî ya di tengava Bab Mendib de kontrol bike, êdî tê texmînkirin ku beşdarî şerekî siberojê yê di navbera Israîl û Hizbullah ê bi desteka Îranê de bibe. Fermandarên rêxistinê jî di gelek daxuyanîyên xwe yên der barê Filestînê de amajeyê bi vê yekê dikin[18]. Dibe ku nebeşdarbûbna navdewletî di çareserkirina şerê Yemenê yê di navbera Hevbendîya Erebî û Hûsîyan de, di çarçoveya siyaseta parastina ewlekarîya dewleta Israîlê de be.

Hin hewldanên avakirina rêxistinên şîî yên tundrew li Erebistana Siûdî, Behreyin, Kuwêt û Nîceryayê hatin kirin; mîna Hizbullaha Hicazê, Hizbullaha Kuwêtê, Enîya Islamî Ya Rizgarkirina Behreynê û Tevgera Islamî li Nîceryayê, lê belê ji ber ku ewlekarîya neteweyî ya van welatan dixist ber gefan û bi sedema ku alîgira îdolojîya Wîlayetûlfeqîhye diket nava stratejîya çalakkirina desthilata Îranê li herêmê, êdî ev hewldan rastî çewisandineke tund hatin. Bizava wê ya çekdarî û çalakîyên wê yên çewisandinê, ji bilî şerê kînên tîreyî, tu wateyeke din

[18] Ji bo ku hûn van danuyanîyan bibînin li vê vegerin: Ajansa Nûçeyan A Qudisê; tevgera Ensarullah amaje pê dike ku piştî daxuyanîyên Sehyûnîyê dê Til Ebîbê bike armanc; Dîwoka Weşanê: 5/12/1442 koçî 15/7/2021 Z; Link: http://qodsna.com/ar/350115

nagire. Vê yekê li van welatan bandoreke neyînî li ser pergala xweparastinê ya civaka Şîî û nasnameya niştimanî bi hev re kir. Lê bi tevî vê yekê jî şaneyên wê yên razayî li ser van welatan gefeke ji dil têne dîtin. Mîna; bêyî hevrêzîya bi van şaneyan re dê Hûsîyan nikarîba hin navendên jiyanî yên Erebistana Siûdî bike armanceke sereke, mîna balafirgehên Ebha û Riyadê yên navdewletî, balafirgeha Cazanê û kompanîya Aramco (Aramko) ya petrolê. Der barê êrîşên bi moşekên balistî de em dikarin wan yekser bi Hûsîyan ve girê bidin, lê der barê balafirên bêmirov de em nikarin bibêjin ku di piranîya wan de destê Hûsîyan heye.

Ji alîyekî din ve ji bo bihêzkirina rêxistina Huseynîyûn (Tevgera Berxwedana Islamî li Komara Azerbeycanê) ku ji alîyê Tewhîd Ibrahîm Bîglî (rikberê rêjîma Ilham Elîyêv) ve tê birêvebirin, gelek kar tê kirin; ew jî bi rêya perwerdekirina wan di nava şerên ku xaka Sûrîyê rûdidin de. Diyar e ku stratejîyeke Îranê ya ji bo avakirina sûrek ji rêxistinên hêzdar li ser sînorên xwe heye. Li gor wê jî li Afganistanê Liwa Fatimîyûn, li Pakistanê rêxistina Liwa Zeynebûn, li Iraqê rêxistina Bedir, Ketayib Huzbullaha Iraqê û ji bilî wan û li Azerbeycanê jî rêxistina Huseynîyûn heye ku bizava Israîlê ya pêşketî li vî welatî li cem fermandarîya Îranîmetirsîyan çêdike, her wiha li kêleka wê jî pêdivîya ku îdolojîyek hebe da ku Azerbeycana ku piranîya wê şîî ne, bixe bin kontrola xwe. Îran gelekî hewl dide ku dijminên xwe yên klasîk bi rêxistinên mîna Tevgera Hûsî û Hizbullaha Libnanî dorpêç bike. Li Sûrîyê jî kêmbûna tundîya şer û zêdebûna karê diplomatîk, dibe ku berê fermandarên rêxistinên şîî yên sûrî bide avakirina rêxistineke mîna Hizbullaha Sûrî yan jî bi navekî din be; da ku tev li nava artêşê Sûrîyê bibin. Jixwe ji bo vê yekê Firqeya Çarem a herî li pêş e ku dikare vê rêxistinê di nava xwe de bihewîne. Li kêleka vê yekê jî texmîna avabûna rûyekî siyasî jî jê re heye, ku mîna partî ya jî komeke siyasî be; da ku li kelêka şîîkirina li herêmên sunnî beşdarî hilbijartinên siberojê bibin. Di dema me ya niha de ya ku navê "Berxwedana Gelêrî ji bo rizgarkirina herêma rojhilatî" lê tê kirin, bingehek e da ku ev statuya leşkerî bi bihaneya şerê li dijî hevbendîya navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê ku wê wekee hêzên dagirker dibîne, xwe bispêrê. Her wiha hewl dide di nava civaka sûrî de hişmendîyeke komî ava bike ku li welêt ew berxwedana niştimanî ya sereke ye, êdî li gor vê yekê li ser benê hestên neteweyî yên erebî û handana şoreşgerî ya îdolojîya Wîlayetûlfeqîhdilîze. Tê texminkirin ku ev rêxistin û li kêleka wê jî rêxistina bi navê "Difaa El-Wetenî" bibin rûyê sûrî yê rêxistineke nepenî ya ku xwe li

îdolojîya Wîlayetûlfeqîhdigire û xwe berdide nava rehên civaka xwecihî ya herêmê.

Bi dehan rêxistinên din hene ku agahîyên tekûz li ser wan tune ne û navên wan xwedî rehendên îdolojîk in; mîna Ketayib El-Aşter, El-Muqdad, Ehil El-Kehif, Fatih Xeyber, Îmam Elî û ji bilî wan. Lê belê bizav û çalakîya wan sîrordar e û dibe ku armanc jê jî ji bo beşdarbûna di nava şerê piralî de û parastina rêxistinên din ji çalakîyên tolhildanê ji alîyê hevbendîya navdewletî ya li dij terorê be, yan jî veşartina wan di dema ku ji alîyê desthilatên welatên ku tê de ne werin xwestin de. Li kêleka vê yekê jî bikaranîna wan di propaganayê de; da ku bêtir xelkê bi alîyê xwe ve bikişînin û di nava civaka şîî de bawerîya şer xurtir bikin û wan ji bo tevlêbûna di nava rêxistinên tundrew de han bide, her wiha destekdayîna madî û giyanî jî pêşkêş bikin.

- **Di Neyeksanbûna Şoreş Û Demagojîyê De Tundrewîya Şîî:**

Bawerîya siyasî ya Şîayê li beramberî îdolojîyên din asêtir e û bêtir xwegirtî ye. Heyanî ku hevdemî binkeftina rêjîm û rêxistinên sunnî û yên zanistdarî di pêkanîna daxwazîyên gelê xwe û pêkanîna ewlekarîya mirovî û niştimanî li welatê de, ew banga xwe ya gelêrî diparêzin, dê wiha asê û bihêz bimînin. Tişta ku bêtir hêzê dide wê da ku bikare metisrîyên li ser îdolojîya xwe û bangeşeya reşkirinê ya li welatên erebî li ser xwe rake û bêwate bihêle ew e; ku banga piştgirîya doza Filestînê û gotûbêja islamî-islamî dike.

Tiştên ku dê bihêlin rêxistinên şîî yên tundrew xurt û belav bibin ev in: Pirbûna zayînê di nava civaka şîî de, bandora porpagandaya şoreşgerî-olî ya li ser kesên bêguneh û bêhêz, handanên aborî yên ji bo şîîkirina sunnîyan ku di hevdemî rewşa aborî û siyasî û nebûna ewlehîyê ku bûye taybetîyeke welatên Rojhilata Navîn[19], zêdebûna kînên tîreyî ya ji alîyê kesên ji fitneya di navbera siyasetmedarên desthilatdar û oldar sûdê digirin[20], her wiha şerê derûnî yê ku

[19] ji bo bêtir analîzê der barê siberoja têkilîyên tîreyî li Rojhilata Navîn binasin, li vê vegerin: Hefry Martînî û ji bilî wî; siberoja têkilîyên tîreyî li Rojhilata Navîn; weşan: Navenda RAND – 2017; link:
https://www.rand.org/content/dam/rand/pubs/perspectives/PE200/PE242/RAND_PE242z1.arabic.pdf

[20] Hîzer Im Robinson û ji bilî wî; Olperestî li Rojhilata Navîn \ bandorîyên li ser Amerîkayê; Weşan: Sazîya RAND \ 2018 – Kalefornîya; R15. Link:
https://www.rand.org/content/dam/rand/pubs/research_reports/RR1600/RR1681/RAND_RR1681z1.arabic.pdf

di çarçoveya stratejîya “Parçe bike, kontrol bike” yan jî “Alozîya afirîner” de pêk tê[21]. Lê belê kesên ku sûdê ji fitneya tîreyî werdigirin û xelkê li dora tundrewîya tîreyî bi armanca pêkanîna desthilata xwe kom dikin, rastî wan kesên ku xelkê li dora nasnameya niştimanî kom dikin, tên. Mîna nasnameya tîreyî ya sunnî, nasnameya niştimanî li bakur û rojhilatê Sûrîyê û başûr û naverasta Iraqê, nasnameya osmanî li herêmên bakurê Sûrîyê û Iraqê yên dagirkirî û nasnameya neteweyî ya erebî. Êdî kesek nikare bi awayekî tekûz desthilata xwe li ser herêmê bisepîne û ji ber vê yekê jî şer û pevçûneke xurt heye. Ev yek careke din berê me dide ramana stratejîya “Alozîya afirîner”. Jixwe gava em li kontrola vê stratejîyê di siyaseta navdewletî ya li Rojhilata Navîn dide meşandin bidin ber çavên xwe, em dibînin ku ji dema Xumeynî ku piştî hilweşîna rêjîma Şah a ku di bin çavdêrîyeke tekûz a NATO’yê de bû, hatiye Tehranê, tevgera rundrew a şîî xurt bûye. Ji xwe piştî wê jî şerê Kendavê yê yekem (Şerê iraqî-Îran î) ku bi salan dirêj kir û civaka navdewletî carinan li wan dinerî û carinan jî destek dida alîyekî ji wan, piştî wê jî dorpêça li ser Iraqê di salên heftêyî de ku rêjîma wê der heqê kurd û şîayê de komkujî pêk anîn, piştî wê jî hilweşîna rêjîma Iraqê sala 2003’an û kêmkirina hêza xweparastinê ya civakên sunnî yên erebî ku di çarçoveya şerê di navbera rêxistina El-Qaidê û hêzên Hevbendîya Navdewletî ya ku êrîşî Iraqê kir, êdî piştî wê pêvajoya 2011’an hat ku hêza rêxistinî ya komên şîî li Rojhilata Navîn xurt bû heyanî asta ku li gelek welatan bû hêza desthilatdar, mîna Sûrî, Yemen, Libnan û Iraqê û ev yek bi dest xwe re bû gefek li dijî ewlekarîya siyasî ya welatin din mîna Behreyn, Erebistana Siûdî û Pakistanê. Ev yek texmînan pirtir dike ku dê teşeyeke nû ya desthilatê bi serwerîya tevgera tundrew a şîî were avakirin ku dê bi armanca sepandina desthilata xwe peyrewên din ên bawerîyên giyanî û siyasî yên ji îdolojîya vê tevgerê cûda ne, bixe bin kontrola xwe. Di encamê de dê qirkirina azadîyan û binpêkirina mafan berdewam bike;

[21] Li gor zanistnameya siyasî (elektronîk), der barê dîtaneya Alozîya Afirîner de wiha tê gotin: “Dîtane dibêje ku dema civak digihêje asteke herî bilind a xwînrijandinê ya ji ber tundî û rijandina xwîne û belavkirina tirseke mezin di nava cemaweran de, êdî dikarin bi nasnameyeke din bidin avakirin ku berjewendîyên her kesî bi cih tîne. Alozîya Afirîner jî valatîyek e ku ji ber aramî û hevgirtina civakê derketiye pêş; ew jî encama xwesteka guhartinê ya ku ji ber hêvîyên hinek bikeran ên ji bo pêkanîna bizavekê li ser gelek astan, nemaze siyasî û aborî derketiye pêş. Ev yek bi piranî ji alîyê derve ve têne perekirin. Her çi qasî pêkarên guhartinê yên hundirîn bin jî, lê belê wiha tê keysbazkirin ku bikeve xizmeta alîyekî rojavayî yê ku dixwaze berjewendîyên xwe biparêze…” Zanistnameya siyasî (Elektronîk); Dîtaneya Alozîya Afirîner Creative Chaos Theory; link:
https://political-encyclopedia.org/dictionary/

ku dê bi xwe re bihêle civakên herêmê li ser rêgeza xweparastinê xwe li ramanên şoreşgerî bigirin, çi yên bi îdolojîya olî-sunnî yan jî neteweperestîya erebî yan jî tevgera zanistdarî-demokrasî bin. Ev yek amaje dike ku dê ritma vê alozî yan jî nearamîyê, ji alîyê dewletên mezin ên ku hewl didin berjewendîyên xwe heyanî sed salî misoger bikin ve, rêxistinkirî be. Tişta ku vê yekê tekez dike jî ew e; ku di heman dema hebûna xurt a siyasî, leşkerî û saloxgêrî ya dewletên mezin di herêmê de, bûyer û alozîyên ku aniha welatên Rojhilata Navîn tê re derbas dibin hene û civakên xwecihî nikarin ewlekarîya xwe ya mirovî û niştimanî bi dest bixin. Ev yek berê dide dîtaneya ku tundrewî bi sedema mercên objektîv û subjektîv û siyasetên komploger ên navdewletî, dê geştir û xutir bibe.

***Komikên Ehlûlheq***

***Tabûrên Hizbûlahê Iraqî***

***Hizbûlahê Libnanî***

***Pasvanê Şoreşê yê Îranî***

***Tevgera Hûsîyan***

***Tevgera Huseyniyon***

***Rêxistina Bedir***

***Tevgera Nûceba***

***Hizibûlahê Hicazî***

***Berxwedana Gelerî ya Rizgarkirina Herêma Rojhilatyî***


***Togaya Fatimiyon***

***Komleşkera Zeynebiyon***

***Dirûşma Tevgera Emel***

***Dirûşma Artêşa Mehdî û Togaya Aşîtîyê***

Xuya ye ku ji dirûşmeyên rêxistinên ku îdîolocîya Wîlayetûlfeqîh dipejirînin, cûda ne:




***.([22])Nexşeya bi awayeke rêjeyî belavkirina olî û tîreyî li Rojhilata Navîn diyar dike.***

[22] George Friedman; These 7 maps explain the Middle East; Mauldin Economics Feb 24, 2016; Link:
https://www.businessinsider.com/these-7-maps-explain-the-middle-east-2016-2